bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 40
29 COTMEH - 05 MIJDAR 2017
www.basnews.com

ABORÎ



Tizbî di destê hoste de qîmeta xwe dibîne

HIN kar û pîşe hene ku bi rastî jî taybet in û hosteyên van karan jî hindik in. Yek ji van karan çêkirina tizbiyan e. Tizbî wek tê zanîn di çanda Anatoliya, Mezopotamya û Rojhilata Navîn de heye an wek aksesuar an bo îbadetê tê bikaranîn. Hosteyên tizbiyan ji me re li ser çêkirina tizbiyan axivîn. **RÛPEL 09**

KIRMANCKÎ



Bawer bikerê do hol bo

ŞARÊ ma zey her timî nê rojan de zî reyna halên do çetin ra ravêrenê. Xiyanet, bêbextey, zurî... Halê ma Kurda hewt pay çekerdo "Kayên Texta". Taybetî, çimê heme kurdan tadîyayo Kurdistana Verarojî rê. Reyna û fina kurd waşto ke xoser bibo û reyna zî dagirker çar hetî ra hêrîş û hucûmê ma keno. **RÛPEL 10**

PIRTÛK



Keda 30 Salan bû Pirtûk

JI ber rewşa ku Kurd û Kurdî tê de ye hin Kurdên dilsoz û xîretkêş bi salan hewl dane û li pey şopa kelepora xwe ketine. Yek ji van Murat Akkuş e ku li qadê 30 sal e 6 hezar 650 biwêj û pêşgotinên Kurdî berhev kirine. Akkuş di derbarê xebata xwe ya 30 salan a li ser kelepora Kurdî axivî. **RÛPEL 13**



BÊDENGIYA HÊZÊN NAVDEWLETÎ BIDAWÎ BÛ R2

JI CÎHANÊ PIŞTGIRÎ BO KURDAN

> "DIVÊ ÊRIŞÊN LI SER HERÊMA KURDISTAN WERIN RAWESTANDIN"

Ev heyameke Herêma Kurdistanê ketiye bin zext û fişareke mezin a hêzên herêmî. Ev zext û fişarên li ser Kurdistanê piştî encamdana referandûmê derbasî qonaxeke din bûn û van hêzên ku gef li Kurdistanê dixwarin bi destê rêxistineke paramîlîter midaxeleyî xaka Kurdistanê kirin û di serî de Kerkûk ku weke dilê Kurdistanê tê zanîn, ew deverên din ên 'nakok' dagirkirin. Cîhana ku di dema şerê DAIŞê de tim piştgiriya xwe ji Kurdan re nîşan didan, di destêpêka êrişan de bêdeng ma û ev gelek hat rexnekirin.

> BI DÎTIN Û FÊMKIRINA RASTIYÊ DENGÊ CÎHANÊ BILIND DIBE

Piştî ku êrişên li ser Kurdistanê zêde bûn û cîhana ku di destpêkê de bêdeng bû bi dîtîna rastiyê dengê xwe derxist û bertek nîşan da. Roj li pey rojê dengê hêzên navdewletî li hemberî êrişên li ser Kurdistanê bilind dibe û gelek berpirs, kesayet û nunerên dewletan li hemberî dagirkirin û êrişên li ser Kurdistanê bertekên xwe tînin ziman û banga alîkariyê ji bo Kurdan dikin. Jibilî wê hin welatan alîkariyên xwe yên leşkerî bo Îraqê rawestandin û êrişên li ser Kurdistanê niha di rojeva cîhanê de ne.

Akademîsyen Deniz Çifçi:

Kî dikare mîna Barzanî Kurdistanê birêve bibe?



RO3

Ji Zaningeha Andrews ya Skoçyayê Dr. Deniz Çifçi, li ser mijarên dagirkirina Kerkûkê û geşedanên li Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivî. Çifçi dibêje, divê Kurd yekrêziya xwe pêk bînin û di warên leşkerî û siyasî de tifaqeke xurt ava bikin. Herwiha dibêje divê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dest ji peywîra xwe bernede û wiha pê de diçe: "Birêz Barzanî ji bo Herêma Kurdistanê di dîplomasiya navdewletî de xwedî roleke girîng e û kesayetekî biîtîbar e. Eger dest ji peywîra xwe berde wê di moralê tevahiya Kurdan de şikestinek çêbibe" û dipirse; "Kî dikare weke Barzanî Herêma Kurdistanê birêve dibe?"



EKREM ÖNEN >02

Anglo-Saxons: Geoekonomî-ka-Polîtîka û Kurdistan



HOŞENG OSÊ >03

Serok û Facebook



FIRAT CEWERÎ >07

Demokrasî

ROJEV R04



Rewşenbîrên Kurd: Barzanî ji bo Kurdan sembolekî netewî û manewî ye!

Rewşenbîr, siyasetmedar û rojnamegerên Bakur bi rêya Heftenameya Basê palpiştî û piştgiriya xwe ji Serok Mesûd Barzanî re nîşan didin û dibêjin ku Mesûd Barzanî ji bo Kurdan sembolekî netewî û manewî ye û radigihînin ku ew palpiştiya rêbaz û têkoşîne Serok Barzanî ya ji bo serxwebûna Kurdistanê dikin.

CÎHAN R06



"Çarenivîsa Başûr û Rojava bi hev ve girêdayî ye!"

Rewş, rûdan û nakokiyên di navbera aliyên siyasî li Herêma Kurdistanê bi awayekî yekser karîgeriyê li ser Rojavayê Kurdistanê jî dike û lewma çav û guhên partiyên Kurd ên Rojavayê Kurdistanê li Herêma Kurdistanê ye. Partiyên Kurdî yên li Rojavayê Kurdistanê jî li ser geşedanên dawîn û êrişên li ser Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivîn.

ROJHILAT R12



Kûrmê darê ne ji darê be dar hişk nabe

Tiştê ku di 16ê cotmehê de qewimî, îxaneteke siyasî bû, tiştên wisa tenê li Kuristanê çênebûne, di gelek welatên dinyayê de bûyerên wisa çêbûne. Îxaneta li Kurdistanê, îxaneta li hemberî daxwaza serxwebûn û dewletbûna miletê Kurdistanê ye. Bêguman sebeb û aktorên wê yên hundir û derveyî hene, divê em vê rewşê rast bixwenin û dersên pêdivî ji wê derxînin.



EKREM ÖNEN

Anglo-Saxons: Geoekonomî-ka-Polîtîka û Kurdistan

Di hefta borî de bûyerên gelekî mezin li başûrê Kurdistanê rûdan. Artêşa Iraqê û Heşdî Şabî bi piştgiriya Îran û Tirkiyê û bi hevkariya Anglo-Saxons êrîş anîn ser Kurdistanê û çend navçeyê Kurdistanê dagirkirin. Weke Kerkûk, Şingal, Xaniqîn... Ev kiryar ji alî Iraq, Îran û Tirkiye ne tiştekî xerîbe. Tişta xerîb a vê bûyerê ji alî Anglo-Saxons gelek xerîbe. Yek jê ku di van 20 salên dawî de Anglo-Saxons xwedêgiravî hevpeymanê kurdan bûn li dijî ISê, a diduyan Anglo-Saxons weke stratejîk bi taybetî Îran dijberê xwe didît her weha li gel Tirkiyê di van 10 salên dawî de di gelek têkiliyên xerab debûn. Ev çi weha bû sebeb ji nişka ve bi ”Dijminên xwe re hevkarî kirin li dijî dostên xwe yên kurd” helwest girtin? Pir aşkereye ev bloka li dijî kurdan ku ji Iraq, Îran, Tirkiye û Anglo-Saxons pêk hatiye ne hevkariyek saxleme her yek ji van aliyan tirba hev dikolin. Her çiqas her yek ji vana hesabên wan cudabin jî lê li ser diberiya kurdan li hev kirin. Hesabê Îran, Iraq û Tirkiyê diyare, hesabê wan ew bû ku rê li ber dewleta kurd bigrin. Lê hesabê Anglo-Saxons cuda bû û çend alî bû. Di vê bloka Anglo-Saxons ku îngilîz û DYA ne her yek ji vana jî hesabên wan cuda bû. Hesabê DYA geopolîtîk bû, hesabê Brîtanya bêhtir geoekonomîk bû, armanca DYA ya sereke li herêma rojhilata nêzîk û navîn ew e ku nehêle nifûsa Rûsya li herêmê xurt bibe û li herêmê herdem tevlihevî hebe (şer û pevçûn) hesabê Brîtanya bêhtir bighêjin bîrên neft û gazê yên herêma rojhilata nêzîk û navîn. Ku weke tradttsionel vî heqî ji xwe re dibîne bi taybet petrola Kerkûkê. Ev siyaseta Brîtanya ji serdema Împaratoriya Osmanî her weha di şerê cîhanê yî duyemîn de xwedîtî li petrola Iraqê bi tevayî bi taybet li a Kerkûkê dikir. Piştî înqilaba Ebdulkerîm Qasim, di salên 1960î de êdî îngilîz ji Iraqê qewirandin. Piştî salên 1990î ku têkçûna Sovyetê jî firset dîtin û ruxandina Seddam Husên, Anglo-Saxons bi hev re careke din Iraq xistin destê xwe. Îngilîzan leşkerê xwe li nav ereban bi cih kirin. Diyare îngilîzan dizanîbûn ku kurd ji wan hez nakin û nerazîne, ji ber perçekirina Kurdistanê li ser destê wan çêbûbû. Demeke dirêj şirketên îngilîza yên wek BP heta van salên dawî wan petrola Kerkûk û Mûsilê bikardianîn. Bi taybet piştî sala 2014an petrola Kerkûkê ket kontrola kurdan û kurdan bi gelek welatên din re peymanên petrolê çêkirin û em dikarin bêjin mîktarek kêm ji petrola Kerkûkê di destê şirketên îngilîzî de ma şirketên welatê weke Almanya, Fransa her weha Rûsya dest bi derxistina petrola Kerkûkê kirin. Di van demên dawî de peymanên herêma Kurdistanê di warê petrolê de bi Rûsya re bi taybet petrola Kerkûkê, Anglo-Saxons gelek aciz kir bi taybet Brîtanya, DYA jî ji metirsiya firehbûna nifûsa Rûsya aciz bûn. Her weha Anglo-Saxons piştî niha ku IS xelas dibe xwestin roleke weke a ISê bidin kurdên başûr ku tevliheviyê li herêmê çêkin, serkirdayetiya başûr ev yek qebul ne dikir. Diyare bi kurdan dan fam kirin ku peymanên wan bi Rûsya re ne bi dilê wan e bes diyare kurdan guh neda wan û berjewendiyên kurdan yên milî parastin û rast kirin. Ji ber piştî tevliheviyên van du salên dawî hemû şirketê Anglo-Saxons ji Kurdistanê derketin kurd bi tenê hiştin ji ber wê kurd ji xwe re li rêyên din geriyan petrola xwe bifroşin li vir Rûsya aktîv xwest vî karî bike. Dema Rûsya cidî dest pê kir Anglo-Saxons tirsiyan ku Rûsya him aborî dixwaze Kurdistana Başûr bigre him jî dixwaze nifusa xwe li Iraqê xurt bike. Ji ber wê ketin nav tevgerek pir ecele ku rê li ber vê prosesê bigre. Ji ber vê bi dizî bi Iraq, Îran, Tirkiye û hinek terefê kurd re li hev kirin ev plana dawî li dijî kurdan çê kirin. Lê di rastiya xwe de ev plan beriya herkesî li dijî Rûsya bû her weha YA, Îsraîl, Misir, Siûdiya Erebî û hinek welatên xelîçê bû. Ne bela sebeb beriya van bûyeran bi demek kin DYA digot peymanên Rûsya bi herêma Kurdistanê re kirine ewlekariya netewî a Rûsya eleqedar dike, dixwest bêje ji bo Rûsya gelek girîng e. Her weha beriya çend rojan wezîrê derve yê Iraqê Ceferî serdana Moskow kir û li Moskow bi Lavrov re hevdîtin pêk anî. Piştî hevdîtinê di preskonferensê de Lavrov li ber Ceferî got; ”Rûsya pêbende bi peymanê herema Kurdistanê re her weha em difikirin karên xwe li herêma Kurdistanê berfirehtir bikin”. Ew sinyalek bû ji Anglo-Saxons û Iraqê re. Rûsya dev ji peymana li ser petrola Kerkûkê bi herêma Kurdistan re kirine bernadin. Niha şerê Rusya û Anglo-Saxons li ser Iraqê salên 1960î tîne bîra mirov. Dema Rûsya bi înqilaba Qasim re di rêya kurdan re Iraq xiste destê xwe paşê 1970î de bû nabêncî di navbera kurdan û Iraqê de kurdan fermî otonomî bi dest xistin. Niha her weha Îsraîl û YA jî nerazîbûna xwe li hember Anglo-Saxons dide diyar kirin. Ev proses tev dide rêdan ku kurd nêzîk ji vê krîzê rizgar dibin. Hêjayî gotinêye nîzama du a cîhanê di sala 1945an de bi tifaqa Yalta di navbera Sovyet-Rûsya û Anglo-Saxons de çêbû û bû sebebê têkçûna Komara Mahabadê.

Dengê cîhanê li hemberî êrişên li ser Kurdan bilind dibe!

MURAT ÖZDEMIR



Herêma Kurdistanê ku di herêmeke mîna Rojhilata Navîn de weke cihekî aram û pêkvejiyaneke xurt lê heye û bûye sîwan ji kesên ku ji şer direvin re, derdikeve pêş. Herwiha ne tenê di warê aramî û hizûrê de, di warê siyaset û dîplomasiyê de jî Herêma Kurdistanê xwe îspat kir û nîşan da. Lêbelê ev heyamek e ev dever ketiye bin zext û fişareke mezin a hêzên herêmî. Ev zext û fişarên li ser Kurdistanê piştî encamdana referandûmê derbasî qonaxeke din bûn û van hêzên ku gef li Kurdistanê dixwarin bi destê rêxistineke paramîlîter midaxeleyî xaka Kurdistanê kirin û di serî de Kerkûk ku weke dilê Kurdistanê tê zanîn, ew deverên din ên ‘nakok’ dagirkirin.

Bi destpêkirina vê dagirkirin û êrişên li ser Kurdistanê ku serkêşiya wê Îran dike, helwesta hêzên navdewletî dihat meraqkirin. Lêbelê ew cîhana ku di dema şerê DAIŞê de tim piştgiriya xwe ji Kurdan re nîşan didan, di destêpêka êrişan de bêdeng ma û ev gelek hat rexnekirin. Ji ber ku gelê Kurd û Kurdistanê ji bo parastina rumeta mirovahiyê têkoşîn û şerekî gelekî mezin bi rêxistineke weke DAIŞê re kir û ew rêxistin têkşikand. Ji ber wê yekê dihat gotin ku deynekî wefayê yê cîhanê heye li hemberî Kurdan.

Piştî ku êrişên li ser Kurdistanê zêde bûn û ew cîhana ku di destpêkê de bêdeng bû bi dîtîna rastiyê dengê xwe derxist û bertek nîşan da. Roj li pey rojê dengê hêzên navdewletî li hemberî êrişên li ser Kurdistanê bilind dibe û gelek berpirs, kesayet û nunerên dewletan li hemberî dagirkirin û êrişên li ser Kurdistanê bertekên xwe tînin ziman û banga alîkariyê ji bo Kurdan dikin. Jibilî wê hin welatan alîkariyên xwe yên leşkerî bo Îraqê rawestandin û êrişên li ser Kurdistanê niha di rojeva cîhanê de ne. Gelek nûnerên welatan ragihandin ku divê êrişên li ser Kurdan û Kurdistanê werin rawestandin ku Kurd hevpeymanê wan ê stratejîk e û di şer û şikandina DAIŞê de roleke sereke lîstiye.

DYA di dewrê de ye

Wezîrê Derve yê DYAyê Rex Tillerson piştî gera xwe ya Rojhilata Navîn li Cenevrê axivî. Tillerson diyar kir ku wî bi riya telefonê hevdîtineke dirêj bi Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re kiriye û got ku wî bang li Ebadî jî kiriye ku pêşniyazên Herêma Kurdistanê yên ji bo çareserkirina krîzê qebûl bike û herdu alî rûnin ser maseya diyalogê. Tillerson herwiha ragihand ku divê Îraq îradeya xwe nîşan bide û tenê li ser lingên xwe raweste û derfeta midaxeleyê nede Îranê. Îran piştgiriya terorîzma li herêmê dike. Ew ê muayîdeyên dijwar li dijî Îranê pêk bînin.

“Divê DYA piştgiriya Kurdan bike”

Senatorê Amerîkî De Santîs jî ragihand ku divê Amerîka piştgiriyê bide Kurdan ku tekane mutefîkê me ne, di herêmê de. De Santîs herwiha diyar kir divê Amerîka li dijî Îraq û Îranê piştgiriya Kurdan bike.

Endamê Meclîsa Nûneran a DYAyê Jim Cooper jî daxuyaniyek da û êrişên li ser Kurdan şermezar kirin. Cooper herwiha got, “Kurd parastin û ewlekariyê heq dikin. Divê herkes bi DAIŞê re şer bike ne bi Kurdan re.”

Kanadayê alîkariya leşkerî bo Îraqê rawestand

Berdevkê Wezareta Bergiriyê yê Kanadayê Daniel Le Bouthillier, ragihand ku wan alîkariyên leşkerî yên ji bi Îraqê re rawestandine û diyar kir ku heta aloziya li wê herêmê venemire û zelaliyeke çênebe ew alîkariyên leşkerî nadin dest pê kirin.

Almanya; wê perwerde û alîkariya bo Pêşmerge berdewam bike

Wezîrê Derve yê Almanyayê diyar kir ku wan ji Serokwezîrê Îraqê Heyder îbadî re ragihandiye ku kêşe bi rêbazên leşkerî çareser nabin û ew vebêjêrka leşkerî qebûl nakin.” Li hêla din Almanyayê ku ragihandibû wan rahênan û alîkariya lojîstîkî ya bo Pêşmerge rawestandiye, ji vê biryara xwe vegeriya û eşkere kir ku ew ê perwerde û alîkariyên xwe yên ji bo Pêşmerge berdewam bikin.

Erebîstana Siûdî jî diyar kir ku ew destpêşxeriya Hewlêrê ya ji bo çareserkirina kêşeyan bi erênî pêşwazî dikin û bang li Bexdayê kir ku were ser maseya diyalogê.

Îsraîlê xebatên lobiyê dabûn destpê kirin

Piştî ku Kerkûk û deverên din yên Kurdistanî hatin dagirkirin, Serokwezîrê Îsraîlê Benyamin Netanyahu ji bo piştgirî û alîkariya Herêma Kurdistanê bi berpirsên gelek dewletan re hevdîtin pêkanî bûn.

Bi dagirkirin û êrişên li ser Kurdistanê Serokê Fransayê Emannuel Macron daxwaz ji herdu aliyan kiribû ku şer rawestînin û pirsgirêkan bi riya diyalogê çareser bikin. Serokê Fransayê bi riya telefonê hevdîtin li gel Serok Barzanî pêkanî bû.

“Di ketina Kerkûkê de McGurk mîmarê sereke ye”

Li hêla din Endamê Kongreya DYAyê Trent Franks di derbarê Nûnerê Taybet ê Serokê Amerîkayê yê li dijî DAIŞê Brett McGurk de ragihand ku roleke girîng di ketina Kerkûkê bo destê Heşda Şeibî de lîstiye û diyar kir ku McGurk li pêşiya pêngavên Trump yên li dijî Îranê astengan derdixîne. Brett McGurk ku bi awayekî çalak li herêmê ye di van geşedanên dawîn de rastî gelek rexneyan hatibû.

“Civaka navdewletî niha baştir tê digihije”

Çavdêrê Siyasî Bedir Şerokî li ser helwesta civaka navdewletî ya li hemberî Herêma Kurdistanê radigihîne ku komalgeha navdewletî piştî ku şerê DAIŞê bidawî bû, wan di şerê li dijî DAIŞê de û piştevaniya wan jî di vê çarçovê de bo Kurdan hebû, ne di çarçova pirsa netewî ya Kurdî de bû. Lê piştî şerê Heşda Şeibî siyaseta navdewletî rastî rawestanekê hat, nikarî şaşî û rastiyê ji hev cuda bike û wiha pê de diçe: “Berxwedana Pêşmergên Kurdistanê di van çend rojên dawîn de zelalbûna siyaseta Kurdî li hemberî Îranî, rê vekir ku civaka navdewletî pêdagiriyekê bi siyaseta xwe de bike û formatekê biavêje siyaseta xwe. Li Kurdistanê weke herêmeke jeopolîtîk niha şerê hejmuniya welatên mezin e.Niha metirsiya emperyalîzmeke mezin a Şîe-mezhebî li herêmê heye. Li aliyê din Herêma Kurdistanê bi erdnigariya xwe dikare rê li ber ew hizra emperyalî ya Şîe bigire.” Şerokî dibêje, Amerîkî û rojavayî di bin tirsa terorîzma DAIŞê de nikaribûn wê meselê baş bibînin û gotinên xwe wiha bidawî dike: “Ji ber wê yekê piştî berxwedena Pêşmerge, karîn siyaseta xwe zelal bikin û baştir di pirsên li herêmê rûdidin têbigihijin. Û niha xwe yekla dikin eger piştgiriyeke rasteqîn bo mesela Kurdan a netewî nekin jî, lê nebin hokar ku desthilata emperyalî ya şîe bi ser herêmê de bê sepandin û belav bibe.”

“Divê hêzên navdewletî bêdeng nemînin”

Rojnameger û Çavdêrê Siyasî Dilşad Mistefa Wesanî di derbarê helwest û peyamên piştgiriyê yên civaka navdewletî bo Herêma Kurdistanê dibêje: “16ê Cotmehê wan ragihandin ku rêkeftinek çêbûye di navbera Kurdan û Hêzên Îraqî de, lê di rastiyê de ew rêkeftin di navbera baskek û Ebadî de bû ku tifaqek kirin û Kerkûk radestî Heşdî Şeibî kirin. Giliya xelkê Kurdistanê li civaka navdewletî heye ku bêdeng bûn li hemberî êrişên li ser Kurdistanê. Li Kerkûkê tifaqeke qirêj hat kirin di navbera hin aliyên Kurdî û Îran û Îraqê de. Niha Amerîka û hêzên din daxwaza wê yekê dikin ku Heşda Şeibî li herêmê nemîne. Dîsa Amerîka hewl dide şer rawestîne. Divê hêzên navdewletî li hemberî êrişên li ser Kurdan bêdeng nemînin. Niha Îran bi hemû hêza xwe êrişî Kurdistanê dike. Hikûmeta Îraqê hikûmeteke kartonî ye û her tişt di bin serweriya Îranê de ye. Metirsiyeke mezin heye. ”

“Barzanî xwedîtecrûbe, rûmet, siyaset û dîplomasiyeke mezin e”

Wesanî di berdewamiya axaftina xwe de di derbarê rola Serokê Herêma Kurdistanê jî radigihîne ku pêdiviya Kurdistanê bi Serok Barzanî heye û wiha pê de diçe: “Serok Barzanî berî niha gelek caran anî ziman ku ew naxwaze bimîne, lê rewşa niha pêdivî bi Serok Barzanî heye ku li ser postê serokatiyê bimîne. Niha li herêmê rewşeke dijwar heye li hemberî Kurdan. Heşdî Şeibî û Îran bi awayekî yekser li dijî Kurdistanê di nav şerekî de ne Mesûd Barzanî niha Serok û fermandarî giştî yê Pêşmergeyan e û di vê rewşa dijwar de pêdiviyeke mezin bi Serok Barzanî heye. Ew bi xwe nexwaze jî zarûrî ye ku li ser kar bimîne. Xwedî tecrûbe, rumet, siyaset û dîplomasiyeke navdewletî ya mezin e.”

“Helwesta hêzên navdewletî roj bi roj diguhere”

Çavdêrê siyasî û fermandeyê leşkerî Berkê Berzincî jî di derbarê helwesta hêzên cîhanî û êrişên li ser Herêma Kurdistanê radigihîne ku roj bi roj helwesta zilhêzên cîhanî digûhere û axaftina xwe wiha didomîne: “Rojane helwesta komalgeha navdewletî diguhere. Hêzên navdewletî jî dizanin ku îradeya Îraqê teslîmî Îranê bûye. Amerîka jî ji rewşa herêmê agahdar e. Berxwedana Pêşmerge ya dawîn bandoreke girîng pêkanî. Tişta li Kerkûkê rû da di encama lîstikekê de bû li ser herêmê. Niha roj bi roj balansa hêzê diguhere. Amerîka her li gel berpirsên Kurdistanê di nav guftugoyan de ye. Moralê Pêşmerge jî bilind bûye. Bi berxwedana Pêşmerge û siyaseta Kurdistanê, Îraq û Îran li herêmê nagihin armancên xwe. Berzincî di derbarê rola Serok Barzanî de jî radgihîne ku serkirdayetiya siyasî ya Kurd hemû aliyan jî bi fermî daxwaz nekiriye ku Serok Barzanî dest ji karê xwe berde û dibêje: “Di vê rewşa heyî ez bawer nakim ku Serok Barzanî ji ser kar biçe an jî serdayetiya siyasî daxwazeke wiha bike. Serok Barzanî weke Pêşmergeyekî, weke rêberekî dikare vê proseyê birêve bibe. Girîng û zarûriye ku Serok Barzanî li ser karê xwe berdewam bike. Pêdiviyeke mezin pê heye.



“Amerîka û Îsraîl qebûl nakin”

Çavdêrê siyasî Karwan Ebdullah jî dibêje girîng e ku helwesta hêzên navdewletî biguhere û axaftina xwe wiha didomîne: “Guherîna helwesta hêzên navdewletî baş û girîng e. Plana hatiye danîn li ser Kurdistanê gelekî mezin e. Îran bi hêzeke mezin berê xwe daye Kurdistanê. Dewletên herêmê bi pêlanekî sêqolî polîtîkayên xwe birêve dibin. Rewş gelek aloz e. Yên ku niha diqewimin li Kurdistanê, vediguhere şerê Îran û Amerîkayê. Amerîka naxwaze destê Îranê li herêmê dirêj û bihêz be. Niha her tişt bi destê Îranê pêk tê li Îraqê.” Ebdullah radigihîne ku Amerîka helwesta xwe niha tund dike li hemberî Îranê. Ji ber wê yekê Îranê jî lez daye temamkirina plana xwe ya Xeta Şîe û êrişên giran tîne ser Kurdistanê û wiha pê de diçe: “Di wê çarçovê de hewl dide xalên sînorî ku gelek girîng û stratejîk in bi destê xwe ve bîne. Kurdistan jî vê yekê qebûl nake ev xal bikevin destê Îraqê. Ev xalên sînorî ji bo Amerîka, Îsraîlê û hêzên navdewletî yên din jî gelekî girîng in. Ji ber wê yekê ew vê yekê qebûl nakin. Eger ev der jî bikevin destê Îraqê Xeta Şîe ya Îranê temam dibe ku ev bi salan e ji bo temamkirina wê di nava liv û tevgerê de ye. Amerîka her tiştî dibîne û qebûl nake Îran ewqas bi hêsanî tevbigere.” Karwan Ebdullah di berdewamiya axaftina xwe de di derbarê niqaş û reşkirinên li ser Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî de jî dibêje: “Serok Barzanî berî referandûmê jî her digot ku ew naxwaze li ser postê xwe bimîne. Lê gelo kesek heye ku li şûna Barzanî rûne? Niha rewş aloz e û şerekî giran heye li Kurdistanê. Niha dixwazin Kurdistanê vegerînin serdema Sedam Hisên. Dixwazin ji holê rakin Kurdistanê. Ji ber wê yekê tu kes naxwaze niha serok Barzanî dest ji karê xwe berde. Heta ku ev rewş bidawî nebe ev mijar nayê niqaşkirin jî. Serok Barzanî ji bo Kurdistan û herêmê kesaeyetekî girîng e û divê rewşa aloz de wê li ser postê xwe be.”

“Pêdiviya Kurdistan, herêm û cîhanê bi Serok Barzanî heye”

Li hêla din piştî ku beşeke xaka Kurdistanê bi hevkariya hin hêzên navxweyî, piştgiriya dewletên herêmî û bi destê rêxistineke paramîlîter hat dagirkirin, li dijî Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî kampanyayeke reşkerinê hat destpêkirin. Li gor agahiyên berdest di serî de Amerîka hêzên navdewletî ji bo ku Serok Barzanî li ser karê xwe berdewam bike ketine navberê û herwiha aliyên siyasî yên Kurdistanê jî dixwazin Serok Barzanî li karê xwe berdewam be ku xwedî roleke girîng, berbiçav û dîplomasiyeke xurt e di qada navdewletî de. Pispor, rojnameger û çavdêrên siyasî jî radigihînin ku taybet jî di vê heyama aloz de pêdiviya Kurdistanê û herêmê bi kesayetekî weke Serok Barzanî heye û divê li ser karê xwe berdewam be.

Akademîsyen Deniz Çifçi:

Kî dikare mîna Barzanî Kurdistanê birêve bibe?

CESIM İLHAN

Ji Zaningeha Andrews ya Skoçyayê Dr. Deniz Çifçi, li ser mijarên dagirkirina Kerkûkê û geşedanên li Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivî. Çifçi dibêje, divê Kurd yekrêziya xwe pêk bînin û di warên leşkerî û siyasî de tifaqeke xurt ava bikin. Herwiha dibêje divê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dest ji peywîra xwe bernede û wiha pê de diçe: "Birêz Barzanî ji bo Herêma Kurdistanê di dîplomasiya navdewletî de xwedî roleke girîng e û kesayetekî biîtîbar e. Eger dest ji peywîra xwe berde wê di moralê tevahiya Kurdan de şikestinek çêbibe. Kî dikare weke Barzanî Herêma Kurdistanê birêve bibe?"

Hûn rûdanên li Kerkûkê çawa dinirxînin? 'Îxanet' têrî ravekirina vê meselê dike?

Kerkûk ne meseleyeke ewqas hêsan e ku tenê bi kêşeyên navxweyî û îxanetê herwiha bi komployan bê ravekirin. Lêbelê malbata Talebanî, taybet jî Bavil Talebanî û têkiliyên YNKê yên bi Îranê re ji bo dagirkirina Kerkûkê mifte da destê Heşda Şeibî. Helbet her tişt bi vê sînordar nîne, herçiqas îxanetek li holê hebe jî hêzên pêşmerge yên din jî bêamadekarî bûn.

DYA û Ewropa li hember êrişên li ser Kerkûkê bêdeng man?

Eger hêzên Pêşmerge ji sengerên xwe venekişiyana û 3-4 rojan şerek li wê derê biqewimiya DYA û Ewropa wê ji bo sekinandina şer biketa navberê. Eger hêzên bi ser Bavil Talebanî ve xwe nedabana paş û hêzên pêşmerge yên din jî berxwedanek nîşan bida û herwiha Heşda Şeibî bi şer daxwaza ketina Kerkûkê bikira DYA û Pentagonê wê bikarîbûna midaxele bikin. Bi paşvekişîna Pêşmergeyê, şansê DYAyê yê midaxeleyê nema. DYA bi vê yekê ev peyam da: "Hûn bêyî şer vekişin, tiştekî ku em bikin nîne." Welatên Ewropî jî wiha nêzîk bûn. Nemaze jî Fransa gelek zelal nebe jî piştgirî dida referandûmê lê heta ku Heşda Şeibî ji ber helwesta Bavil Talebanî bikeve Kerkûkê jî tu hêzên navdewletî daxuyaniyek nedan. Ne DYA, ne YE, ne jî Rûsya... Hemû li ber ketina Heşda Şeibî ya bo Kerkûkê bêdeng man.

Berpirsên Herêma Kurdistanê ku ji 1991an û vir ve li herêmê aktor in, ev dorpêç texmîn nekirin gelo?

Berî dagirkirina Kerkûkê YNK û PDKê civînek pêkanîn. Di vê civînê de Bavil Talebanî got, "an em paş ve vekişin an jî encama referandûmê betal bikin. Îraq dibêje an hûnê encama referandûmê betal bikin an em ê bikevin Kerkûkê." Barzanî ji wan re dibêje, 'Hûn li gel wan rêkeftin" Bavil jî dibêje, "na, em rêknekeftine" Barzanî û rêvebriya Kurdistanê bi baweriya Kosret Resûl û Necmedîn Kerîm îhtîmal nedan wê ku Bavil û îstîxbarata li derdora wî tiştekî wiha bikin. Ji ber wê yekê ehetiyek hebû û bergiriyên pêwîst nehatin wergirtin. Bi ya min diviyabû ev bihata dîtin û tedbîrin jî bihatana girtin.

Rojava, piştî DAIŞê berê xwe ji Herêma Kurdistanê gûherî?

Dema ku em li dîrokê dinêrin rojava gelek caran berê xwe ji Herêma Kurdistanê negûheriye. Peymana Cezayîrê, geşedanên piştî wê û herwiha di 1990î de Kurd avêtin ber Sedam û pişta xwe danê. Lêbelê vê carê em nikarin tenê bi sûçdarkirina hêzên rojava ji nav vî karî derkevin. Herçiqas rojava bi awayekî eşkere piştgirî nedabe referandûmê jî ev tişt digotin; "Di demeke kurt de em referandûma we nas nekin jî piştî diyaloga li gel Bexda û serkeftina Ebdaî di hilbijartinên Îraqê de, dibe em bibin navbeynkar." Ji xwe birêz Barzanî baweriya xwe bi vê yekê anî û referandûm pêk hat. Eger temînateke rojava hebûya ev referandûm pêk nedihat. Herwiha eger Bavil û alîgirên wî neketibana nav wan hewldanan Pêşmerge wê li ber xwe bida û DYA wê midaxele bikira. DYAyê, "Em referandûma we ya serxwebûnê di demeke kurt de, di raya giştî ya navdewletî de ji niqaş û guftugoyan re venakin, lê em destûr nadin ku Heşda Şeibî êrişî Kerkûk û deverên din ên nakok bike." DYAyê ev temînat dabû birêz Barzanî. Lêbelê ji ber ku Pêşmerge bêyî şer ji Kerkûkê derket, tiştek di destê DYAyê de nema ku bike. Taybet jî vekirina deriyên Kerkûkê ji aliyê YNKê ve şansê midaxelekirina DYAyê ji holê rakir. DYA û rojava Kurd ji pêş çavên xwe dernexistine. Tiştek nîne ku DYA û rojava soz dabe û bicî neanîbe.

Ji niha û pê ve divê çi bê kirin?

Wê Heşda Şeibî ji deverên nakok derxînin lê Artêşa Îraqê wê bimîne. Ji ber ku destûra Îraqê û hiqûqa navdewletî Kerkûk û deverên nakok girêdayî Îraqê dibîne. Di demên pêş de li van deveran wê biryara referandûmê were girtin û êdî gel çi biryarê bide. Kerkûk wê girêdayî Bexdayê bimîne, an wê ser bi Kurdistanê ve be an jî statûyeke wê ya taybet wê hebe... Îhtîmalek jî ew e ku eger Heşda Şeibî û Artêşa Îraqê êrişî Kurdan bike di navbera pêkhateyên bajêr ên Kurd, Tirkmen û Ereb de pevçûn rû bidin, Pêşmerge ji bo parastina Kurdan wê bikeve Kerkûkê û midaxele bike. Wê demê şerekî navxweyî derdikeve û DYA wê midaxele bike. Bi ya min tekane riya ku Kerkûk dîsa bikeve destê Kurdan ev e. Lê ez îxtîmal nadimê ku Artêşa Îraqê destûrê bide pevçûneke bi vî rengî.

Hûn di derbarê dîroka pêkanîna referandûmê de çi difikirin?

Biryar û dîroka referandûmê rast bû. Herêma Kurdistanê dizanî ku dema DAIŞ li herêmê bi temamî hat têk birin, Artêşa Îraqê û Heşda Şeibî wê êrişî herêmê bikin. Herêma Kurdistanê jî bi encamdana referandûmê xwest ku meşruiyeta xwe ya li ser wan deveran derbasî qada navdewletî bike. Nemaze jî xwast midaxeleyê ji bo Kerkûkê dijwar û asteng bike. Jixwe Herêma Kurdistanê rojek piştî referandûmê serxwebûn îlan nedikir. Ji bo ku destê xwe li hember Bexdayê bihêz bike wê ji bo 3-4 salan encamên referandûmê bihatana sekinandin. Herwiha wê ji bo hilbijartinên di meha Mijdarê de jî destê xwe xurt bikira.



"Tirkiye li herêmê Îran û Heşda Şeibiyeke bihêz naxwaze, ji ber vê yekê pêdiviya wê bi Herêma Kurdistanê û Barzanî heye."

Piştî bûyerên li Kerkûkê hin derdor daxwaza îstîfaya hikûmetê dikin. Ev çareseriyeke rast e gelo?

Na! Ev ne çareserî ye. Dema ku Hikûmeta Kurdistanê îstîfa kir, Hewlêr jî wê bikeve bin metirsiyê. Duhok jî wê bikeve bin talûkeyê. Ji ber ku girêdaneke bêhampa ya Pêşmerge bi Birêz Barzanî û rêveberiya PDKê re heye. Herwiha Birêz Barzanî di dîplomasiya navdewletî de jî xwedî îtîbareke mezin e û xwedî gotin e. Ji Hewlêr heta Zaxo pêkvejiyanek ava kiriye. Dema îstîfaya Barzanî hat rojevê wê moralê Kurdan têk biçe. Kî dikare weke Barzanî Herêma Kurdistanê birêve bibe. Yekî wek wî nîne ku di dîplomasî û siyaseta navdewletî de xwedî gotin be û Kurdan bi hev re bigire. Herwiha moralê Pêşmerge jî dê têk biçe û ev yek wê bandoreke neyînî li ser îradeya şer jî bike. Îstîfaya Barzanî ne di berjewendiya Kurdan de ye. Dema ku li Herêma Kurdistanê hikûmeteke bihêz pêk hat, Pêşmerge di bin yek sîwanê de hatin ba hev û rewşa Kerkûk û deverên din ên nakok diyar bû, wê demê dikare dest ji peywîrê bikişîne. Divê birêz Barzanî li ser kar bimîne, hikûmeteke niştimanî û bihêz bê avakirin, tifaqeke netewî pêk were. Divê em piştgiriyê bidin mayîna Barzanî ya li ser kar, heta ku kêşeyên li herêmê çareser dibin.

Tê îdîa kirin ku "Tirkiye û Îran dixwazin birêz Mesûd Barzanî here..."

Niyeta Tirkiyeyê ya tasviyekirina Barzanî tune ye. Ji ber ku di navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê de, di ser Mesûd Barzanî de têkiliyên baş ên aborî û siyasî hene. Dîsa di navbera AKP û PDKê de têkiliyeke bi salan heye. Ji dêvla ku van têkiliyan ji holê rake dîtina alternatîfekî zehmettir e, Tirkiye vê nade berçavan. Dibe ku dilê Tirkiyeyê bixwaze ku Barzanî ji holê rake lê berjewendiyên siyasî û aborî nahêlin. Lê Îran dixwaze Barzanî tasviye bibe. Herwiha Îran ne tenê niha vê dixwaze, bi taybetî jî ji sala 2011an vir ve ji bo çûyîna Barzanî gelek caran hewil da. Eger Barzanî midaxaleyî Hewlêrê nekira wê sîxurên ku kûdeta pêkanîn û hin komên ku hatine tasfiye kirin nebûna wê Mesûd Barzanî tasfiye bikirana. Îran vê yekê tim dike. Têkiliyên Îranê ligel Goranê pir baş in. Têkiliyên Îranê bi malbata Talebanî re ev 25 sal e bisazî ne. Lê Îranê tu carî bi Barzanî û malbata wî re nikaribû van têkiliyan deyne. Ji ber ku Barzanî û PDK tim xwe ji Îranê dûr girtine.

Çi li benda YNK a piştî Celal Talebanî ye?

YNK di van 3-4 salên dawî de di hundirê xwe de tim pirsgirêk dîtin. Bi taybetî jî Mele Bextiyar, Qosret Resûl û Nejmeddîn Kerîm polîtîkayên YNKê li hember Barzanî bi dijminahî û têkiliya ligel Îranê rast nedidîtin. Ev Qeraseyên kevin ê YNKê tim ligel Barzanî di danûstandinê de bûn lê tesîra wan li ser Pêşmergeyên YNKê û îstîhbarata wê pir nîn e. Ya herî girîng jî ne xwedî medya û çapemeniyê ne. Medya- çapemenî, îstîxbarat û Pêşmerge bi giştî destê kurê Talebanî Pavel Talebanî û biraziyên Celal Talebanî de ne. Hetta ne di destê Qubad Talebanî de ne jî. Ev navên ku me bilêv kirin an dê ji YNKê veqetin an jî dê bikin ku YNK tercîhekê bike. Bi van rûdanên dawî YNK bi fermî bû du beş.

Tifaqa YNKê a bi Tehran û Bexdayê re wê biçe ku?

Dema bi ser YNKê de biçin dibe ku weke li Ereban hate kirin li Herêma Kurdistanê jî du dewlet bên ava kirin. Yanê ji Silêmanî, Kerkûk heta Hewlêrê dewleteke konferatîf di bin serweriya malbata Talebanî de be ku Barzanî nikaribe hîç midaxîl bibe. Ji Zaxo heta Hewlêrê jî dewleteke din. Niha rewş ber bi vê yekê ve diçe. Ew kesên me got di nav YNKê de weke Mela Bextiyar, Nejmeddîn Kerîm, Qosret Resûl midaxele nekin wê Pavel Talebanî û kesên ji îstîxbaratê ku li derûdora wî ne Silêmanî ber bi vê yekê ve dibin. Tifaqa Pavel Talebanî ligel Tehran – Bexdayê ber bi vê yekê dimeşe. Malikî bi awayekî vekirî got ku: "Ez piştgiriya du parçekirina Herêma Kurdistanê dikim." Eger ligel Îraqê diyalog dest pê bikin wê vê kartê li hember Herêma Kurdistanê bikar bînin. Wê bibêjin, "Eger tu Îraqê parçe bikî em ê jî Herêma Kurdistanê dabeş bikin." Ji xwe Pavel Talebanî jî ji vê yekê re amade ye. Rêgirtina vê yekê jî bi parvekirina hêza aborî ya PDKê ji Silêmanî re de derbas dibe.

"Gelo Tevgera Goranê..."

Tevgera Goranê piştî vê saetê nikare bi YNKê re tev bigere, eger bike wê tûka xwe daqurtîne. Ew jî an wê dabeş bibe an jî wê tesîra wê nemîne. Piştî mirina Newşîrwan Mistefa tesîra wê gelekî kêm bû.

Tirkiye, Îran û Heşdî Şabiyeke bihêz li herêmê dixwaze?

Îran û Heşdî Şebî hêzeke mezhebî û îdeolojîk in. Dema rewş asayî bibe yekem gavên wan dê derxistina leşkerê Tirkiyeyê ji Başîka be. Jixwe fermandarekî Heşdî Şebî daxûyaniyek da û got ku: "Divê Başîka bê valakirin eger neyê valakirin em ê operasyoneke mezin lidar bixin." Ji ber vê yekê jî Tirkiye li Îraqê, Îran û Heşdî Şebiyeke bihêz naxwaze. Ji ber vê yekê be jî pêdiviya Tirkiyeyê bi Barzanî heye.



"Li Rojhilata Navîn hêz her tim diyarker e, lewma divê Herêma Kurdistanê di warê leşkerî de xwedî bingeheke mezin û girîng be."

"Barzanî jî Kurdistaneke bêyî Kerkûk naxwaze!" Dagirkirina Kerkûkê û deverên Kurdistanê tê wateya sed sal paşxistina serxwebûnê?

Na, serxwebûn paşve nehatiye xistin. Serxwebûneke Kerkûk di nav de heye û serxwebûneke bêyî Kerkûkê heye. Niha Kurd bibêjin 'Bila Kerkûk ji we re be em serxwebûna xwe îlan dikin' kes dengê xwe dernaxe. Bexda jî vê yekê pir nake pirsgirêk. Ji ber ku pirsgirêka mezin Kerkûk e. Kerkûk bajarê ku aboriya Îraqê li ser linga dihêle ye. Kurdistaneke bêyî Kerkûk wê dewleteke aboriya wê bêhêz, li ser kevir û axê hatiye avakirin be. Barzanî jî Kurdistaneke bêyî Kerkûkê nexwaze. Kerkûk di heman demê de ava ku Kurdistanê av dide ye. Kurdistaneke bêyî Kerkûk bala welatên Rojava jî nakişîne. Saddam jî tim otonomî dida Kurdan lê bi şertê bêyî Kerkûkê. Mele Mistefa Barzanî jî ji ber ku Kerkûk nedidan wan otonomî pesend nedikir. Eger dev ji Kerkûkê berdin û serxwebûnê îlan bikin gel Barzanî efû nake.

Di rewşa niha de divê Herêma Kurdistanê girîngî bide çi?

Niha tişta girîng ew e, derûniya gel ku dibêje 'Em têk çûn, dawiya me hat' were rastkirin. Gel dibêje: "Kerkûk çû, wê Silêmanî, Zaxo û deverên din jî biçin." Ji bilî van jî hebûna du hêzên leşkerî van tiştên niha em dijîn anî serê Kurdan. Divê Pêşmerge di bin sîwanekê de bikin yek. Stratejiya yekîtiya leşkerî pêk bîne pêwîst e. Tifaqa netewî divê pêk were. Ligel îxaneta Pavel Talebanî jî divê 'Tifaqa Netewî ya Kurdistanê' bi beşdariya YNKê pêk were. Piştî ku ev pêk hatin wê demê dikarin zorê li Kerkûkê bikin da ku referandûm li wir pêk were an jî hêza xwe li derûdora Kerkûkê bicih bikin. Li Rojhilata Navîn hêz tim bikêr tê, ji ber vê yekê jî divê Herêma Kurdistanê di warê leşkerî de xurt bibe. Elbet ev ji bo hemû hêzên Kurdî derbasdar in. Piştî vê divê tifaqên siyasî bên kirin. Di dîplomasiya navnetewî de divê têkiliyên pragmatîst bên danîn. Li herêmê dîsa pêdiviya Kurdan bi Kurdan heye.

HOŞENG OSÊ

Serok û Facebook



Di gel hemû nakokî û cudahiyên di navbera PKKê û PDKê de hene, lê tiştekî hevbeş û gelek balkêş û beloq di navbera alîgirên herdû partiyan de heye. Alavên medya civakî facebook û twitter gelek baş vê yekê daye pêş aşkere kirine û mixabin ev alav jî bûne beşek ji gur û geşkirina vî tiştê hevbeş. Dibe ku hinek kes pirs bikin; 'yawo kurd di hemû tiştan de li hev nakin û tenê di tiştekî de yek in ku kurd in û hew bes ev e! Ka ev tiştinê din yê hevbeş çi ne?'

Hezkir î perestkarên birêz Öcalan û PKKê, hema Öcalan yan jî berpirsên PKKê bikuxin yan jî çi bêjin, çi daxwiyaniyê bidin, eger dijûn be jî, ger Öcalan bêje, haşayî hizûra we: "Kurd ker in, fêm nakin, xayîn in, nehêjayî welatekî serbixwe ne! Ez qurbana komara demokratîk bim û heyrana Mustafa Kemal Atatürk bin...", eger wisa jî bêje, hûnê bibînin bê algir û hezkirî û perestkarên Öcalan çawa dê bêjin: "Wey em hemû gêlê kurd û hemû gelên cîhanê biqurbana te bin, ey serokê gelê kurd, rêber Apo, bê tu çiqas hêjayî, zanyarî, ramyarî, fêlezofî... ma em çi bêjin? Çi nebêjin? Hemû tişt li bejn û bala te tên, seroko qurbano".

Ev alîgir qey nizanin bê Öcalan weke hemû mirova; av û xwarinê dixwe? Weke me tevan destava wî a piçûk û a mezin heye û diçe tuwalêtê? Weke hemû mêran jina wî jî hebû û bi jina xwe re radiza û dilê wî dibijiya tiştên hemû tiştên ku dilên mêran dibije wan? Ango Öcalan ne Xwedê ye! Ne firşteye! Ne pêxember e! Lê mirov e û dikeve şaştiyan û kêlîkên lawaziyê, jiyaye û dijî! Lê di dîroka PKKê de ji 1978an û heta niha, tu belge nînin dibêjin berpirsekî PKKê, di civîn û kongreyên rêxistinê de gotiye; "Öcalan divê mijarê de yan divê xalê de, şaş bû! Yan şaş çû" û ev berpirs di nava rêxistinê de maye! Tiştekî wisa heta niha çênebûye!

Mebesta gotinê ev e ku eger Öcalan û PKKê çi tiştekî "xwaro maro" ne li rê ku mentiq û mêjî qebûl nake, bêjin, alîgir û hezkiriyên Öcalan û PKKê dê dîn bibin û bi facebook û twitterê bikevin û bihaniyan ji gotinên Öcalan û PKKê re bibînin û peyda bikin. Û kîjan kes ku hema hinek guman yan pirseke piçûk derbarê gotin û daxwiyaniyên Öcalan û PKKê de bêje, xelas, ev kes, Xwedê jê stand û dê bibe benîşt di devên apociyan de û Xwedê jî nikare wî ji devê wan derîne.

Alîgir û hezkirî û perestkarên birêz Mesud Barzanî û PDKê jî divê diyardeyê de ne kêmî apociyan in! Ew jî, hema çi gotin, çi helwest, çi kiryar, çi siyaset ji aliyê Barzanî be, hema te nedît kesên xwe hezkiriyên "rebaza" Barzanî dibînin, bê çawa agir bi facebook û twitterê dixin ji aş û baş dest bi peyde kirina bihaneyan dikin û dibêjin: "Wey em hemû gelê kurd û hemû gelên cîhanê biqurbana te bin. Ey serokê serokan, rêberê me, bê tu çiqas hêjayî, zanyarî, ramyarî, fêlezofî... ey kak Mesûd. Ma çi bêjin? Çi nebêjin? Hemû tişt li bejn û bala te tên, seroko qurbano".

Ev alîgir û hezkirî û perestkarên "Barzanîzmê", qey nizanin bê birêz Mesûd Barzanî jî, weke me tevan; av û xwarinê dixwe? Weke me destava wî a piçûk û a mezin heye û diçe tuwaletê? Weke hemû mêran jina wî jî hey û bi jina xwe re radizê û dilê wî dibijiya tiştên hemû tiştên ku dilên mêran dibije wan? Ango kak Mesud Barzanî ne Xwedê ye! Ne firşteye! Ne pêxember e! Lê mirove û dikeve şaştiyan û kêlîkên lawaziyê jî, jiyaye û dijî! Di dîroka PDKê de jî tu belge nînin dibêjin ku berpirsekî PDKê, di civîn û kongreyên rêxistinê de gotiye; "Barzanî divê mijarê de yan divê xalê de, şaş bû! Yan şaş çû" û ev berpirs di nava rêxistinê de maye!

Mebesta vê nivîsê ku ne li dijî Öcalan û Barzanî be, lê divê mirov li dijî vê propagendeya erzan, nizm û kirêt ku alîgir û perestkarên Öcalan û Barzanî ji serokên xwe re dikin! Ev propagendeya erzan ku algîriyê herdû serokan dikin, Öcalan û Barzanî di çavên xelkê de reş dikin. Ev hişmendî û zihniyet ku li cem Barzaniyan û Apociyan heye, ev pîstirîn tiştê hevbeşe ku di navbera herdu aliyan de ye.

Bi kurtî: Ewqas koletî û perestkarî ji serokên kurdan re nabe yawo! Û mixabin facebook û twitter bûne meydana cirîda vê koletiyê! Ya dawî ku mirov dikare bêje: Mala Xwedê hezar carî ava ku Mesud Barzanî û Abdullah Öcalan ne ji hezkiriyên facebook û twitterê ne.

Rewşenbîrên Kurd palpiştiya Barzanî dikin!

CELÎL CEWHER

Di serî de Kerkûk û bi giştî jî herêmên nakokî yên di navbera Îraq û Herêma Kurdistanê de ji aliyê Artêşa Îraqê û Heşdî Şebî ku bi piştevaniya Îranê tevdigere hatin dagirkirin. Piştî dagirkirina van herêman Tirkiye û Îran bi awayekî zelal piştgiriya xwe bo Artêşa Îraqê ragihandin û medyaya van welatan jî di derheqê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî de dest bi zimandirêjî û qirêjiyê kirin. Bi rastî jî ev helwesta qirêj a li hember Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di nava Kurdên Tirkiyeyê de bû sedema bertekan. Rewşenbîr, siyasetmedar û rojnamegerên Bakur bi rêya Heftenameya Basê palpiştî û piştgiriya xwe ji Serok Mesûd Barzanî re nîşan dan û dibêjin Mesûd Barzanî ji bo Kurdan semboleke netewî û manewî ye. Em palpiştiya rêbaza Barzanî ku ji bo serxwebûna Kurdistanê didomîne, dikin.



Rewşenbîr, siyasetmedar û rojnamegerên Bakur bi rêya Heftenameya Basê palpiştî û piştgiriya xwe ji Serok Mesûd Barzanî re nîşan didin û dibêjin ku Mesûd Barzanî ji bo Kurdan semboleke netewî û manewî ye. Em palpiştiya rêbaza Barzanî ku ji bo serxwebûna Kurdistanê didomîne, dikin.

"Me armanca serxwebûnê winda nekiriye"

Nivîskar û rewşenbîr Fuad Onen dibêje: "Dewleta serbixwe ya Kurdistanê şoreşa ku wê pergala dewletan a cîhanê di Rojhilata Nêzîk de bi taybetî jî ya Rojhilata Navîn têk bibe ye. Referandûm nîşana vê yekê bû. Berteka welatên dagirker ên herêmî ku parastina statûkoya niha dikin ne xerîb bû. Sedema çar welatên dagirker bi rêvekirina DYA û Rûsyayê êrîşkirina welatê me jî ji ber vê yekê ye. Ew kesên li hember van êrîşan şaş dibin bi şaşî li serxwebûna Kurdistanê dinêrin. Di rewşa normal de îstîfaya Serok Mesûd Barzanî dihat qebûl kirin an jî fam kirin. Lê belê weke kesayet Serok Barzanî gava serxwebûnê avêt û eger îstifa bike wê ev bibe tavîzek li hember van êrîş û dagirkirinan. Ji ber vê yekê jî divê îstifa neke. Divê derkeve qadan û li hember daxistina xwe rabe ser lingan û dengê serxwebûnê berfirehtir bilêv bike. Ji bo vê maxlûbiyeta demkî divê banga şer bike û Kurd jî palpiştiya wî bikin."

"Azadî an jî tarîtiya ebedî?"

Lîstikvan Devrim Mukriyanî dibêje ronahiyek vejiya û wiha didomîne: "Gelo divê em li pey vê ronahiyê biçin an jî weke her demî piştgoh bikin. Kî ne ew dijminê şêrên Mezopotamyayê? Dîsa ew bi xwe ye bêguman... Komara Kurdistan a sedsala 20. ji ber îxanet û bêbaweriyê têk çû. Gelo Erbîla sedala 21mîn? Gelo dê heman qederê bijî? Wê Kurd qet ders negirin ji dîrokê? Em li benda çi ne ji bo rabûnê? Bi xwe bawerî, ji xwe hezkirin û Kurdbûn gelo bi rastî jî wisa zehmet e? Hesinên prangayên me ku kevin bûne êdî me aciz nakin? Serokekî me yê ku van prangayan qebûl nake, serî hildide heye. Navê wî Mesûd Barzanî ye. Di van deman de li pêşberî Kurdan di navbera rêyeke ronahî an jî tarî de benekî zirav heye. Lêbelê Barzanî bi tenê ye. Divê ew kesên aşiqê azadî û serxwebûnê ne palpiştiya wî bikin. Ez bawer dikim ku mirovên wisa hene. Dixwaz im bawer bikim. Divê em ji bîr nekin ku azadî nayê dayîn tê stendin."

"Barzanî fîgura baweriya Kurdistanê ye"

Nivîskar Kutbettin Nurlubaş dibêje: "Referandûma serxwebûnê mafekî rewa û demokratîk bû... Bingeha bûyîna mirov û netew derketina vê îradeyê ye... Ne sedema şer, pevçûn û tundrewiyê ye. Rûdana îxanetê li Kerkûkê jî sedema tunebûna yekdengiya navxweyî ye. Ji ber vê yekê jî teqez divê Artêşa Netewî bê afirandin. Li hember vê yekê jî Serok Barzanî fîgura baweriya Kurdistanê ye. Îstifakirina Serok Mesûd Barzanî wê bibe cihê xeyalşikestinê."

"Serokatiya Barzanî bi hilbijartina gelê me bû"

Rojnameger Aydın Dere wiha diaxive: "Referandûm bêguman maf e. Elbet divê piştgiriya wê bihata kirin û gel ji sedî 93 got 'Belê'. Daxwaza serxwebûnê sûç be ev dewletên heyî sûcdar in? Bêguman êrîşa Kerkûkê êrîşa 3 welatên dij mirovahî, hovane û ji mafperestiyê dûr bû. Ji ber ku serxwebûna Herêma Kurdistanê wê tesîrê li hemû parçeyên Kurdistanê bikira. Metirsin, çawa me piştgiriya Kobanî kir wisa piştgiriya Herêma Kurdistanê jî bikin. Başûr û Rojava welatê me ne. Vî gelî ji rojê re pir dia kir û ez bawer im wê ew roj ji bo me jî ava bibe. Serokatiya Serok Mesûd Barzanî biryar û hilbijartina gelê me bû. Bi hemû kêmasiyên xwe re jî gelek destkeftî pêk anîn. Lêbelê îxaneta Pavel Talebanî divê bê darizandin. Elbet em ê têk biçin lê tişta girîng ew e ku em careke din bi hêztir rabin. Em gelekî hejmara wê 50 milyon in. Di binê vê rojê de mafê vî gelî jî heye ku bi awayekî azad bijî. Îstifaya birêz Mesûd Barzanî an jî mijarên wisa girîng divê ji gel bên pirsîn. Eger biryarek bê dayîn jî divê ev biryar a gel be."

"Serxwebûn ketiye rêyeke ku jê veger tune ye"

Nivîskar Ersin Tek ji Basê re wiha dibêje: "Piştî referandûma diyarkirina çarenivîsa gelan a bi destê gelan weke hemû gelan mafê gelê Kurd ê rewa ye. Bi taybetî li serşê Barzanî bi giştî Herêma Kurdistanê bi ambargo, êrîş û birçîbûnê tê sizakirin. Lê belê em baş dizanin ku dîroka doza netewî ya azadiya Kurdistanê bi qetlîam, sirgûn, îşkence, bi berxwedan û têkoşeriyê derbas bûye. Li gel êş, elem û zehmetiyan doza azadiya Kurdistanê bi bexwedan, hêvî û têkoşeriyê derbas bûye ev doz bi pêkanîna referandûma serxwebûnê de derbasî asteke din bûye ku êdî veger ji vê rêyê ne pêkan e. Em weke gelê Kurd divê palpiştiya mîmarê vê proseyê Serok Mesûd Barzanî bikin û rê li ber komployan bigirin da ku Serokê Herêma Kurdistanê û sembola serxwebûna Kurdistanê Mesûd Barzanî bê îtîbar nekin. Ev yek ji bo hemû Kurdan ferz e.

"Barzanî ji bo Kurdan semboleke netewî û manewî ye"

Nivîskar Sedat Doğan: "Trajediya hezar salî ya Kurdan bi herkesî ve malûm e. Ev dagirkerî bi alîkariya xiyanetên navxweyî komployeke kûr e. Aktorên sereke Îran û Tirkiye ne. Ji ber ku Îraq welatekî sanal e. Îraq û hevjîna Talebanî û zarokên wê tenê piyon in. Ji ber ku wan bi xwe nikaribûn êrîş bikin zarokên Talebanî bikaranîn. Bi avabûna Kurdistanê re qiyamet ranabe lê rakirin. Barzanî ji bo Kurdan semboleke netewî û manewî ye, ji ber vê yekê êrîş dikin. Daxwaza dest ji kar kişandina wî jî bi niyeta têkbirina daxwaza serxwebûna gelê Kurdistanê ye."

"Îran, Îraq û Tirkiye Barzanî naxwazin"

Mele Melik Kızıltaş: "Ewên serok naxwazin kî ne? Îran, Îraq û Tirkiye... Eger Barzanî hebe ev her sê welat rehet nabin, ji ber ku nikarin bikirin. Eger bikaribûna jixwe re li partnerên din nedigeriyan. Ji ber vê yekê jî ne îstifaya Serok Mesûd Barzanî divê rê li pêşiya van nîqaşan jî bê girtin. Îstifaya wî ne tenê dawî anîna şexsê xwe dawî anîna îradeya gelê Kurd e. Jixwe tişta pişta me dişikîne îxanet e. Divê îstifa neke."

"Bi milyonan Kurd palpiştiya serxwebûnê dikin"

Nivîskar Abdurrahman Almaz: "Birêz Mele Mistefa Barzanî û Mesûd Barzanî û malbata xwe stûnê têkoşîna serxwebûna Kurdistanê ne. Tişta hebûna Kurdan li raya navnetewî û di hiqûqa navnetewî de derdixîne holê ew doz e. Fikr û îradeya serxwebûnê ku bi Mesûd Barzanî geş bû bi van îxanet û êrîşan dixwazin ji holê rakin. Dibe ku Kurd rastî îxaneta aliyekî biçûk a di nava xwe de hatibin. Lê belê referandûmê nîşanî cîhanê da ku bi milyonan Kurd palpiştiya Serok Mesûd Barzanî û azadiya xwe dikin. Kurd encax bi palpiştiya Mesûd Barzanî û li hemberderketina îxanetê dê bigihîjin armanca serxwebûn û azadiyê."

"Barzanî ji bo dahatûya Kurdistanê pir girîng e"

Mamoste û şîrovekarê siyasî Bengîn Botî: "Îdare û gelê Herêma Kurdistanê di serdemeke zehmet û krîtîk de derbas dibe. Her gaveke vê serdemê ji bo dahatûya Kurdan pir girîng e. Di vê rewşê de hebûna Mesûd Barzanî pir girîng e. Daxwaza îstifakirina birêz Mesûd Barzanî ne girêdayî rewşa Kurdistanê ye Goran û YNK li gor berjewendiyên xwe yên hizbî vê daxwazê dikin. Nabe Mesûd Barzanî îstifa bike ew ji bo dahatûya Kurdistanê pir girîng e."

"Di şexsê Barzanî de êrîşî îradeya netewî dikin"

Siyasetmedar û Parêzger Mahmut Koyuncu: "Referandûma li Herêma Kurdistanê pêk hat mafekî rewa, hiqûqî, li gor mafê mirovan, dîrokî û herwiha di dema herî baş de bû. Sedema dijminên Kurd û Kurdistanê bi awayekî vekirî li hember derketina pêkanîna referandûmê ew bû ku wê îradeya gelê Kurdistanê bi şêweyeke demokratîk rû bide û ev yek jî wê mafê rewa yê diyarkirina çarenivîsa Kurdan bixe destê Kurdan. Dagirker û înkarkerên Kurdistanê îddia dikin ku gelê Kurdistanê serxwebûnê naxwaze û weke neteweyekî tevnagerin. Ev êrîş û dagirkirina xeyrîmeşrû li Kurdistanê bila moral û îradeya Hikûmeta Herêma Kurdistanê têk nebe. Dagirker di heman demê de reşkirin û biçûkxistina Serokên Kurdan ji xwe re kirine edet. Niha jî di şexsê Serok Mesûd Barzanî de êrîşî îradeya netewî ya serxwebûnê dikin.

Partiyên Kurd dagirkirina Kerkûkê şermezar kirin

DARA BANDÎNÎ

Hereketa Azadî, OSP, PAK, PDK-Bakur û PSKê li ser dagirkirina Kerkûkê û êrîşên li ser Herêma Kurdistanê daxuyaniyeke çapemeniyê li dar xistin û di daxûyaniyê de êrîşên li ser Herêma Kurdistanê şermezar kirin û ragihandin, "Îran, Îraq û Tirkiyeyê kêşeyên di navbera xwe de danîne alîyekî û li ser dijminatî û têkbirina destkeftîyên gelê me yê Başûrê Kurdistanê, bûne yek."

Li Bakûr partiyên Kurd di 27ê meha Cotmehê de li Navenda Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) daxûyaniyeke hevpar dan. Li ser navê partiyên Kurdistanê Serokê PDK – Bakur Sertaç Bucak daxûyaniyek bi Kurmancî û Serokê PSKê Mesûd Tek jî bi Tirkî xwend. Di daxûyaniyê hat gotin; "Dewleta Şîe ya Îranê, Dewleta Mezhebî ya Îraqê û Tirkiyeyê pirsgirêk û nakokiyên di navbera xwe de danîne aliyekî û êrîşî Başûrê Kurdistanê dikin. Bêdengiya raya cîhanê jî van êrîş û dagirkirinên milîsên Şîe Haşdî Şabî û Pasdarên Îranê re rê xweştir dikin. Em weke Kurdên Bakur van êrîşan şermezar dikin û bangî raya navdewletî dikin ku li hember van êrîşan bertek nîşan bidin."

"Kurdistan li ber stratejiya Îranê bendeke esas e"

Daxûyaniya çapemeniyê ya Partiyên Kurdistanî: "Parlemento û hikûmeta Herêma Kurdistanê, li hemberî plan û stratejiya Îranê yên dagirkêr, li Rojhilata Navîn bendeke esasî û girîng e. Lê bi vê bêdengiya navnetewî, raya giştî ya cîhanê û hêzên demokrasîxwaz, ji niha ve bi destê xwe rê li ber Îranê vekiriye ku destê Îranê xurt bibe. Îro gelek kes qala 'Yekîtiya xaka Îraqê' dikin. Lê eşkere ye ku ev gotineke vala ye. Bi navê Îraqê jî tu dewlet nemaye. Îraqa ku bi pirsgirêkên xwe yên mezhebî her bûye qada şer û pevçûnan dê nikaribe yekîtiya xaka xwe pêk bîne. Di esasê xwe de ew kesên qala 'Yekîtiya xaka Îraqê' dikin, armanca wan ji holê rakirina Kurdistana Federe, dagirkirina Herêma Kurdistanê ye. Ev êrîşên Pasdarên Îranê, Heşdî Şabî, Artêşa Îraqê jonesîd e, hovîtî û binpêkirina îradeya gelê Kurdistanê ye. Em van dagirkirinan û van hovîtiyan mehkûm û rûreş dikin."

"Hikûmeta Tirkiyê radestî siyaseta nijadperest bûye"

Daxuyaniya partiyên Kurd wiha berdewam dike: "Hikûmeta Enqereyê ango desthilatdariya AKPê, dema DAIŞê xwestibû êrîşî Hewlêrê bike bêdeng mabû. Lê vê carê qîma xwe bi bêdengiyê neaniye û bûye şirîkê dagirkirin, êrîş û şerê li dijî gelê me yê Başûrê Kurdistanê jî. Desthilatdariya AKPê xwe bi temamî radestî siyaseta nijadperest a MHPê kiriye. Ketiye bin tirsa; parçebûnê. Siyaset û Desthilatdariya Erdoğan û AKPê, tu eleqeya xwe bi rastiyê, bi çareserkirina kêşeya Kurdî û Kurdistanê tune ye. Desthilatdariya Enqereyê tenê ji bo destkeftiyên Kurdan ji dest biçin, bi zanebûn rê ji dagirkirina Îran û Îraqê re vekiriye. Ev weke tercîheke fermî ya dewleta Tirkiyeyê ye."

"Diviyabû Amerîkayê hevalbendê xwe bi tenê nehişta"

Di dirêjiya daxuyaniyê de tê gotin ku bêdengiya Amerîkayê jî nayê qebûl kirin û wiha tê gotin: "Îro Heşdî Şebî ligel Îranê bi çekên Amerîkayê êrîşî Kurdan dike, Kerkûkê dagir dike. Diviyabû Emerîkayê hevalbendê xwe yê herî nêz yê di şerê li dijî DAIŞa hovane de, li hember van êrîşên Îranê û Îraqê bi tenê nehişta. Em dewleta Îranê jî ya Îraqê jî ji ber van êrîşên wan ku bi armanca ji nû ve dagirkirina Herêma Kurdistanê protesto û rûreş dikin."

"Divê Tirkiye dest ji vê siyaseta xwe berde"

Partiyên Kurd bang li hikûmeta Tirkiyê û rêxistinên navdewletî dikin û wiha dibêjin: "Dewleta Tirkiyeyê divê dest ji vê siyaseta xwe ya xelet, ya li dijî Herêma Kurdistanê berde. Dewletên cîhanê û raya giştî ya cîhane ji bo parastina pirrengî, demokrasî û azadiya li Başûrê Kurdistanê, divê li dijî vê dagirkirinê derkevin. Em bang li Neteweyên Yekbûyî, NATO, Yekîtiya Ewropa û Konseya Ewropayê dikin ku, li dijî dagirkirina Îranê û Îraqê derkevin û Kurdistana ku girava azadî û demokrasiyê ya Rojhilata Navîn e biparêzin.




"Kerkûk jî dê bê rizgarkirin û serxwebûn jî dê were îlankirin"

Partiyên Kurd dibêjin: "Em bangî Emerîka û dewletên din ên cîhanê dikin ku dest ji van siyasetên xwe yên xelet berdin û piştgiriya Pasdarên Îranê nekin. Hevalbend û mitefîkên we gelê Kurdistanê ye wan bi tenê nehêlin! Referandûma serxwebûnê ya di 25ê Îlonê de li dar ket, berdewamiya têkoşîna doza azadî û serxwebûna gelê Kurdistanê ye. Tu hêz û tu sedem dê nikaribe vê îradeya meşrû û demokratîk tune bihesibîne. Tu şika me tune ye ku, Kerkûk jî wê bê rizgar kirin, serxwebûn jî dê bê îlan kirin. Artêşa Îraqê ya ku careke din bi piştgiriya Îranê Kurdistan dagir kiriye divê destê xwe ji Başûrê Kurdistanê bikişîne. Referandûm beyaneke meşrû, demokratîk, aştiyane ya gelê Kurdistanê ye. Divê herkes û her alî rêzê li vê îradeyê bigire.

Ji bo şehîdan nimêja giyabî hat kirin

Piştî daxûyaniya çapemeniyê bi beşdariya Berdevkê Hereketa Azadî, Serokê Giştî yê PAKê, Sekreterê Giştî yê PSKê, Serokê PDK- Bakur, Serokê OSPê nimêja giyabî ji bo şehîdên Kurdistanê hat kirin. Nimêj ji bo şehîdên Kerkûkê û hemû şehîdên Kurdistanê hat kirin. Berdevkê Hereketa Azadî Ayetullah Aşitî meletiya cimaetê kir.

Berdevkê Herketa Azadî Ayetullah Aşitî de derbarê vê çalakiyê de wiha axivî: "Me îro li hember êrîş û dagirkirinên Îraqê ya bi piştevaniya Îranê daxûyaniyeke çapemeniyê da û di eynî rojê de li Diyarbekirê li Mizgefta Ofîsê, piştî xutbeya Înê, bi beşdariya gelê me yê Diyarbekirê û rêveber û endamên Hereketa Azadî, OSP, PAK, PDK-Bakur, PSKyê û gelek rewşenbîr û sîyasetmedaran nimêja giyabî ya cenazeyê kir."



Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

Medya Îranî, dagirkirina Kerkûkê û Kurdên Rojhilat

ŞERÎF FELAH

Piraniya Kerkûkê ji Kurdan pêk tê. Tirkmen jî li vî bajarî hene. Keldanî, Asûrî, Suryanî jî li Kerkûkê dijîn. Ji bilî wan Erebên Sunne ku ji derve anîne û Erebên Şîe jî hene. Van pêkhateyan li bajêr pêkvejiyanek ava kiriye.



Li herêmê ji ber geşedanên leşkerî û rikberiya siyasî her tim guhertin pêk tên. Ev guhertin nemaze jî li welatên ku gelek pêkhate tê de dijîn û cîranên hev in pêk tên. Kerkûk ji dîrokê heta îro ji ber çevkaniyên xwe yên petrolê her tim çavê hêzên mezin ên cîhanî lê bûye. Ji peymanên Sewr, Lozan, Sykes-Picot, şerê Osmanî – Safewiyan bigirin heta şoreşên Kurdan ên li pey hev, Kerkûk bûye qada rikberiya siyasî, aborî û leşkerî ya hêzên mezin.

Girîngiya Kerkûkê

Piştî ku wîlayeta Mûsilê belav bû û dewleta Osmanî hilweşiya, di nevbera Rûsya, Brîtanya û Fransayê de hevrikiya Kerkûkê dest pê kir. Kerkûk bi erdnigarî û dîroka xwe bajarekî Kurdistanî ye. Lê ji ber nebûna desthilateke siyasî li wê derê û dagirkeriya Îraqê ya li ser vî bajarî Kurdan sûdek ji wê dewlemendiya wê wernegirtin. Li Başûrê Kurdistanê gelek şoreş ji ber Kerkûkê negihiştin armanca xwe û bi ser neketin.

Efsûniya Kerkûkê

Petrol ku weke 'zêrê reş' tê binavkirin, ji bo dahata welatên herêmê û taybet jî dewletên OPECê xwedî cihekî girîng e. Petrol efsûniyeke Kerkûkê ye jî. Ji ber ku xwedî ji sedî 40ê petrola Îraqê û ji sedî 70 yê gaza wî welatî ye. Li gor daneyên berdest xwedî 10 milyar dolar rezerva petrolê ye. Piraniya Kerkûkê ji Kurdan pêk tê. Tirkmen jî li vî bajarî hene. Keldanî, Asûrî, Suryanî jî li Kerkûkê dijîn. Jibilî van Erebên Sunne ku ji derve anîne û Erebên Şîe jî hene. Van pêkhateyan li bajêr pêkvejiyanek ava kirine û her yek li gorî xwe, xwe weke xwediyê bajêr dibîne.

Ji bo Kerkûkê hilweşandina rejîma Sedam di 2003an de qonaxeke girîng bû. Piştî vê yekê Kerkûk hêdî hêdî ket bin hikûmraniya Kurdan û piştî êrişên DAIŞê yên li ser Kerkûk û Mûsilê, Herêma Kurdistanê ji bo vî bajarî gavên girîng avêtin.

Dagirkirina Kerkûk û deverên din ên Kurdistanî ku li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê ne, ji aliyê Malîkî û Ebadî ve bi pêşengiya Îranê, ev heyameke dirêj e hatibû plankirin. Lêbelê piştî ku Herêma Kurdistanê referandûma serxwebûnê pêk anî, wan Îran qanih kir û plana xwe bi destê Heşdî Şabî pêk anîn.

Di medya Îranî de meseleya Kerkûkê

Kerkûk ji ber petrol û dewlemendiya xwe her tim di armanca Îranê de bû. Herwiha bi awayekî mezhebî û îdelojîk jî dixwaze destê xwe têxe nav vî bajarî. Îran ji bo ku bigihije van armancên xwe riyên rast bikar nayîne. Li her derê dixwaze hikûmraniya mezheba Şîe bisepîne.

Plan û xeyalên Îranê yên ji bo Ereb û Tirkmenên Şîe yên li Kerkûkê jî hebûn. Ev 14 sal in bi destê milên Şîe xwe nêzikî van herdu pêkhatiyên li Xurmatû deverên din kir û plana xwe pêkanî. Di vê proseyê de Qasim Suleymanî çi siyasî û çi leşkerî roleke girîng lîst.

Ji ber van sedeman medya Îranî û bi taybet jî medya ser bi Pasdaran ve li gor van armancan di nav hewldanên karîgeriya li ser welatên derdor û deverên din de ye. Jixwe di çarçoveya siyaseta Komara 'Îslamî' ya Îranê de kar dikin. Ajansên bi navên 'Fars News, Tesnîm, Mîhr, Tabnak, Sepah News' bi zimanên Kurdî û Erebî jî weşanê dikin û li ser meseleyên li Îraq, Sûriye, Herêma Kurdistanê û taybet jî Şîeyên li Îraq û Kerkûkê raportan belav dikin.

Kerkûk û medyaya asayîşî ya Îranî

Medya Supaya pasdaran li ser welatên derdor û nemaze jî li ser Îraq û Kurdistanê gelek bi baldarî, bi bername û plansaziyeke rêkûpêk xebatan dike. Ev dezgehên medyayî bi yek peyvê jî qala hebûna Pasdaran a li Kerkûk û Îraqê nakin. Armancên xwe bi riya rêxistinên mîna Heşda Şeibî tînin ziman. Ji ber ku 60 rêxistin û saziyên rêxistina Heşda Şeibî bi awayekî yekser girêdayî Îranê ne. Ji 1983an heta 2015an ev rêxistin hatine avakirin û hemû jî di bin kontrola Îranê de ne. Bi navê Îraqê dixwazin armancên xwe pêk bînin. Armanca wan birêxistina Tirkmenên li Xurmantû di bin navê Heşda Şeibî de ew bû ku pêkvejiyana di navbera pêkhateyên li herêmê têk bibin û Kurdan asteng bikin ku bigihijîn mafên xwe yên xwezayî.

Dema ku mijara referandûmê ket rojevê û taybet jî pêkanîna wê li Kerkûkê Îran xiste nav tirseke mezin. Îran piştî şaşiya DYAyê ya vekişandina leşkerên xwe ji Îraqê û bi hinceta DAIŞê li Îraqê xwe bicih kir û karîgeriya xwe ya li vî bajarî zêde kir.

Armancên Îranê yên li Îraqê

Du armancên Îranê li Îraqê hene; Yek, avakirina bendekê ku şer û aloziyan ji Îranê dûr bixe û a din jî rakirin û kişkirina Îraqê li hemberî Herêma Kurdistanê ye. Ji ber ku Herêma Kurdistanê daxwaza aştî û tayînkirina çarenivîsa xwe dike. Îran vê yekê bo xwe weke xeteke sor û meseleyeke ewlekariyê dibîne.

Di rastiyê de Îraq bêhêz e, xwedî gelek kêşeyan e û bêîstîqrar e. Bi serê xwe nikare kêşeyên xwe çareser bike û xak û serweriya xwe biparêze. Îran li ser navê Îraqê bi van mijaran re mijûl dibe. Ji ber ku demokrasî û mafên diyarkirina çarenivîsê ji bo xwe weke metirsî dibîne ku xwedî gelek pêkhateyan e.

Tevî civaka navdewletî jî hebûna Îranê li Îraqê bi awayên siyasî û leşkerî gelek zelal tê dîtin. Her roj di derbarê tevgerên Pasdaran ên li Îraq, Sûriye û Yemenê gelek raport di dezgehên navdewletî de belav dibin.

Radestkirina Kerkûkê û Îran

Roja 25ê Îlona 2017an ji bo Kurdan gelek girîng e ku vê rojê referandûm pêk hat û Kurdan daxwaza cudabûnê ji Îraqê kirin. Di heyama 4 mehên derbasbûyî de medya nivîskî dîtbarî ya Îranê, dezgehên Îranî yên li Ewropa û Amerîkayê ku xwe weke mûxalîfên rejîma Îranê pênase dikin, van hemû dezgehan bi yek dengî dijayetiya referandûma serxwebûnê kirin. Ev weke metirsiyeke mezin li ser yekparçeyiya welatên cîran û taybet jî Îran û Îraqê dîtin.

Di raportên xwe de bi berdewamî li ser êrişkirina ser Kurdistanê ji aliyê Îranê bi hevkariya Îraq û Tirkiyê sekinîn û bi vî awayî bi sedan raport belav kirin. Ev hemû nîşanên wê yekê ne ku Îran li piştdagirkirina Kerkûkê û deverên din ên Kurdistanê ye. Îspata vê yekê daxuyaniyên berpirsên Kurd, Îranî û Îraqî û çavdêrên navdewtî ne. Dokûment û raportên berdest nîşan didin ku dagirkirin û êrişên li ser Kerkûk û deverên din ên Kurdistanê bi pêşengiya Qasim Suleymanî pêk hatine.

Ji bo Kurdên Rojhilat girîngiya Kerkûkê

Hinek taybetmendiyên Kerkûkê hene ji Kurdên Rojhilatê Kurdistanê. Kerkûk bi erdnigarî demografî, siyasî, aborî û çanda xwe nêzikî Kirmanşanê ye. Gelek caran ev herdu bajar weke xwîşkên hev hatin binavkirin. Kirmanşan jî bi aboriya xwe bajarekî mezin e û hinek bîrên petrolê lê hene. Jibilî petrolê pîşesazî û cotkariya bajêr jî bi pêş ketiye. Di warên cuda de gelek kargeh hene. Lê dahata van kargeha diçe bo Îranê. Ji ber wê yekê Kirmanşa jî weke Kerkûkê hatiye dagirkirin û di bin lingên dijmin de ye.

Kirmanşan weke Kerkûkê xwedî gelek pêkhateyan e. Mezheb û olên weke; Sunne, Şîe, Kakeyî, Ehlî Heq û Yaresan hene. Ji sedî 95ê xelkê bajêr bi zaraveyên weke Kurmancî, Soranî, Cafî, Hewramî, Kelhurî, Lekî û Feylî bi Kurdî diaxivin. Xwedî çand û dîrokeke kevnare ye. Kirmanşan û Îlam bi van taybetmendiyên xwe dişibin dilê Başûrê Kurdistanê Kerkûkê. Ji ber van sedeman têkiliya di navbera xelkê Kurdistana Rojhilat û Başûr de dîrokî ye. Di şahî û şînan de li gel Başûrê Kurdistanê bûne.

Di prosesa bo referandûmê de di nav Kurdên Rojhilatê Kurdoistanê de jî liv û tevgerek hebû û çalakî dihatin pêkanîn. Ji bo piştgiriya referandûmê bi dehan çalakî hatin lidarxistin. Piştî ku referandûm bi serkeftî derbas bû gelek pîrozbahî û şahî jî hatin kirin. Îran bi vê yekê ket nava tirsekê û li seranserê Rojhilatê Kurdistanê zêdetirî 700 ciwanên Kurd desteser kirin.

Piştî ku Kerkûk ji aliyê Îraq û Îranê ve hat dagirkirin li seranserê Rojhilat rewşeke şînê serdest bû û piştevaniya xwe bi riyên cuda anîn ziman. Civak û partiyên Rojhilat bi hemû hebûna xwe li gel Başûrê Kurdistanê bûn.

Girtina deriyan zirareke mezin gihand Îranê

Li gor raporên ku li Îranê belav dibin û daneyên aborî, Girîngiya Herêma Kurdistanê ji bo Îranê di raport û daneyên aborî yên wî welatî de bi awayekî berbiçav xuya dibin. Îranê beriya niha deriyên sînorî yên Perwêzxan, Başmax ve Hacî Omeran girtin. Ev yek bû sedem ku li bajarên sînor ên Kurdistana Rojhilat rêjeya bêkariyê zêde bibe û vê yekê jî zirareke mezin da aborî û bazirganiya Îranê. Îranê deriyên sînorî yên bi Herêma Kurdistanê re vekirin lêbelê girtina deriyan derbeke mezin li aboriya Îranê da û qeyrana aborî ya li wî welatî kûrtir kir.

"Di qada aborî û hilberînê de qeyran çêbû"

Bajarê Îsfehan li Îranê wek bajarê mezin ê pîşesaziyê tên dîtin. Berpirsiyarê Odeya Bazirganî û Pîşesaziya Îsfehanê daxuyaninek da çapemeniya welatê xwe, "Îsfehan wek paytexta geştûguzara Îranê tê dîtin. Dîsa berhemên vî bajarî bo Herêma Kurdistanê tên îxrackirin. Lêbelê ji ber ku Îranê sînor girtin di sektora aborî û hilberînê de qeyran çêbû. Bi dehan xebatên navendên hilberînê sekinîn û bi dehan kes bê kar man. 500 şîrketên Îranê yên piçûk an mezin ku li Herêma Kurdistanê kar dikirin bêkar man. Ev yek nehat çareserkirin û bi taybet jî di sektora îxracaatê ya Îranê de.

"Qeyrana aborî kûrtir bû"

Serokê Odeya Bazirganî ya Hevbeş a Îran – Îraqê Hemid Huseynî jî li ser vê mijarê wiha diaxive, "Me berê hîşyarî dabû û gotibû girtina deriyên di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê dê bandoreke neyînî pêk bîne. Me daxwaz ji Meclîsa Ewlehiyê ya Neteweyî ya welêt kir ku bila wek Îraqê tevnegerin. Ji ber ku berjewendiyên aborî yên Îranê girîng in. Qeyrana aborî wiha hê kûrtir dibe."

"Ji sedî 70ê berheman bi riya Kurdistanê derbadî Îraqê dibin"

Li gor pisporên aborî, zirara mezin a aborî ya vê biryara sîyasî zêde ye û ev zirar dê neyê çareserkirin. Ji ber ku li gor daneyên Îranê, Iraq wek welatê yekemîn a ku berhemên Îranê bikar tîne tê qebûlkirin û îxracata Îranê ya bi rêjeya ji sisiyan yek li gel Îraqê tê kirin. Ev hatinûçûyîn jî bi riya Herêma Kurdistanê pêk tê. Ji sedî 70ê berhemên Îranê bi riya deriyên sînorî yên li gel Herêma Kurdistanê derbasî Îraqê dibin.

Li gor gotina Serokê Odeya Bazirganî ya Hevbeş a Îraq û Îranê, di navbera Îran û Îraqê de dahata bazirganî ya mehekê 600 mîlyon dolar e. Lêbelê girtina deriyên sînor zirareke mezin da Îranê. Herî zêde bi Tirkiyeyê re bazirganî tê kirin. Ji ber vê Tirkiye deriyên xwe ji Herêma Kurdistanê re negirt.

Li gor axaftina Huseynî, piştî ku ji Wezareta Veguhestinê biryara ku wê sotemenî nebin Herêma Kurdistanê hat dayîn, 500 tanker neft li ber sînor hat rawestandin.

Bi qasî 3 mîlyar 277 mîlyon dolar berhem hatin şandin



Li gor agahiyên çavkaniyên Îranî, Îranê di 6 mehên borî de bi qasî 3 mîlyar 277 mîlyon dolar berhem şandine Herêma Kurdistanê. Ev mehane dike 546 mîlyon dolar.

Gerînendeyê Gumrikê yê Bajarê Kirmanşanê diyar dike ku beriya ku Îran sînoran bigire ji sînorên vî bajarî di nav 6 mehan de berhemên ku ji Îraqê bo Îranê hatine şandin nêzikî ji sedî 200 zêde bûye. Piraniya berheman jî li ser deriyê Perwêzxanê ji Îranê re hatine şandin.

Îxracat û îthalata Îranê di ser Kurdistanê re pêk tê

Li gor rapora ku malpera Îsna weşandiye Gerînendeyê Gumrikê yê Bajarê Kirmanşanê Xelîl Heyderî wiha dibêje, "Hemû berhem ji Îranê re li ser sînorên Perwêzxan, Şoşmê, Sazan, Şêx Sile yên li Kirmanşanê ku sînorên wan bi Herêma Kurdistanê re hene tên şandin. Qîmeta berhemên 6 mehên ewil 21 mîlyon 701 hezar 902 dolar e. Li gor sala borî ji sedî 194 zêde bûye. Ev berhem ji 13 welatan li ser sînorên Herêma Kurdistanê û Kirmanşanê ji Îranê re hatine şandin. Li gor 6 mehên ewil, ji nava welatên ku ev berhem şandine Îraq bi 9 mîlyon dolar 329 hezar 664 dolaran yekemîn e. Piştre Tirkiye û Almanya tên.



KADİR KARAGÖZ

Girîngiya referandûmê

Di 25ê Îlona îsal de referandumek pêk hat, ev ji bo gelên rojhilata navîn tiştekî pir ecêb bû. Jixwe giş ecêbmayî bûbûn. Ev erdnîgarî gelek caran bûye şahîd ku ji bo sînorê hewşeke bîçuk deh mêrên qerase hatine kûştin an ji bo li hevkirina qelenê kevnejinekê pir xortên ciwan hatine binax kirin, dê çawa hidudê dewletekê ji hev derê û bê xwîn? Kê dikarî bû xwe têxe tora van wehşîyan û teklîfa referandum ê li van nezanan bike? Yekî bi gaveke mezin xwe da peşî û got: "Ez, lawê Mele Mistefayê Nemir, Mesût, ê ku ji şer û herban westîyayî, şopînerê xeyal a çardesaliya xwe" Bi rastî bi werêkbûnêke mezin derket meydanê, lê gelek Kurdên kêmxîret û kêmaqil got: "Barzanî nikare, bilûfan dike" Piştî kû Kak Mesut got: "Min ew kese nîm xwe şermezar î miletê xwe bekem" û referandum pêk anî, vê carê jî ew tirsonek û dilnexwazên derdora wî gotin: "Dewleta netewî ne baş e, zilm e û xefik e". Ev mijara dewletbûnê pir dirêj e meqaleyeke misteqîl je re divê, ez dixwazim li ser mijara referandûmê hûr bibim.

Ew kesên heta roja dawî jî pişta Barzanî negirtin bêyî dile xwe, bi serê lêvan piştgiriya xwe ya referandûmê beyan kirin. Bi rastî gel xwe li dora Barzanî kire xelek û ji sindoqa referandumê %92 'ERÊ' derxist. Hikûmeta Îraqê jî dest bi gefan kiribû, bi rastî piştî rudana teslîmkirina Silêmaniyê gelek pirs hatin dilê min; gelo ev dewleta Îraqê ya ji hevdeketî û Îbadiyê kêmkalîbre dema gef li Kurdan dixwarin bi hêzên Kurdan ên xwefiroş ewle bûn? Gelo berê haya wan ji hev hebûn?

Bi min serkeftîbûna Barzanî ne tenê bextreşên Bexdayê têk bir her wuha evîndarên Bexdayê yên Kurd jî binpê kir. Gelê xwe yên ku her yekê berê wan li qubleyeke cuda li ser xeta serxwebûnê rêz kir. Tenê ev yekrêzkirina gel bes e ji Barzanî re ku weke Şergele bête bi nav kirin. Çi helbest e te nivîsiye Arjen Arî? Xwezî ev helbest min binivîsa;

Şêrgele hebûn; koçek Koçgirî
Şêrgele hebûn li hembêza Agrî
Şêrgele hebûn bi nav Îhsan Nûrî
Şîmal bi şîmal Barzan bi xwe bûn!

Barzanî weke her sîyasetmedar û rewşenbîrên modern qîymeta referandumê zanî bû, û haya wî jê hebû ku li cîhana îro encamnameya referanduma tapoya dewletê ye. Gelî dostan Barzanî bi pêkanîna referandumê bizirê serxwebunê çand axê û av da, yên ku mêr in bila tevrik bikin, gubre bikin av bidin dara serxwebunê mezintir bikin. Edî şîrovê û rexnekirinên neyînî dilê mirov dixelînin, şerm e, gel êdî dibîne hûn Barzanî tenê dihêlin, wî dieciqînin, eciqandina wî erê dikin, keviran dixin rêya wî, ne bes hûn dikevin peşiya wî ji bo pêle we neke disekine îja hûn dibêjin: "Binihêrin Barzanî paş ve gav avêt" Vê jî ji min bizanin Barzanî ne ji dek û dolabên Farisan an ji erîşên ereban ditirse, mixabin ji tekrara rû reşîya tarîxa îxanet û birakujîyê bi fikar e. Sebebê hêdî çûna Barzanî jî hûn in sekna wî jî, ez behsa paş de gavavêtinê nakim, tiştekî wusa tune, Barzanî paş de gav neavêtî ye tenê sekiniye bo ku xwîn nerije.

Qenata min ev e; ev şer, xirexir, xirecir teqereq û êrîş giş ji bo referandum û encamên wê bifetisînin û bandora wê pûç bikin têne kirin. Divê şer û xirecir referandumê nedin ji bîr kirin. Rêya herî mirovî û demoktarîk ev e, hêvî dikim ji zana û bîrewerên me referandumê her bînin ziman nedin ji bîr kirin.

Partiyên Rojava:

Çarenivîsa Başûr û Rojava bi hev ve girêdayî ye

■ GÊNCO XELÎL



Hêzên Îraqê û rêxistina Heşda Şeibî 16ê Cotmehê êrîşî Kerkûkê û deverên Kurdistanî yên dîtir ên yên ku di navbera herêma Kurdistanê û Bexdayê de weke deverên 'nakok' tên dîtin kirin. Beriya êrişî bi rêkeftineke di navbera baskekî YNKê û berpirsên Îraqî û Heşda Şeibî de Kerkûk û ew deverên din ji aliyê Artêşa Îraqê û milîsên girêdayî Îranî ve hatin dagirkirin. Dagirkirina deverên Kurdistanî û bi taybetî bajarê Kerkûkê, ji aliyê Bexda û milîsên girêdayî Îranê ve, hevsengiyên li herêmê leqand.

Rewş, rûdan û nakokiyên di navbera aliyên siyasî li Herêma Kurdistanê bi awayekî yekser karîgeriyê li ser Rojavayê Kurdistanê jî dike û lewma çav û guhên partiyên Kurd ên Rojavayê Kurdistanê li Herêma Kurdistanê ye. Partiyên Kurdî yên li Rojavayê Kurdistanê jî li ser geşedanên dawîn û êrişên li ser Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivîn.

"Dorpêç û êriş tu encamê nadin"

Serokê Hevbendiya Niştimaniya Kurd Mustefa Meşayêx êrîş û dagirkirina hikûmeta Bexdayê bi hevkariya Heşda Şeibî û pasdarên Îranê yên li ser Herêma Kurdistanê şermezar kir. Meşayêx dibîne ku derfet hebû ku nakokî bi riyên aştiyane û diyalogê çareser bibûna, ji ber ku siyaseta sepandina rewşa heyî ya birçîkirin, dorpêçkirin û xwînê nikare ti encaman bîne û bi xwe re dê bingehekê ji dijmantiyê di navbera pêkhateyên li herêmê ava bike.

"Rewşa heyî rê li ber hêzên tarî vedike"

Meşayêx li ser dagirkirina Kerkûkê, êrişên li ser Kurdistanê da diyarkirin ku geşedanên ku rû didin wê rewşeke nearamî û serberdatiyê bi xwe re bîne û dê rê li ber hêzên tarî veke ku destêwerdanê bikin. Mistefa Meşayê di dawiya axaftina xwe de dibêje ji bo ku aramî û aştî li herêmê serdest be divê ew dewlet û miletên ku li gel Kurdan dijîn mafên Kurdan nas bikin.

> "Serkeftina doza miletê Kurd li Herêma Kurdistanê serkeftina doza Kurd li Rojavayê Kurdistanê ye loma divê Kurd hemû piştgiriya Herêma Kurdistanê bikin."

"Yekrêziya xwe xurt bikin"

Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd jî li ser rewş û geşedanên li Herêma Kurdistanê daxuyaniyek belav kir. Partiya Pêşverû berpirsiyariya bicîneanîna rêzikên destûra Îraqê xiste stûyê hikûmeta Îraqê ji ber ku pêgirî bi cîbicîkirinê nekiriye û îradeya rastgo ji bo çareserkirina nakokiyan li gel wê tune bûye. Partiya Pêşverû ku nêzikî Yekitiya Niştimanî ye, berpirsiyariya rewşa Herêma Kurdistanê ya dawî û nexasim piştî bûyerên Kerkûkê xist stûyê serkirdayetiya partiyên Kurdistanî çima ku bangewaziyên navdewletî ji bo paşxistina referendûmê, red kirine.

Partiya Pêşverû di daxuyaniya xwe de bang li partî û aliyên Kurdistanê dike ku berê xwe bidin dirûstkirina yekrêzî û diyaloga navxweyî ku bikarin astengî û metirsiyên li ser miletê Kurd jinav bibin. Herwiha banga diyalogê di navbera Bexda û Hewlêrê de kir.

"Bûyerên Kerkûkê dê rê vekin ku rojava li hesabên xwe vegerin.

Sekreterê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, Nesredîn Îbrahîm di derbarê dagirkirina Kerkûkê û êrişên li ser Herêma Kurdistanê de diyar dike ku bûyerên dawîn ên li ser Kerkûk û deverên din ên Kurdistanî di encama hevkariyeke yekser de di navbera dezgehên ewlehiyê yên Tirkiye, Îran û Îraqê de hat û armanca wan ew bû ku hêzên Îraqê li gel milîsên Heşda Şeibî operasyoneke leşkerî li dijî Herêma Kurdistanê pêk bînin.

"Sîstema federalî bi serneket"

Li gor Nesredîn Îbrahîm, ev alî dixwazin hêviyên Kurdan ên rewa bi standina biryara dîrokî ya pêkanîna referendûma serxwebûna Kurdistanê bi dawî bînin. Îbrahîm teqez dike ku hemû hikûmetên Îraqê di avakirina heyama pêkvejiyana aştiyane di navbera pêkhateyên Îraqê de û di çarçoveya sîstema federalî de bi ser neketine, herwiha wan hikûmetan herdem xwe ji cîbicîkirina madeya 140î û bendên dîtir ji destûra Îraqê dane alî û bicîneanîne.

"Rewşa Kurdistanê bandorê li Rojava dike"

Li ser bandora bûyerên dawî yên li Herêma Kurdistanê diqewimin, sekereterê PDKSê Nesredîn Îbrahîm di wê baweriyê de ye ku ev bûyer û pêşketinên metirsîdar bêguman wê bandorê li Rojava jî bikin û dibîne ku divê aliyên siyasî li Rojava li hesabên xwe yên Kurdî di bin siya hevbendiyên Kurdî, herêmî û navdewletî de, vegerin. Nesredîn pêwîst dibîne ku hêzên Kurdî biryarên siyasî yên wêrek bistînin da ku yekrêzî û yekhelwesta xwe xurt bikin.

"Divê taybetmendiya her parçeyekî li ber çavan bê girtin"

Sekreterê PDKSê di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, tê xwestin ku hêzên siyasî ji nav rêzên çarçew û hevbendiyên ku di bin siya ajondeyên herêmî yên regezperest û li dijî mafên Kurdan vekişin. Herwiha Nesredîn pêdivî pê dibîne ku yekrêziya Kurd li Rojava û tevaya Kurdistanê were ristin û nexşerêyeke netewî ji bo lidarxistina kongreya netewî ya Kurdistanê were danîn û taybetmendiya her parçeyekî Kurdistanê were berçavkirin.

"Îran dixwaze xwe bigihîne Derya Spî"

Endamê Emîndariya Giştî ya ENKSê û serkirdeyê Şepêla Pêşerojê ya Kurd, Fadî Merî bîr û biçûnên xwe di derbarê pêşketinên dawî li Herêma Kurdistanê tine ziman û radigihîne ku pilana Îran û Hikûmeta Ebadî bi riya êrîşên milîsên Şîe re ew e ku di ser xaka Başûr re xwe bigihînin Behra Spî û ev yek dûrûdirêj û ne hêsan e.

"Divê her Kurd piştevaniya Herêma Kurdistanê bike"

Birêz Fadî dibêje hêzên Îraqî referandomê weke hincet li dijî Kurdan bikar tînin, lê armanca wan a sereke bidawîkirina doza Kurdan e û li ser armancên hikûmetên dewletên Kurdistan dagir kirine, ji ber ku ew dewlet ji doza miletê Kurd ditirsin û dizanin wê bigihije nav wan jî. Fadî Meriî di dawiya axaftina xwe de dibêje;

"Serkeftina doza miletê Kurd li Herêma Kurdistanê serkeftina doza Kurd li Rojavayê Kurdistanê ye loma divê Kurd hemû piştgiriya Herêma Kurdistanê bikin."

Li Rojava; Roja helbesta Kurdî û êşa Kerkûkê...



Di bin siya bûyerên bi êş ên ku li herêma Kurdistanê diqewimin de û bi taybetî dagîrkirina dilê Kurdistanê, Kerkûkê ji aliyê artêşa Îraqê û Heşda Şeibî ve, herwiha di bin siya dorpêça li herêma Efrînê û gefûgurên Tirkiyê li dijî wê di 22ê Cotmehê de, Roja Helbesta Kurdî li şanogeha şehîd Rûken a li navenda bajarê Efrînê hat li dar xistin.

Ev çalakî bi hevkariya Komîta Roja Helbesta Kurdî û Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Efrînê di bin navnîşana helbest çîkdana azadiyê ye, hate birêvebirin. Di vê çalakiyê de 15 helbestvanên Kurd bi peyv û xeyalên xwe, hizr û bîra bi dehan ji evîndarên helbest û zimanê Kurdî li ezmanên helbestiyê gerandin.

Birîna Kerkûkê...

Dagirkirina bajarê Kerkûkê, birînek kûr di wijdana gelê Kurd de çêkir, ji ber remziyeta wî bajarî di xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd ê qonaxa bihûrî û hemdemî de û nemaze li gel helbestvanên Kurd, lewma piraniya helbestan di gola êşa bajarê Kerkûkê de avjenî kirin.

Helbestvan û Nivîskar Merwan Berekat di wê baweriyê de ye ku helbest weke rengên din ên wêjeyê bi bûyeran re dimeşe û tevî wê jî dibe.

Berekat bi helbesta xwe ya bi navê, 'Dildara Pakrewanan' beşdarî roja helbestê bû û tê de li ser êşa dilê xwe ji bo dagirkirina bajarê Kerkûkê anî ziman û tiliyên xwe jî ber bi sedemên ketina wê kirin.

"Kerkûk quble û Qudsa Kurdistanê ye"

> Dagirkirina bajarê Kerkûkê, birînek kûr di wijdana gelê Kurd de çêkir, ji ber remziyeta wî bajarî di xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd qonaxa bihûrî û hemdemî de û nemaze li gel helbestvanên Kurd, lewma piraniya helbestan di gola êşa bajarê Kerkûkê de avjenî kirin.

Dagirkirina bajarê Kerkûkê bû mijara Helbestvanê ciwan Selam Hisên jî. Hisên ji Basê re axivî û got: Ji ber em Kurd Kerkûkê weke dilê welatê xwe dibînin, qible û Qudsa me ye, di rojekê de ji me hate dizîn, bi êş bû ketina Kerkûkê ne tenê ku kete destê dijmin lê ji ber ku destê hinek rayedarên Kurd jî di vê şikestinê de hebû, vê yekê hîşt ku birîna hestên me vebin û helbesta min li ser Kerkûkê be.

Selam di helbesta xwe de dibêje:

Xwezî rondikên me bibin lehî û ji binî ve Erşa we biqelêşe!

Xwezî li pey me baran nebare û ne jî deriyên biharan vebin!

Xwezî erdhejek me daqurtîne û te jî bi me re Kerkûk!.

Ma ne mirina evîndaran bi hev re ye?

Dîrok kayîkê dike !

Helbestvan Osman Îso, ji heyamên heyî dûr neket û pêwîst dît ku di helbesta xwe de li dîroka Kurdan a berê vegere da îbretan jê werbigirin. Ji ber ku li gor wî, dîroka Kurdan kayîkê dike, leheng û mêrxaz û egîd xaka pîroz rizgar dikin û kurmê dêr û arpak winda dikin û benîştê perçebûnê herdem tê cûtin. Osman Îso dixwaze bi riya helbesta xwe, peyamekê bigihîne hemû sazî, rêxistin, partî û rewşenbîran ku hemû ji berjewendiyên kesayetî û partîtî û nêrînên teng dûr bikevin.

Helbestvan Îso di helbesta xwe de, Ehmedê Xanî , Şêx Se'îd, Apê Osman Sebrî û Cegerxwîn tîne ziman û şoreş û hewildanên wan ji bo rizgariya gelê Kurd bi riya xewna lehengê xwe Kardox re anî bîra beşdarên Roja helbesta Kurdî.

Kî hat xelatkirin?

Wek girdişeke salane di roja Helbesta Kurdî de komîteya amadekar helbestvanekî ku keda xwe ji bo nivîsandina helbestê daye, xelat dike.

Di dawiya roja helbestê ya îsal de, komîteya amadekar a roja helbesta Kurdî li herêma Efrînê helbestvan û nivîskarê Kurd Nîdal Yûsêf xelat kir.

Nîdal Yûsêf di sala 1972an li gundê Çeqelê Cûmê yê navçeya Şiyê, ji dayîk bûye. Heya niha xwediyê çar berhevokên helbestî yên çapkirî ye û herwiha du pirtûkên din di warên ferheng û kelepûra Efrînê de dane çapkirin.

Yekem car 1993an hat lidarxistin

Tê zanîn di sala 1993an de cara yekê bû ku rojek ji bo Helbesta Kurdî hatiye terxandin, ango wê demê komek ji helbestvan û nivîskarên Kurd ên Rojava ku nav li xwe kirin 'Komîta Roja Helbesta Kurdî' dîtin ku roja koçkirina helbestavanê gewre Cegerxwîn bikin roja helbestê û ji wê demê de, salane festîval bi vê boneyê tên lidarxistin.

Yekemîn festîval di 22ê Cotmeha 1993an de li keleha Nebî Horî li devera Efrînê hate li darxistin lê nivîskar ji hemî deverên Kurdî ên Rojava beşdar dibûn. Lê di dema îro de ji ber qutbûna riyan û metirsiyên ewlehî, her deverek bi rewş û serê xwe vê rojê pîroz dikin.

Hejmareke zêde ya helbestvanan beşdar bûn

Helbestvanên ku beşdarî çalakiyê bûne: Arif Tislorî, Hêvîn Hiso, Selam Hisên, Dêrsim Memo, Mîdiya Berekat, Mecîd Şêxo, Merwa Birîm, Mofîde Koto, Merwan Berekat, Osman Îso, Selah Yûsêf, Temoz Şemalî, Ûsama Ehmed, Hikmet Hisko û Ekrem Mistefa. Mecîd Şêxo û Temûz Şemalî ji ber sedemên taybet, nikarîn beşdar bibin.

HSD li Dêrazorê pêş de diçe

Li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê hevsengiyên siyasî û leşkerî li gor geşedan û li qadê her tim digûherin. Piştî bajarê 'Reqa'yê ku rêxistina DAIŞê weke 'paytext'a xwe didît, ji aliyê HSDê ve hat kontrolkirin, çavê herkesî vegeriya bajarê Dêrezorê ku bûye girêkeke nû li deverê. Dêrazor devereke stratejîk e ku bi hebûna petrolê derdikeve pêş û niha rejîma Sûriyê bi piştevaniya Rûsyayê, şervanên HSDê jî bi piştevaniya DYAyê berê xwe dane wî bajarî û hêzên herêmê û cîhanî stratejiyên xwe jî li gor rûdanên li ser erdî ji nû ve pêk tînin.

Metirsiya Heşda Şeibî li ser herêmê heye

Hêzên Sûriya Demokratîk ku YPG pêşengiya wê dike û Encûmena Leşkerî ya Dêrezorê 9ê Îlonê pêngava bi navê Bahoza Feratê da destpêkirin ji bo ku parêzgeha Dêrezorê li rojhilatê Sûriyê ji nav destên rêxistina DAIŞê derxînin û heftiya borî mezintirîn bîra neftê ji aliyê HSDê ve hat kontrolkirin. Li gor fermandarekî HSDê ev şer li ser daxwaza xelkên wê parêzgehê tê birêvebirin ji ber ku ew bajar di bin metirsiya milîsên Şîe, Heşda Şeibî de ye.

Gelek zeviyên neft û gazê hatin kontrolkirin

Bêtirî meh û nîvekê şervanên HSDê li nav sînorên wê parêzgehê pêş de diçin û gelek bajarok, zevî û gund rizgar kirine û herwiha pêwîstirîn zevîgehên neft û gaze control kirine, mîna zevîgeha Konîko ya gazê û zevîgeha El-Umer a neftê.

Pêngava Bahoza Feratê ji bakur û bakur-rojhilatê Dêrezorê ve dest pê kir, tevî mayîn, maşîneyên bombebarkirî û xwekujan, şervanên HSDê gihîştin bajarê Sûrê, ango ev bajar ji bo DAIŞê cîgehekî stratejîk û navenda baziganiyê bû û ji wî alî ve çekdarên xwe tanîn û li gundewarê Dêrezorê yê bakur belav dikirin.

DAIŞ hatiye dorpêçkirin

Piştî standina zevîgeha El-Umer, rêxistina DAIŞê di nevbera çend gundên li bakur-rojhilatê bajarê Meyadînê û dever û bajarokên Şihêl û Sûr û Bûizedîn de dorpêçkirî ye û ti rê li ber nemane li gor ku Ebû Erac fermandarê leşkerî yê HSDê dibêje.

Piraniya bîrên Neftê li rojhilat û bakur-rojhilatê Sûriyê ne

Tê zanîn ku ji aliyên yadeka neftê de Sûriyê ne ewqas welatekî pêwîst e ji koma giştî ya neftê li Sûriyê du milyar Bermîl derbas nake û berhema welêt ji neftê di sala 2010an de tenê 400 hezar bermîl bû, jê 250 hezar li hundir dihat xerckirin.

Piraniya bîrên Neftê li rojhilat û bakur-rojhilatê sûriyê ne û bi taybetî li parêzgehên Hesekê, Dêrezor û Humsê û niha ew bîr hinek di destê rêjîma Sûriyê de ne û yên din di dest HSDê de û hêj di destê rêxistina DAIŞê de ne.

Nakokî di navbera rejîm û Rûsyayê de derket

Li gor ku Ebû Erac dibêje, hêzên rêjîmê tenê bi qasî 5 km ji Bîra El-Umer dûr bûn û gava HSD ew cîgeh bi dest xist, pirsgirêk di navbera rêjîma Sûriyê û Rûsan de çê bûn û niha jî rejîm hewil dide ku bi hemû riyan vegerîne lê Ebû Erac teqez dike ku ew dest jê bernadin ji ber ku bi xwînê hatiye rizgarkirin û radest nakin ku heger nekeve xizmeta giştî ya miletê Sûriyê.

HSD venakişe

Ebû Erac teqez dike ku rêjîma Sûriyê hewil dide deverên rizgarkirî ji aliyê HSDê ve bistîne lê HSD razî nabe ku ji wan deveran vekişe û radestî rêjîmê bike.

Li gor amajepêkirina Ebû Erac, rêjîma sûrî rê li ber DAIŞê xweş dike ku êrîşan bibe ser xalên kontrola HSDê û bi wan re alîkariyê dike û hin caran bi hewan û topan xalên HSDê topbaran dike da ku rêxistina DAIŞê pêş ve biçe.

Mezintirîn zevîgeha neftê; El-Umer

Zevîgeha El-Umer a neftê di 22 vê mehê de li ser destên şervanên HSDê hate rizgarkirin, tê zanîn ku sêyeka berhema nefta Sûriyê ji vê zevîgehê derdikeve û yek ji mezintirîn bîrên neftê li Sûriyê ye, ji wê bîrê rojane sed hezar bermîl neft tê derxistin.



Ema – Ye Nazdik (Close up), Abbas Kiyarûstemî

MARÎA AYAZ





Heger mafê mirovan ji bo hilbijartina pêxemberê wan heba bêgûman min ê ji xwe re Abbas Kiyarûstemî hilbijarta. Dîmenên wî jî wê kitêba min a pîroz bûna.

Dibe ku min ev fîlmê Kiyarûstemî deh caran jî temaşe kiribe. Mîna helbesteke henûn bi dîmenên payizî hatiye hûnandin fîlm.

Walter Benjamin di teza xwe ya doktorayê de dibêje 'Divê rexneyên berhemekê ji hestan dûr bin, zanistî bin.' Lê ez bi ya wî nakim. Berhemeke ji hestan pêk hatî dê çawa karibe bê hest were qal kirin? Ez bixwe bê hest nikarim qala formuleke matematîkê jî bikim. Li cem hev runiştina hejmaran jî, bi min bûyereke hestiyarî xuya dikî.

Car caran di hundirê derewan de jî mirov dikare ji xwe re rastiyekê ava bike, xeyal bike. Lehengê fîlmê me Huseyîn Sabzîan jî kesek ji wan e. Di dilê xwe de, xwe dîrektor Muhsîn Mahmalbaf dihesibîne. Di otobusê de ji jina ku li kêleka wî runiştiyî re halo dibêje:

> Car caran di hundirê derewan de jî mirov dikare ji xwe re rastiyekê ava bike, xeyal bike. Lehengê fîlmê me Huseyîn Sabzîan jî kesek ji wan e. Di dilê xwe de, xwe dîrektor Muhsîn Mahmalbaf dihesibîne.

"Ez Muhsîn Mahmalbaf im"

Piştî vê derewê jiyana wî dikeve nava teşqeleyeke hem xweş û hem jî xerab. Bi saya vê derewê Abbas Kiyarûstemî û Muhsîn Mahmalbaf nas dikî.

Jina ku di otobusê de li cem wî runiştiye pir kêfxweş dibe û dixwaze Sabzîan (Mahmalbaf ê derewîn) bibe mala xwe û wî bi malbata xwe bide naskirin. Sabzîan xortekî pir feqîr e. Gava ku çav li malbata dewlemend dikeve, derewan bi ser hev dike. Ji wan re dibêje; 'Ez ê we bikim lîstikvan di fîlmê xwe yê nû de.'

Malbat bawer dike lê dîsa jî şikek diniqute dilê wan. Li gorî wan, divê derhênerekî evqas navdar û serkeftî tenezzûl neke ku pereyan ji wan bixwaze.

Malbat rojnamevanekî ji vê bûyerê haydar dike. Farazmand jî rojnamevanekî naskirî ye li Îranê. Jixwe fîlmê me nîv-dokumantar e. Rastî û kurgu di nava hev de ye. Hemû leheng kesayetên rasteqîn in. Piştî ku ev bûyer dibe nûçe, Abbas Kiyarûstemî pê dihese, kesan qanih dike û vê bûyerê ji serî de dike fîlm.

Sabzîan li dadgehê tê darizandin. Pir liberxweketî û şermok efûyê dixwazê ji hemû kesan. Sabzîan xortekî pir henûn e, ji bo hezkirina sînemayê ketiye nav rewşeke wilo xetere.

Dilê hemû kesî bi rewşa Sabzîan dişewite û wî efû dikin piştî mehek mehkumiya di girtîgehê de. Roja ku ji girtîgehê derdikeve, Muhsîn Mahmalbaf tê pêşiya wî. Wî bi motorê xwe dibe cem malbata ku derew ji wan re kiribû.

Ligel kulîlkên payizî diçin mala wan...

Ev fîlm, ji bo dîroka sînemayê ciyekî girîng digire. Bûyer rasteqîn e, leheng rasteqîn in. Di nava fîlmekî de rastiyek, di nava derewekê de rastiyek û çîroka fîlmekî heye. Fîlm di nava fîlm de... Jixwe Abbas Kiyarûstemî ev tarza sinema-verite pir bikartîne di gelek fîlmên xwe de. Kamera jî mîkrofon jî di dîmenan de derdikeve pêşiya me gelek caran.

Lêgerîna heqîqetê, di nava derewekê de derdikeve pêşiya me. Xortekî li dû xeyalekê, mirov dixe nava gelek ramanên kur. Ev bûyer gelekî bandorê li Abbas Kiyarûstemî dike. Ji bo Kiyarûstemî xeyalkirin ji dîtinê girîngtir e. Di sînematografiya xwe ya helbestî û felsefî de Kiyarûstemî, bûye rêber ji gelek xortên sînemahez re. Çîroka Sabzîan jî wilo...

Ji bo xwendekarên hişmend Raskolnîkov çibe, ji bo bînerên hişmend jî Sabzîan ew e. Sûcên ku bi dilekî û giyanekî pak bêhemd diqewimin, mirov sûcdar nakin gelek caran di çavên hinek kesan de. Ew kesên ku bi dilê xwe li tiştan dinêrin...

Jean-Luc Godard, ji bo Abbas Kiyarûstemî halo dibêje; Sînema bi Griffith dest pê dike, bi Kiyarûstemi bi dawî dibe...

Di dawiya fîlmê me Nema-ye Nazdik de, kulîlkên di destên Sabzîan de, masûmiyeta wî temsîl dikî.

Xwezî hemû derewên dinyayê bi qasî derewa Sabzîan nazik û pak bûna.

> Ev fîlm, ji bo dîroka sînemayê ciyekî girîng digire. Bûyer rasteqîn e, leheng rasteqîn in. Di nava fîlmekî de rastiyek, di nava derewekê de rastiyek û çîroka fîlmekî heye. Fîlm di nava fîlm de... Jixwe Abbas Kiyarûstemî vê tarza sinema-verite pir bikartîne di gelek fîlmên xwe de.

Yekemîn pêşangeha 'bêyî' Kurdî li Batmanê

DARA PORXELEK

Li Batmanê Pêşangeha pirtûkan bi dirûşmeya 'Batman, li her derê dixwîne' cara yekemîn hat li dar xistin. Pêşangehê bêyî nivîskar û weşanxaneyên Kurdî dest pê kir. Ev yek jî bû sedema nîqaşan.

Di 21ê Cotmeha 2017an de li bajarê Bakurê Kurdistanê di bin sponsoriya parezgeriya Batmanê de yekemîn pêşangeha pirtûkan a Batmanê hat li dar xistin û pêşangeh heta 29ê Cotmehê dê berdewam bike. Di pêşangehê de hejmarek panel, guftûgo, rojên îmze û konferans wê li dar bikevin. Nivîskarê navdar ê Tirk Hasan Ali Toptaş jî yek ji mêvanên pêşangehê ye û di 28ê Cotmehê de li Kampûsa Zaningeha Batmanê wê roja îmzeyê li dar bixe.

Di 21ê Cotmehê de bi beşdariya Cîgirê Serokwezîrê Tirkiyeyê Mehmet Şimşek li Kampûsa Zaningehê deriyê pêşangehê ji xwîner û mêvanan re vekir. Mehmet Şimşek ku bi eslê xwe jî Batmanî ye di axaftina xwe de anî ziman ku li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê tekane 25 sent ji bo pirtûkan salane tê veqetandin û ragihand ku ew ê pirtûkxaneyeke mezin li Batmanê ava bikin. Gelek weşanxaneyên navdar ên Tirkiyeyê, zêdetirî 30 weşanxane beşdarî pêşangehê bûn.





Ev yek jî derdixe holê ku pêşangeh li bajarê Kurdan lê bêyî Kurdî û bêyî weşanxaneyên Kurdan hatiye lidarxistin. Di vê mijarê de em bi nivîskar û rojnamegerê Batmanî İlhami Işık re axivîn. İlhami Işık dibêje, ew bi xwe jî nehatiye vexwendin bo pêşangehê û axaftina xwe wiha didomîne: "Venexwendina weşanxaneyên Kurdî jî ne bi niyeteke baş e. Ew kesên ev pêşangeh li dar xistine jî bi qestî weşanxane û nivîskarên Kurd an jî Batmanî venexwendine. Ez bi xwe jî him Batmanî me him jî nivîskar im. Pirtûka min beriya heyameke niha derket û xwîner li ser medyaya civakî ji min dipirsin gelo bê çima ez jî beşdar nebûme. Di mijarên wisa de mirov nizane çi bibêje. Ev karê niyeteke xirab e."

"Tiştekî sosret e"

> "Bi rastî jî ev sosret e. Çawa mirov li bajarekî biçûk pêşangeha pirtûkan li dar bixe û mirov nivîskarên wî bajarî venexwîne. Ev cihê eybê û şermê ye. Ê me pêşniyar kir ku nivîskarên me yên Batmanî beşdarî panel û konferans û rojên îmzeyê bibin."

Tekane weşanxaneya Kurdî ku beşdarî vê pêşangehê bûye Weşanxaneya Nûbiharê ye. Li ser navê Weşanxaneya Nûbiharê em bi Gerînendeyê Gîştî yê Nûbiharê Suleyman Çevik re axivîn. Çevik destnîşan dike ku di pêşangehên wisa de tu kes nayê vexwendin. Weşanxane serî lê didin û eger bête pesendkirin weşanxane jî beşdar dibin. Çevik axaftina xwe wisa didomîne: "Em weke Nûbiharê

"Em li hêviya nivîskarên Kurdî bûn"

Yek ji ziyaretvanên pêşangehê Hîvran Bayat di derbarê nebûna nivîskar û weşanxaneyên Kurdî de wiha axivî û got: " Parêzgeriya Batmanê vê pêşangehê li dar dixe. Sedema nebûna weşanxaneyên Kurdî ji ber venexwendina wan bû. Di pêşangehê de weşanxaneya Kurdî jî tenê Nûbihar hebû. Dema ez çûm pêşangehê du nivîskarên Nûbiharê jî li wir bûn. Saît Temel û Medeni Öğüt jî li wir bûn û berhemên xwe îmze dikirin. Ez meraq dikim gelo ji ber çi ewçend nivîskarên Batmanî hene lê kes ji wan nehatiye vexwendin. Ez weke xwînereke Kurd dipirsim gelo bê çima Selîm Temo, Yavuz Ekinci, Mehtap Ceyran, Abdurrahman Adak û hwd. nehatine vexwendin ji bo vê pêşangehê." Bayat di berdewamiya axaftina xwe de dibêje: "Ez li pêşangehê geriyam lê min tenê weşanxaneya Nûbiharê ya Kurdî li wir dît û tenê du nivîskarê Kurd li pêşangehê bûn. Bi rastî jî min dixwest ku ez nivîskar û weşanxaneyên Kurdî jî li vê pêşangehê bibînim."

Ev yek jî derdixe holê ku pêşangeh li bajarê Kurdan lê bêyî Kurdî û bêyî weşanxaneyên Kurdan hatiye lidarxistin. Di vê mijarê de em bi nivîskar û rojnamegerê Batmanî İlhami Işık re axivîn. İlhami Işık dibêje, ew bi xwe jî nehatiye vexwendin bo pêşangehê û axaftina xwe wiha didomîne: "Venexwendina weşanxaneyên Kurdî jî ne bi niyeteke baş e. Ew kesên ev pêşangeh li dar xistine jî bi pêşangehên wisa dişopînin û dema li dar dikevin jî em daxwaza beşdarbûnê ji wan re dişînin. Me bi hev re serî li ya Batmanê û Wanê da. Organîzatorên herdu pêşangehan jî daxwaza me pejirandin û em beşdarî pêşangeha Batmanê bûn."

Di derbarê gelo çima nivîskarên navdar ên Kurd ku Batmanî ne beşdarî pêşangehê nebûne de jî Çevik wiha axivî: "Bi rastî jî ev sosret e. Çawa mirov li bajarekî biçûk pêşangeha pirtûkan li dar bixe û mirov nivîskarên wî bajarî venexwîne. Ev cihê eybê û şermê ye. Ê me me pêşniyar kir ku nivîskarên me yên Batmanî beşdarî panel û konferans û rojên îmzeyê bibin. Yanê em weke weşanxaneya Nûbiharê me daxwaz ji nivîskarên xwe yên Batmanî kir ku tevlî pêşangehê bibin û rojên îmzeyê li dar bixin da ku xwînerên me pirtûkên xwe bi we bidin îmzekirin."



FIRAT CEWERÎ

Demokrasî

Rojeva Tirkiyê pir zû tê guhertin. Mirov pê re nagihîje. Siyasetvan çi mijarê girîng bibînin, bixwazin kîjan mijar têkevin rojevê, çapemenî wê mijarê dikin manşet û guhdar û xwendvanên xwe hefteyekê, carina du hefteyan bi wê mijarê mijûl dikin. Ev mijarên ku dikevin rojevê carina erênî, carina jî neyênî ne. Carina mirov dibêje her tişt reş e, êdî îmkanê guhertina rewşê nemaye, carina jî hêviyek tê mirov û mirov bawer dike pirsgirêka ku bi rastî jî bûye girêkeke kor, dike vebe.

Li welatên ku bi navê demokrasiyê tevdigerin, lê ji demokrasiyê bêpar in, bi piranî siyasetvan rojevê tayin dikin û bêyî ku bi rastî ji çareseriya pirsgirêkên xwe re amade bin, xelkê bi xwe re mijûl dikin.

Li welatên demokratîk, gelek caran ne siyasetvan, lê hunermend û nivîskar rojevê ava dikin. Hin ji wan kirasekî estetîk li mijarê dikin, wê di çarçoveya hunerê de dihêlin, hin jî mijara xwe bi rengekî siyasî davêjin navê. Lê civat, bi kûranî li ser difikirin û minaqeşe dikin. Hin ji mijarên ku ji aliyê hunermend û edebiyatvanan ve dikevin rojevê, dibin bingehên guhertina jiyan û sîsteman.

Me got li Tirkiyê rojev bi lez tê guhertin. Ji ber ku piraniya rojevan bi pirsgirêka kurdan ve girêdayî ne, tu bêjî nebêjî, kurdan jî pir eleqeder dikin. Loma kurd jî bi fikir û nêrînên cihê tevlî minaqeşeyê dibin. Hin ji wan carina pir bi sertî radibin hev, gotinên nemayî ji hev re dikin, hevdu ajan, hin jî hevdu xayîn ilan dikin. Nivîskarên kurd û tirk ên ku nikarin rojevê biguherin, ew jî carina bi ber bayê rojeva heyî dikevin û bi nivîs û şiroveyên xwe tevlî mijarê dibin. Ji ber rojeva ku ava dibe, ji bo me tiştên heyatî ne, em jî ji mecbûrî ber bi wê vê têne kişandin.

Çi gavên ku bi armanca aştiyê û rawestandina rijandina xwînê bêne avêtin, girîng in. Heke ew gav, encama hevdîtinên şefaf bin, wê girîngtir bin û bêhtir bigihîjin armanca xwe. Lê pirsgirêka heyî, ya ku bi salan e civiyaye ser û bûye girêkek, êdî di qirika me de diwerime û bêhnê li me diçikîne. Demekê me nêzîkî li vekirina vê girêka sêhrî kiribû û hinekî bêhna me fireh bûbû, lê ev demek e em dîsa bêhnçikiyayî bûne. Demekê me dengê aştiyê û biratiya bi kurdan re pir dibihîst, lê niha birayê mezin dixwaze bi çavsorî mafê birayê xwe bixwe û destûr nade ku deng ji birayê piçûk derkeve...

Lê çi dibe bila bibe, divê hikûmeta ku bi navê birayê mezin tevdigeriya, sozên ku dabûn bi cih bîne. Divê hikûmet, an jî dewlet di gotin û gavên xwe de cidî û durist bin; dev ji xefik û lîstikên xapînok berdin û ji bo çareseriya pirsgirêka kurdî û demokratîzekirina Tirkiyê ji dil bin. Di gava pêşî de divê ew efûyeke gîştî îlan bikin, retorîka xwe biguherin, rê li ber siyaseta legal vekin, bi parlementer û şaredarên bijartî û entelektuelên welêt re rûnên û bi rastî jî hewayeke demokratîk û biratiyê ava bikin. Ew dikarin vê hewaya demokratîk û biratiyê bi riya çapemeniyê, mîna kampanyayekê jî dewam bikin û îmaja kurdan ya xerab, ya ku ew bi xwe mîmarê wê ne, di pêvajoyeke kurt de ji navê rakin. Gava rewş normalîze bibe, wê tolerans û xweşbînî jî zêdetir bibe û bingehekî demokratîk ava bibe. Bingehê demokratîk, divê bi qanûnan werin parastin û ev qanûn ji bo parastina hemû mafên kurdan jî derbas bibin. Ji qebûlkirina nasnava kurdan, heta navên kurdî, navên cih û deverên bi kurdî, weşanên bi kurdî, li welêt perwerdeya bi zimanê kurdî û bi vî awayî hêdî hêdî Tirkiye têkeve ser riya welatekî duzimanî.

Kurd ancax di sîstemeke wilo de xwe rehet bibînin û bibêjin em jî şirîkê vî welatî ne.

Cîhanê bêdengiya xwe ya li hemberî êrişên li ser Kurdistanê bidawî kir

"Divê alî dest bi diyalogê bikin"

ZAGROS JIYAN

Hefteya borî rêxistina paramîlîter Haşdî Şabi ku ji aliyê Îranê ve tê destekkirin bi artêşa Îraqê ve Kerkûk dagirkiribûn û ev dagirkirin ketibû rojeva Kurdan û cîhanê. Kurd careke din rastî îxaneta navxweyî hatibûn. Ji aliyê Haşdi Şabi û artêşa Îraqê ve dorpêçkirin û êrişên li ser Herêma Kurdistanê û dagirkirina Kerkûkê û ev bûyer bi qasî çavdêrên jeopolitik bala welatên ku berjewendiyên wan li herême hene jî kişand. Rexneyên girîng ên vê blokê ew in ku hewldanên êrîşkar ên Serokê Îraqê Haydar El Abadî li ser Hewlêrê ku di şerê DAIŞê de bi awayekî serkeftî li dijî DAIŞê şer kiriye û girîngî nedaye têkoşîna li dijî DAİŞê.

Li aliyê din nûnerên sîyasî yên girîng ên gelek welatan bertek nîşanî êrişên li ser Herêma Kurdistanê û plana Îraqê ya dagirkirina Kurdistanê dan.

Hin welatên ku alîkariya leşkerî didan Îraqê daxuyanî dan ku ji ber êrişên hêzên Haşdi Şabi û Îraqê yên li ser Kurdistanê, ewê alîkariyan bidin sekinandin.

Kanada: Divê destkeftiyên ku li dijî têkoşîna DAİŞê hatine bidestxistin bên parastin

Berdevkê Wezareta Berevanî ya Kanadayê Daniel Le Bouthillier destnîşan kir ku alîkariyên ku bo Iraqê dihatin dayîn hatin sekinandin. Bouthillier rave kir piştgiriya ku ji aliyê Hêzên Taybet a Kanadayê ve dihat dayîn ji ber bûyerên ku li herêmê qewimîne hatin sekinandin. Bouthillier, diyar kir heta ku rageşiya di navbera Îraq û Kurdistanê de bi dawî nebe û têkilî zelal nebin dê alîkarî bên sekinandin.

Di daxuyaniyê hat diyarkirin, divê destkeftiyên ku li dijî têkoşîna DAİŞê hatine bidestxistin bên parastin. Herwiha di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Hêzên Îraqê û welatên ku di koalîsyona têkoşîna li dijî DAIŞê de cî girtine ev çend mehên borî gelek deskeftiyên mezin bi destxistin û gelek herêmên ku di bin kontrola DAIŞê de bûn, kontrol kirin. Tevî van destkeftiyan hê jî li dîjî têkoşîna terorê li ber me riyeke dirêj heye. Çimkî hê jî li Îraqê hucreyên veşartî û navendên DAİŞê hene. Divê em bo îxtîmala ku geşadanên nû rû bidin bixebitin, erdên ku di bin kontrola DAIŞê de ne rizgar bikin. Divê em hemû bala xwe bidin gefên li ser ewlehiya welêt."

Wekî din, piştî ku Kerkûk ji aliyê Îraqê ve hat dagirkirin Almanya daxuyanî dabû ku wê piştgiriya lojîstîk û perwerdeya leşkerî ku dida Pêşmergeyê dê êdî nede. Vê hefteyê Almanyayê ev biryara xwe guherand û eşkere kir ku piştgiriya lojîstîk û perwerdeyê ku dida Pêşmergeyê dê 3 mehên din jî bide. Daxuyaniya ku li Berlînê hatibû dayîn wiha bû "Me di mijara perwerde, piştgirî û dayîna çekan a bo pêşmergeyan de gaveke baş avêt."

Almanya: Divê demildest di navbera Kurdistan û Bexdayê de hevdîtin dest pê bike"

Pêvçûnên ku di sînorên Herêma Kurdistanê de zêde dibin û kiryarên derveyî hiqûqê yên Hikûmeta Iraqê ya bi piştgiriya Haşdî Şabi tevdigere li herêmê bû sedema dramên mirovî. Bi deh hezaran Kurdistaniyan ji ber pêvçûnan koçî cihên ewle yên din kirin, van koçkirinan di raya giştî ya navnetewî de cî girt. Bertekên hêzên navnetewî ji ber koçkirina Kurdistaniyan yek bi yek di ajansan de cî girt.



Di tizbîçêkirinê de bi qasî qîmeta kevir û morîkan hostetiya tizbiyan jî gelekî gîring tê qebûlkirin û bo çêkirina tizbiyan divê meriv bisebir be. Wekî din, di piyasayê de yek ji tizbiya keribar zêdetir eleqe dibîne û gelek cure tizbî hene.

Wezirê Karên Derveyî yê Almanyayê Sigmar Gabriel di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê de wiha axivî; "Me serokê Îraqê Haydar El Abadî re got. Divê pirsgirêk bi riya leşkerî neyê çareserkirin û em alternatîfa leşkerî qebûl nakin."

Wezerata Karên Derve yê Erebîstana Seûdî jî heman şiklî daxuyaniyek da û anî ziman ku ji bo Herêma Kurdistanê riya dîalogê veke encamên referandûmê dane sekinandin, ji ber vê bo dîalogê bang li Bexdayê kir. Di daxuyaniya nivîskî ya ku ji aliyê wezaretê ve hatiye kirin de ev agahî hatin dayîn, "Em banga dîalogê ya ku Herêma Kurdistanê ji Hikûmeta Iraqê ya Navendî re bo çareserkirina pirsgirêkan di navbera Hewlêr û Bexdayê de êrenî dibînin. Em wek Erebîstana Seûdî hêvî dikin ku pirsgirêk demildest bi dîalogê bên safî kirin."

Hikûmeta Herêma Kurdistanê di 24ê Cotmehê de ji bo çareserkirina pirgirêkên heyî û bo dîaloga bi Bexdayê re encama biryara referandûmê dabû sekinandin. Serokê Iraqê Haydar El Abad diyar kiribû ku ger encamên referandûmê bên betalkirin dê wisa dîalogê qebûl bikin.

DYA: Pêvçûn cihê şermê ne ?

Berdevkê Karên derve yê DYA Heather Nauert, ji bo pêvçûnên di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Navendî ya Iraqê wek 'cihê şermê' bi nav kir. Nauert, careke din banga dîalogê kir bo her du aliyan.

Nauert di civîna çapemeniyê ya rojane de, bibîranî û got ev her du alî li dîjî DAIŞê têkoşîneke hevpar didin û wisa axaftina xwe domand, "Şerê Kurdên Îraqê û Îraqiyan tiştekî şerm e. Ji bo ku DAIŞê xilas bikin bi hev re têkoşîneke zor û zehmet dan. Di vê mijarê de jî bi ser ketin. Em niha bangî li her du aliyan dikin da ku xebatên xwe yên leşkerî koordîne bikin û bo aramiyê hevdîtînê bikin."

Korgeneralê Paul Funkê ku yek ji fermandarê koalîsyona li dîjî DAIŞê ya bi pêşengiya DYAyê, di hevdîtina xwe ya bi ajansa APê de diyar kir pêvçûna li Îraqê bo şerê li dijî DAİŞê bandoreke neyînî çêkir û Funk axaftina xwe wiha berdewam kir, "Li Rojava hebûna DAIŞê ku divê ji holê bê rakirin heye, pêwîstiya me bi kuştina Îraqiyan a bi destê Îraqiyên din tune ye."

Franks amaje kir ku McGurk dijmînê referandûma serxwebûna Kurdistanê ye. Her wisa Franks diyar kir McGurk yek ji berpirs e ku Kerkûk radestî Heşdi Şabi hêza Şia ya paramiliter ya ku ji aliyê Îranê ve tê destekkirin. .

Senatora DYA De Santis jî behsa îstîxrabata êrîşeke nû kir. De Santis diyar kir ku ber destê wan agahiya ku li dîjî Kurdistanê bo êrîşeke mezin bi pêşengiya Kasım Süleymanê Fermandarê Hêza Quds a Îranî ya Haşdi Şabi amadehiyan dikin.

De Santis diyar kir ku tenê Kurd li herêmê mutefîkê DYAyê ye û divê DYA alîkariyê bo Kurdan bike û De Santis wiha pê de çû, "Divê rêveberiya DYAyê ya heyî demildest li dijî milîsên Şia ku di destê wan de xwîna Amerîka heye hereket bike."

Endamê Meclîsa Nûneran a DYAyê Jim Cooper jî di peyama xwe ya twitterê de got, "Kurd mutefîk û dostê DYAyê ne" Cooper dibêje DYA li dijî Îraq û Îranê divê piştgiriyê bide Kurdan.

Cooper dibêje, "Kurd parastin û ewlehiyê heq dikin." Êrîşên li ser Kurdan ên îraq û Îranê şermezar kir û wiha pê de çû, "Divê ev her du welat li dijî DAİŞê şer bikin, DAIŞ dijmin e, Kurd ne dijmin e."

Wekî din Jim Cooper metirsî û xemgîniya xwe ya li ser êrişên Kurdistanê ya Haşdi Şabi anîn ziman.

"DYA, amade ye navbeynkariya Hewlêr û Bexdayê bike"

Wezîrê Derve yê DYAyê Rex Tillerson derket gera Rojhilata Navîn û pêşî li Riyad û Dohayê paşî jî li Cenevreyê li dijî Îranê daxûyanî dan. Cîgirê Serokê DYAyê Mike Pence jî li hember Îranê daxûyaniyên pir tund dan.

Tillersen di civîna çapemeniyê ya ku li Cenevreyê li darxist de wiha got: "Piştî hevdîtina Ibadî Serokwezîrê Îraqê li Bexdayê min bi Serok Mesûd Barzanî re jî hevdîtineke dirêj bi rêya telefonê pêk anî. Amerîka dostê hemû aliyan ê Îraqê ye. Ji ber rûdanên li Bakurê Îraqê jî xemgîn e." Tillerson radigihîne ku divê her du alî jî ji kaosê dûr bisekinin û destnîşan dike ku DYA amade ye ji bo Îraqeke demokratîk û federal rêyeke bi aşitiyane di navbera Bexda û Hewlêrê de bibîne alîkarî bike. Tillerson di dawiya axaftina xwe de ragihand ku: "Wan bangî Ibadî kiriye ku pêşniyazên Hewlêrê di çarçoveya Destûra Bingehîn de qebûl bikin."

Tillerson axaftina xwe wiha didomîne: "Divê Îraq nîşan bike ku dikare bi îradeya xwe li ser lingan bimîne û li hember tevlîbûna Îranê derkeve. Komara Îslamî ya Îranê li herêmê piştgiriya terorîstan dike ligel vê yekê jî dibe sedema dirêjbûna şerê li Yemen û Sûriyeyê jî. Em ê cezayeke mezin bidin Îranê bi taybetî jî Pasdaran û wê DYA ji bo gelên li Îranê qedera xwe diyar bikin wê piştgirî bide wan. Bi taybetî jî ew kesên reformîst û bi daxwaza hilweşandina rejîma Komara Îslamî ya Îranê tevdigerin."

Cîgirê Serokê DYAyê Mike Pence jî li hember Îranê daxûyaniyên tund dan. Mike Pence destnîşan dike ku Îran dewleta herî zêde piştgiriya terora li seranserê cîhanê dike ye. Hîzbullah rêxistineke tarî ya Îranê ye û dê Serokê DYAyê Donald Trump li hember planên tarî yên Îranê bêdeng nemîne.

Cîgirê Fermandarê Giştî yê Artêşa Îranê Ahmet Riza Purdestan ragihadibû ku weke li Sûriyeyê li Îraqê jî hêzên wan hene û serpereştiya van hêzan ji aliyê Fermandarê Hêza Qudsê ê Supaya Îranê Qasim Sileymanî ve tê birêvebirin. Purdestan gotibû: " Operasyonên Îranê yên li Îraq û Sûriyeyê bi Fermandariya Fermandarê Hêza Qudsê a Supaya Îranê Qasil Sileymanî birêve diçe. Heşda Şebî ku li Îraqê ye û hêzên Îranê ku li Sûriyeyê ne girêdayî fermandariya Qasim Sileymanî ne. Armanca van hêzên me ku li Îraq û Sûriyeyê ne ewe ku Artêşên van herdu welatan xurt bikin."

"Serlêdana Ibadî bo Îran û Tirkiyeyê dibe ku amabargoyan ser Kurdistanê zêde bike"

Rojnameger Adalet Abdullah diyar dike ku serdana Serokwezîrê Îraqê Ibadî ji bo Tirkiye û Îranê wê bi xwe re çendîn ambargoyên din li ser Kurdistanê zêde bike. Abdullah dibêje ku ev serlêdan diyar dikin ku Ibadî di şerekî de ye û ji bo piştgiriya Tirkiye û Îranê bistîne derketiye van geran û wiha didomîne: "Tişta li holê ye nîşanî me dide ku ev herdu welat bi awayekî vekirî li hember Kurdan piştgiriya Îraqê dikin. Ji ber ku ev her sê welat di çendîn mijaran de xwedî heman taybetiyê ne. Bilhassa bidawîanîna serweriya Kurdan û serweriya Kerkûkê ya di destê Kurdan da çendîn ji van mijaran e."

Ebdullah destnîşan dike ku di navbera sê welatan de rêkeftinek heye û wiha didomîne: "Li gor agahiyên di destê min de ev her sê welat ji bo li hember Kurdan tevbigerin odeya hevpar a operasyonan lidarxistine. Êrîşên li ser navçeyên Herêma Kurdistanê jî encamên rêkeftina van her sê welatan e. Armanca ziyareta Ibadî bo her du welatan jî ew bû ku li hember Kurdan di warê dîplomasiyê de şirîkatiyeke hevpar ava bikin."

Di dawiya axaftina xwe de Ebdullah wiha dibêje: "Têkiliya vê şirîkatiyê ligel welatên din jî heye. Helwesta DYA, NY û welatên Ewropa jî nîşan dide ku têkiliya van welatan jî di nav vê planê de heye. Li gor agahiyên di dest de armanca Îraqê ew bû ku bi leşkerên xwe bikeve Kurdistanê û li deverên ku alaya Îraqê tune ye jî bixe bin destê xwe. Lê belê ev yek encax bi şer derkeve holê holê.



Herêmên 'nakok' di rojeva NYê de ne

Encûmena Asayîşa Netewên Yekbûyî li ser pêvçûnên di navbera Hêzên Pêşmerge û Haşda Şeibî - Artêşa Îraqê de civînek pêkanîn. Di civînê de li ser herêmên Kurdistanî yên ku weke deverên 'nakok' tên zanîn axaftin hatin kirin.

Di encama civîna ku bi daxwaza Fransa û Swêdê pêk hat de pêşnumayek hat amadekirin û ev pêşnuma ji aliyê 15 welatên ku beşdarî civînê bûn ve hat îmzekirin.

Tekane hevoka di derbarê Kurdan de hat derxistin

Di pêşnumayê de bi giranî mijarên sekinandina şer û destpêkirina diyalogê cî girtin. Hevoka "Divê rêz li mafên Kurdan bê girtin" ku di pêşnûmeyê de cî digirt bi daxwaza Îngîltereyê ji pêşnûmeyê hat derxistin.

Balyozê NY yê Îngîltereyê Matthew Rycroft got, "Welatê min yekitiya axa Îraqê diparêze. Em li dijî referandûmê ne ji ber ku referandûm ne li gor destûrê ye."

Îngîltereyê helwesta xwe eşkere kir

Balyozê NY yê Fransayê François Delattre got, "Dewletên endam ji hemû aliyan daxwaz dikin ku ji tundiyê dûr bikevin û dest ji bikaranîna hêzê berdin. Bi vî awayî daxwaz bi dawîkirina pêvçûnan kir. Tevî ku Hikûmetên wek welatên Fransa û Swêdê li gel mafên Kurdan helwestek nîşan dan jî Îngîltereyê bi awayekî eşkere piştgiriya Hikûmeta Navendî ya Bexdayê kir.

Di pêşnumayê de bi giranî mijarên sekinandina şer û destpêkirina diyalogê cî girtin. Hevoka "Divê rêz li mafên Kurdan bê girtin" ku di pêşnûmeyê de cî digirt bi daxwaza Îngîltereyê ji pêşnûmeyê hat derxistin.

Çi qewimîbû?

Piştî ku di 16ê Cotmehê de hêzên ku girêdayê Yekitiya Nîştîmanî a Kurdistan ji Xurmatu û Dakukê vekişiyan artêşa Îraqê û hêza paramîlîter a Heşda Şeibî li van herêman bi cî bibûn.

Piştî dagirkirina van herêmên Kurdî ji aliyê rêxistina girêdayî îranê ve, Kompaniya British Petrol (BP) ku ya Îngîltereyê ye, li gel Bexdayê li ser petrola Kerkûkê rêkeftinek pêkanî.

Sala 2013an BPê xwestibû ku li Kerkûkê petrolê derxîne, lêbelê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li dijî vê daxwaza vê kompaniyê derketibû û BPyê nekarîbû xwe bigihîne petrola Kerkûkê.



Li Diyarbekirê çêkirina Tizbiyan;

Tizbî di destê hoste de qîmeta xwe dibîne

BERFO GILÎDAX



Hin kar û pîşe hene ku bi rastî jî taybet in û hosteyên van karan jî hindik in. Yek ji van karan çêkirina tizbiyan e. Tizbî wek tê zanîn di çanda Anatoliya, Mezopotamya û Rojhilata Navîn de heye an wek aksesuwar an bo îbadetê tê bikaranîn. Li hin bajarên Kurdan hosteyên tizbiyan hene û bi awayekî vî karî dikin. Yek ji van Xelîl Gezici ye ku ew 32 sal e li Sûra Amedê him tizbiyan çê dike him dide çêkirin û him jî difiroşe. Xelîl Gezici ji Heftenameya Basê re behsa çêkirina tizbî û piyasa vî karî dike.

32 sal in tizbiyan çêdike û difiroşe...

Xelîl Gezici ji Botanê ye lê li Diyarbekirê dijî û wiha behsa karê tizbiyan dike, "32 sal in vî karî dikim. Ev kar ji malbatê nayê. Meraqa min li ser tizbî û bikaranîna wê hebû. Dema emrê min bû 16-17 em hatin bajaran û me gelek kar kir. Me got em ji xwe re karekî din bikin. Em him tizbiya çêdikin him jî didin çêkirin û van hemûyan jî difiroşin. Ez ji karê xwe hez dikim û serdestê karê xwe me. Ez kedê didim her tizbiya ku dikeve dikana min. Hin karê sivik hebe ez li dikana xwe tizbî çêdikim û benik û serbendê van diguhêrînim lê ji ber ku çûyîn û hatina merivan çêdibe tizbiyên ku hinek zêde wext dixwaze û giran li malê çê dikim."

"Bi hezaran cureyên tizbiyan hene"

Gezici wiha li ser cureyên tizbiyan diaxive, "Cureyên tizbiyan zêde ne. Mirov dikare bibêje ku bi hezaran cureyên tizbiyan hene. Dema kesek tiştekî bifiroşe li gor herêma ku lê dijî ka pêwistiya vê cihê çi ye û çi eleqe dibîne, karê firotinê dike. Em jî li gor vê rewşê dişuxilin. Ez bibêjim ji ber vê rewşê dora 20-50 cure tizbî li ba min hene. Giraniya me li ser hin tizbiyan e. Çimkî bikirên me kîjan cure tizbî bixwazin em jî wan difiroşin. Li herêma me herî zêde tizbiya karibar (kehribar) tê firotin. Em li gor qîmeta kevir tizbiyan dikirin, çê dikin û didin çêkirin û difiroşin. Di piyasayê de bihayê tizbiyan diguhêre. Ji 100 lîreyê dest pê dike heta 1,2, û 5 hezar û heta li piyasayê 10,15, 20 hezar lîreyê tizbî jî tên firotin. Li cem me jî ji bihayê 100 lireyê

> Di tizbîçêkirinê de bi qasî qîmeta kevir û morîkan hostetiya tizbiyan jî gelekî gîring tê qebûlkirin û bo çêkirina tizbiyan divê meriv bisebir be. Wekî din, di piyasayê de yek ji tizbiya keribar zêdetir eleqe dibîne û gelek cure tizbî hene.

zêdetir tizbî hene. Helbet her kiryar li gor rewşa xwe ya aborî tizbiyan dikire. Hin kiryar tên dibêjin bila tizbiya min 10 lîre yekî din tê dibêje bila tizbiya min hezar an jî 2 hezar lîre be."

"Morîk bi piranî ji rîçalê daran çêdibe"

Hoste û firoşkarê tizbiyan Gezici derbarê taybetmendiya cureyên kevirên tizbiyan de van agahiyan dide, "Hin kevir hene ji dora dewletên Baltık Rûsya, Ukranya, Lîtvanya li van deran derdikeve. Kevirên xwerû hene yanî tu made an jî tiştek din tê de tune. Ji erdê derdikeve kesên vî karî dikin vê ya dişopînin. Dema dinya ser û bino dibe dar û tiştên din dikevin, di bin axê de bi hezar an jî mîlyon salan dimînin, hişk dibin. Morîk bi piranî ji vê rîçalê daran heye, ji van çêdibin. Ji ber ku derxistin û peydakirina van madeyan zehmet e ji loma biha ne. Yên ku van madeyan derdixin û tînin li pîyasayê difiroşin kar dikin. Wekî din hin malzemeyên tizbiyan ji binê behrê tê derxistin û ji van jî tizbî tê çêkirin. Her wisa hin cureyên daran tînin dikin tizbî. Wekî ku dibînin ji gelek cure malzemeyan tizbî tê çêkirin. Li ser meselê, li navçeya Oltu ya Erzîromê ev 100 sal e kevirekî bi navê Oltu derdixin û ji vê tizbiyan çêdikin."

Gezici wiha qala firotina tizbihên ku çêdike û dide çêkirin dike, "Welatiyên me yên ku li Ewropayê dijîn gava ku tên, tizbiyan ji me dikirin. Lê kesên biyanî, welatiyên Ewropa tu kes tizbî naxê destê xwe li ba wan bikaranîna tizbiyan şerm e. Wekî din li bajarên Tirkiyeyê kiryarên me hene û em tizbiyan didin kargoyê dişînin Îzmîr, Stenbolê. Helbet dema ku em bi vî şiklî tizbiyan difiroşin, em van kiryaran nas dikin û em ji hevûdu bawer dikin."

"Hosteyên tizbiyan herî zêde li Rihayê hene"

Li ser piyasaya tizbiyan jî Gezici van agahiyan dide, "Em hin keviran bi graman dikirin, bi dolaran dikirin, ji ber van sedeman biha ye. Li herêma me herî zêde hosteyên tizbiyan li Rihayê hene. Mirov dikare bibêje ku li Rihayê sedan kargehên tizbiyan vebûne. Dema ku diçî van kargehan, makîneyên wan ên piçûk hene û keviran dibirin dikin tizbî. Jin, mêr, zarok dixebitin. Divê meriv vêya jî bibêje, niha ferqeke mezin di navbera tizbiyên ku bi destan tên çêkirin û yên bi makineyan çêdibin hene. Li ser meselê, li Enqereyê hin hosteyên tizbiyan hene tevî ku tu melzemeyên tizbiyê dikirî û dide wan bo keda destê xwe jî 500 dolar distînin. Her hoste cuda bi cuda tizbiyan çêdike. Hin kiryar tên cem me û dibêjin tizbiya filan hosteyî ku çêkiriye li ba te heye? Di çêkirina tizbiyê de hostetî gelek girîng e û dibe ku kevir pir bi qîmet be lê ger hoste baş tizbiyan çêneke ev tizbî dimire. Li Diyarbekirê 4-5 hosteyên tizbiyan heye heta yek jî jin e û wê jî cî vekiriye û çêdike. Weki din li Xarpet, Mêrdîn, Semsûr, Meraş û Dîlokê hosteyên tizbiyan hene."

"Li Sûrê çûyîn û hatina geştiyaran kêm bûye "

Hoste û firoşkarê tizbiyan Xelîl Gezici yê ku li Sûra Amedê esnaftiyê dike li ser rewşa esnafên Sûrê jî wiha diaxive, " Bi taybet ev 2-3 salên dawî yanî ji 2014an û pê ve di karê me de em dikarin bibêjin ku ji sedî 60-70 şikestinek çêbû. Hin mexdûriyetên esnafên Sûrî çêbûn û berdewam e. Şeş taxên Sûrê hema xira bûn û ji Sûrê gelek kesî koç kir. Niha bi dehan dikanên vala hene û berê dikanên vala tune bûn. Şerê kolanan çawa ku bandor li ser derûniya herkesî û civakê kir, bandor li ser aboriyê jî kir. Ji aliyekî ve, çûyîn û hatina geştiyaran li gor berê hindik bûye. Lê ez dibêjim heke em wek esnaf ev 2-3 salên dawî ne li ser lingên xwe sekinîbin. Çi dibe bila bibe emê li ser lingên xwe dê bisekinin."



Nefta Kerkûkê:

Windakirineke dualî

BİLAL ADLIĞ



Dagirkirina Kerkûkê ji aliyê mîlîsên Şîe Heşdî Şabî ve bû sedem ku hinardekirina petrola Herêma Kurdistanê kêm bibe. Piştî ku zeviyên petrolê yên Kerkûkê Havana û By Hasan ji aliyê Artêşa Îraqê û Heşda Şabî ve hatin dagirkirin hinardekirina petrola Herêma Kurdistanê kêm bû. Beriya referandûmê rojane 600 hezar bermîl nefta Kurdistanê di ser Tirkiyeyê de derbasî bazara germ a cîhanê dibû. Piştî pêkanîna referandûmê û êrîşên Heşda Şabî bi piştgiriya Îranê zeviyên neftê yên Kerkûkê û deverên derveyî Herêma Kurdistanê hatibûn dagirkirin. Di encama vê dagirkirinê de petrola Herêma Kurdistanê roja sêşema 24ê Cotmeha 2017an 300 hezar bermîl û roja çarşema 25ê Cotmeha 2017an jî 252 bermîl petrol hinardeyî bendera Ceyhan a Tirkiyeyê hatiye kirin. Herwiha li gor daneyên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji roja ku her du bîrên (zeviyên) petrolê ji aliyê Îraqê ve hatine dagirkirin û vir ve Herêma Kurdistanê 200 milyon dolarî zirar kiriye.

Dagirkirina Kerkûkê û êrîşên Artêşa Îraqê û Heşdî Şebî li ser Herêma Kurdistanê bazara petrolê jî li cîhanê germ kir in. Aborînas di derbarê vê mijarê de xwedî çendîn nêrînên cuda ne. Li aliyê din jî Serokwezîrê Tirkiyeyê Binali Yıldırım ragihand ku dê careke din ligel Îraqê rêkeftinan bikin û bendera Kerkûk – Ceyhanê aktîf bikin û nefta Kerkûkê bi riya Hikûmeta Navendî ya Îraqê derbasî bazara cîhanê bikin. Herwiha Serokwezîrê Îraqê Haydar El Ibadî di serdana xwe ya Tirkiyeyê de pêşniyarî Tirkiyeyê kir ku careke din dest bi hinardekirina petrolê ji Îraqê bo Ceyhanê bikin. Serokê Odeya Karsazên Pîşesazî û Bazirganiyê ya Diyarbekir Burç Baysal li ser vê mijarê Heftenameya Basê re axivî.

> Aborînasê navdar ê Kurd Weysî Polat diyar dike dagirkirina Kerkûkê ji aliyê Heşdî Şebî ku bi piştgiriya Îranê tevdigerin wê bibe sedema bihabûna petrolê li bazara cîhanê.

"Ev windakirineke dualî ye"

Burç Baysal, daketina rêjeya herikîna nefta Kurdistanê ji bo Tirkiye û bazara cîhanê ji bo herdu welatan jî weke windakirineke mezin dinirxîne û wiha pê de diçe: "Ev mijar ne tenê ya Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê ye, ew kampanyayên ku nefta Herêma Kurdistanê ji bendera Mersînê hildigirin û dibin bazara cîhanê jî ji vê rewşê bandoreke neyênî dibînin. Em dizanin ku berpisyar û aborînasên Tirkiyeyê radigihînin ku di budçeya xezîneyê de valahî derketiye û ji bo vê valahiyê tije bikin jî li çavkaniyan digerin. Ne hindik e ku di heftiyekî de Herêma Kurdistanê ji vê kêmbûnê 220 milyon dolar zirar dîtiye. Herwiha ev zirar dîtin ne tenê li Herêma Kurdistanê rû dide Tirkiye û kampanyayên ku vediguhezin jî zirar ji vê yekê dibînin."

"Rewşa heyî bandorê li ser bazara neftê ya cîhanê jî dike"

Burç Baysal di berdewamiya axaftina xwe de dibêje: "Divê herdu welat dev ji van nakokiyan berdin û careke din vegerin asta beriya referandûmê. Têkçûna têkiliyan ne tenê li Herêma Kurdistanê an jî Tirkiyeyê dike. Ev têkçûn bandorê li bazara neftê ya cîhanê jî dike. Divê teqez lihevkirinek derkeve holê."

Toyota êdî seyareyên dîzel hilnaberîne

DARA PORXELEK

Di sektora otomotîvê de dahatûya erebeyên bi benzîn û dîzelê tê nîqaş kirin. Yek ji girîngtirîn kampanyaya hilberandina otomotîvê Toyota, biryar da ku êdî wê seyareyên bi dîzelê dixebitin hilneberîne. Gerînendeyê Giştî yê Toyota Didier Leroy diyar kir ku ew êdî motorên dîzelê hilnaberînin.

Toyota, yek ji pêşengê otomobîla hibrîtê ye biryar da ku êdî motorên dîzelê bikarneyîne. Weke tê zanîn beriya demekê gelek welatan biryar dabû ku êdî motora dîzelê neyê bikaranîn û otomobîlên bi benzîn li wan welatan bên qedexekirin.

"Ev dê bandoreke erênî li avûhewayê bike"


Endezyarê Makînayê Omer Oduncu di derbarê biryara Toyotayê de wiha axivî: "Di dahatûyê de wisa xuya dike ku wê gelek welat dev ji bikaranîna motora dîzelê berdin û ev yek jî wê bandoreke erênî li avûhewaya cîhanê bike."

"Ev biryareke dîrokî ye"

Endezyarê Enerjiyê Erhan Basmaci jî di derbarê bikaranîna erebeyên bi hîbrîtê de wiha axivî: "Bikaranîna otomobîlên hîbrîtê ji bo avûhewayê gaveke erênî ye û biryara Toyotayê jî gaveke dîrokî ye. Ez di wê baweriyê de me ku wê di demeke nêz de gelekî kampanyayên mezin ên cîhanê dê li pey vê biryarê bên û wê gav bavêjin."

Nahêle dûxan zêde derkeve û gerdûnê naherimîne"

Endezyarê Makînayê Omer Oduncu di derbarê otomobîlên hîbrîtê de ji me re ragihand ku wateya hîbrîtê ew e ku bi du aternatîfan mirov dikare bikarbîne. Wek mînak mirov dikare him benzînê him jî karebeyê bikarbîne. Ev yek jî him di egsozên seyareyan de nahêle dûxan zêde derkeve him jî gerdûnê naherimîne."





NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

Payîz o

Pencereyê mi ra darê ke asenê tayê bîyê sûraxinî, tayê bîyê zerdî. Verê vayê payîzî de tayêne pelê xo rişnê. Seke yew seremonî esto teber ra, darûber xatirê xo wazeno hamnanî ra. Seke vanê "No kay kelevît, na bextîyarîye, na şayîye bes a, verê ma zimistan o, zimistan giran o, ma gerek hazirîya xo bivînîme ke zimistanî ra weş war bivejîme û reyna wisarî bivînîme, reyna tîje leş û riçikanê ma germin bikero û ma ancî bi pelanê renginan xo bixemelnîme, bivejîme meydan." Nika teber ra hay huyê naturî û xatirwaştiş nîya bi dej dewam keno.

Zimistan raşta zî giran o. Seba ê ke cografyaya xo çetin a, ê ke mabênê koyanê berzan der ê, zimistan seba înan dahîna çetin o.

Maya mi vatêne "Cîgera mi, asma payîjî ya ortîye ra poncesê vêrd ra, ti hona bîya." Yanî wexto ke ez bîya, payîz bîyo. Wexto ke payîz bî zî ez bena pozxine, perrê mi şîkînê, seke payîz zereyê mi ra çiyê visneno beno. Ez kewna pelanê daran ver, ez kewna vaş û mergan ver. La ti se kena bike payîz payîzîya xo canêverdano, payîzîya xo ra nêtexelîno. Ê çinarêrê girsî, keweyî verê çiman de permelînê ro, şonê la kesî ra veng nêvejîno, kes nêşîkîno bierzo xo ver çîyê bikero.

A çinarêra girsa bimbareke pelanê xo kena zerd, nana ro, xo kena viran û teslîmê xezebê zimistanî kena. No, seba tebîetî yew trajedî yo. Tebîat ke bizano senê xezebî yenê sereyê ey serde belkî zî erzeno xo ver, belkî zî henî rehet teslîme zimistanî nêbeno. La o, tebîet o. Sey însanan nîyo, sey komelan nîyo.

Ge-ge ez fikirîyena, vana belkî zî tebîet de her çî tebîyê yew qeydeyî yo. Yanî ha darûber ha heywanî ha însanî, ferq nêkeno. Heme zî tebîyê qeydeyê tebîetî yê. Şima zanê yew qise esto vanê, "Masîyo girs/gird masîyê qijî weno (qulutneno ro)." Qeydeyê tebîatî nîyar o. Kam ke qewetino, zor rê ci keno, o maneno, o yo ke zar o, zeîf o zî mireno. Yanî tebîet de heq, huqûq, edalet çin o, zor esto. Ez vana halê komelan, yê dewletan û yê însanan zî nîyar o.

Qiralê geme şêr o, yê dinya zî Amerîka (Dewletê Yewbîyayeyî) ya. Her di zî bi heq û huqûq nê, bi zor hukm kenê. Her di zî bi vengê wijdanê xo nê bi vengê madeyê xo hereket kenê. Dewletê dinya ê bînî zî na rayê ra şonê. Kamî ke destê kamî ra zêde çî remna, o muteber o. Wa ê bînî vêşan bimanê, wa memirê, nêm vêşan bimanê ke xizmeta zordaran bikerê, seba loqmê nanî vatena înan ra nêvejîyê.

Merdim ge-ge zaf bêçare maneno. Seke no qayde nîya amo, nîya şono. Yanî çare xirabinîye der o? Yanî heq, huqûq, însanîye, wijdan, birayînî pêro zur ê? Eke henî yo, serê dinya de herbê werdiş qet nêqedînê û şaro mexdur bîlasebeb ere heq-huqûq geyreno. Demekê key ke tifang kewt re mexduran dest o wext heq û huqûq seba înan zî beno. Zobî nê, ya?

Çiqas ke tebîet de qaydeyê mewsîman nîya nêbo zî seba kurdan mewsîm, tim payîz bîyo, zimistan bîyo. Madem tebîet de qayde nîya nîyo, madem zimistan ra tepîya tim wisar yeno, çirê seba kurdan no qayde nêno ca? Ez vana cografyaya kurdan çetin a, koyî zaf berz ê, vewre zaf varena, belkî zî coka zimistan hende derg o. Belkî zî coka zimistan hende çetin o, nêvêreno, nêqedîno, nêşono. Key ke tenê nêzdîyê wisarî bîyîme reyna pey ra saneno ci, beno teslîme xezebê zimistanî keno.

Ez vana qaydeyê tebîyetî tena hetê zordaran de nîyê. Tenê zî hetê vurîyayîşî der ê. Tebîet de zimistan heta peynîye dewam nêkeno. Helbet rojê nê rojê qedîno û cayê xo dano wisarî.

Wexto ke merdim raya xo bizano, xo bi xo mewero, piştî bido yewbinî her çî zî destebera ci yena. Na dinya alem ke bêro têhet, pêro pîya ke sey yewbinî bilawe zî pere nêkeno, teke şarê mexdurî xo bi xo yewbinî mewerê û piştî bidê yewbinî.

Karê qiralan zaf çetin nîyo. Ê, gir erzenê mîyanê şarî, înan verdanê pê û bi xo zî dûrî ra qayît kenê, heta ke şarî yewbinî werd qedena. Çîyo muhîm o yo ke şar na dame bivîno û gorê ey hereket bikero. Çi heyf ke kurdî na dame nêvînenê û goreyê menfîyetê xo hereket nekenê.

Çend serrî yo ke mintiqaya Kurdîstanî nêm xoser a. Heta nika luzûm nêkerdêne ke pêşmergeyî yew bîyêne. Ez bi şaşîye heşnena ke yê her partî peşmergeyê xo cîya yê. Yew şar, nîya çitur bibo milet. Tayê şaristanî yê yew partî yê, tayê zî yê yew partî. Mintiqayî pare kerde yê, peşmergeyî pare kerde yê. No hal verê milet bîyayîşî de yew astengî ya, yew manîyo girs o. No hal ra yo ke her kes Kurdîstan de rehet rehet cîrte erzeno û deqa de teslîm gênê.

nadirega@hotmail.com

Ewladê Welatî yo Xeyrin

Seîd Çurukkaya (1968-2016)

Tarîx û qehramanîye di çekuyê ke yewbînan ra pêrabeste yê. Tarîxê her miletî de qehramanê ke kes nêeşkeno înan xo vîr ra biko estê. Çunke ê bi xo tarîx nusenê, tarîx zî qalê înan keno. Helbet trajedîya qederê ey ra girêdayê qehramanê miletê kurdî zaf-zaf ê. Nameyê Seîd Çurukkaya (Dr. Suleyman) yê yewê înan o. Bî 1 serre ke Seîd Çurukkaya mîyanê ma de nîyo la zerrîya ma de ciwîyeno. Kurdî, nêeşkenê ey xo vîr ra bikê. Seîd Çurukkayo rehmetî bi cesaret, zeka û fedakarîya ke ey seba welat û miletê xo kerda hertim bi rehmet û hurmet yadkerdişî heq keno. Ma ganî qehraman û şexsîyatanê winasîyanê ke cuya xo seba şarê xo vîyarna, seba welat û azadîya kurdan mucadele kerda xo vîr ra nêkerê û înan hertim yad bikê. Ma zî sergêrra yewine ya şehîdbîyayîşê ey de Dr. Seîd Çurukkaya û bi no wesîle heme şehîdanê welatî bi hurmet û mînet yad kenê.

Seîd Çurukkaya kam o?

Seîd Çurukkaya serra 1968î de dewa Çilkanî ya Çewlîgî de maya xo ra beno. Wexto ke 1989 de Fakulteyê Tibî yê Unîversîteya Çukurova de waneno beşdarê PKK beno. (Goreyê tayê kesan no tarîx 1991 o.) Mîyanê PKK de bi nameyê Dr. Suleyman yeno şinasnayîş û sey endamîya komîteya merkezî, fermandarîya eyalet û mintiqa wezîfeyanê berzan keno. PKK kongreya xo ya 7. de projeyê Komara Demokratîkî/Komara Tirkîya Demokratîke esas gêna. Naye ser o Çurukkaya na kongre de qiseykeykerdişêk keno û îtîrazê xo wina îfade keno: "Ez ancax tena semedê Kurdîstanî şer kena, nêeşkena semedê Tirkîya şer bika" Çurukkaya, serra 2000î de PKK ra vejîno.

Seîd Çurukkaya badê ke koyî ra yeno war Kurdîstanê Başûrî de ca beno, yew serre uca maneno û dima ra şono Almanya. Gama ke Almanya de sey multecîyo sîyasî maneno Unîversîteya Bremenî de beşê şewirmendîya sosyalî qedeneno. Almankî û îngîlîzkî museno. Şertê ey yê Almanya zaf bikonfor benê la wexto ke DAÎŞ hêrişê ro Şengalî keno agêreno Herêma Kurdîstanî. Dr. Suleymano ke bi razîyê zerrîya xo beno şervan û dest bi perwerdekerdişê pêşmergeyan keno û bi nameyê Hêzê Agirî yewîyêk roneno. Yewîya ey de parçeyanê cîya-cîyayan yê welatî ra şervanê kurdî ca gênê. DAÎŞo ke hîna zaf çekanê teqaber û mayinan xebitneno, şero ke vera ey beno de rolo muhîm kay keno. Seba ke rayîrê pêşmergeyan akero bi yewîya xo reyde cepheya verêne de ca gêno. Pêrodayîşan de çend embazê şehîd benê.

Çurukkaya sedemê agêyrayîşê xo bi cephe bi nê cumleyan îzah keno: "DAÎŞ yew rêxistin a ke vera heme merdimîye şer kena. Bitaybetî muameleye ke na rêxistine kurdê êzidîyan rê kerdêne, camêrdan kiştişê aye, cinîyan sey carîyeyan rotişê aye, seserra 21. de dinya de hema bîyayîşê çîyanê winasîyan û Kurdîstan de qewimîyayîşê înan sey kurdêk zaf zorê mi şî. Mi dî ke merdimî muhtacê ardimî yê. Ez winî fikirîya ke ganî nê merdimî bêrê rêxistinekerdiş û biresnîyê yew sewîye ke bieşkê dewanê xo bipawê. Ez seba ke ciwananê êzidîyan, xirîstîyanan û kurdan perwerde bika û yewîyê ke seba pawitişê merdiman û dewan ronîyê ardimê înan bikê ke ê bieşkê hîna baş şer bikê agêraya Kurdîstan.



Bî 1 serre ke Seîd Çurukkaya mîyanê ma de nîyo la zerrîya ma de ciwîyeno. Kurdî, nêeşkenê ey xo vîr ra bikê. Seîd Çurukkayo rehmetî bi cesaret, zeka û fedakarîya ke ey seba welat û miletê xo kerda hertim bi rehmet û hurmet yadkerdişî heq keno.

Şehîdbîyayîşê ey

Operasyonê raxelisnayîşê Şengal û Mûsilî yo ke 17. 10. 2016 de dest pêkeno, Fermandarê Yewîya Pêşmergeyan ya Agirî Seîd Çurukkaya zî bi yewîya xo reyde beşdarê nê operasyonî beno. 26ê teşrîna verêne de gama ke ê dewa Fazilîye ya Başîqa de mayinanê DAÎŞî demonte kenê, terorîstê DAÎŞî ke xo yew tunel de nimitê mayin teqnenê. Seîd Çurukkaya (Dr. Suleyman) netîceya nê teqayîş de bi hawayo giran birîndar beno.

O hedîseyî ra pey verê cû sewqê Nêweşxaneyê Cumhurî yê Hewlêrî beno û ci rê mudaleyê tibî yo verên tîya de beno. Dima ra zî bi teyaraya ambulanse neqlê Nêweşxaneyê Leşkerî yê Koblenzî yê Almanya beno. Heyf ke mudexaleyan ra netîce nêna girewtene û Dr. Seîd Çurukkaya 30.10.2016 de dinyaya xo bedilneno û daxilê karwanê şehîdanê Kurdîstanî beno. Semedê ey verê Hewlêr de merasîmo leşkerî virazîyeno. Nê merasîmî ra dima meyîtê ey neqlê dewa ey Çilkanî beno û bi beşdarbîyayîşê bi seyan kesan goristanê dewe de yeno definkerdiş.

General Seîd Çurukkaya

Şehidbîyayîşê ey ra wextêkê kilmî dima unvanê Generalî dîya Seîd Çurukkaya. Qerar hetê Serekê Herêma Kurdîstanî Mesûd Barzanîyî ra dîya û metnê nê qerarî bi destê hetkarê Parlamentoyê Kurdîstanî Cafer Emînkî ra teslîmê birayê ey Selîm Çurukkaya bî.

Qerarê unvandayîşî ke hetê Serekê Herêma Kurdîstanî Barzanîyî ra ameyo îmza kerdene de wina vajîyeno: "Doktor Silêman naye ra di serrî verê çarçewaya vera terorî mucadelekerdiş de beşdarê hêzanê pêşmerge bîyo û bi no qayde menfîetanê milî rê xizmetkerdişê ey ameyo teqdîr kerdene û ci rê unvanê 'general' munasîb ameyo vînayene."

Bawer bikerê do hol bo

SÎDAR HALMAN

Şarê ma zey her timî nê rojan de zî reyna halên do çetin ra ravêreno. Xiyanet, bêbextey, zurî... Halê ma Kurda hewt pay çekerdo "Kayên Texta". Taybetî, çimê heme kurdan tadîyayo Kurdîstanê Başûrî rê. Reyna û fina kurd waşto ke xoser bibo û reyna zî dagirker çar hetî ra hêrîş û hucûmê ma keno. Zey ke Keko Elî Ewnî zî vatbî "meselaya xoserbîyayîş meselaya bîyayene û nêbîyayen o". Ewro ma yê weş vînenê raştî zî eynî winî yo. Bi no refleksê şarê ma her cayê dinya de, çend ke destê înan ra ame werişt ser payan. Labelê bîyo zey di krîşe la reyna zî eza bîyara ziwan, kurdê ma rêşta ronayişê de zî nêşênê hende bibe yew. Yew hukumatê Kurdistanî yo fermî esto, o zî binde erîş de yo la hewna zî partîyê kurdan goreyê menfîyet û berjewendîyanê xo hereket kenê.

Dîasporaya kurdan zî hendê xo gird û pîl o. Tenya Elmanya de yew mîlyon kurd cîwîyeno û temamê Ewropa de zî hendê 2 milyon kurdî estê. Raştî zî her ca di kurd esto û hetta tayn sûkan di çend mehley estê ti vanê qey şîyê Riha, Qers an Çolig hend kurdê ma zaf ê. Tewr vêşî zî Kurdê Vakurî yê.

Xeter û taluke gird o, lazim bî Ewropa di, Amerîka de her ca de ma qiyamet bi qilaynê. La zey di ki mi pawit nêbî. Çirê nêbî şima rê vaja. Eza no çend serrî yo Almanya de ciwîyena, tîyan ma vêşêrî sîyasetê partîyan vînenê çunkî her parçe ra kurdî kom bîyê û ma biwazê nêwazê zî bi hemînana kontak ronenê. Kurdê welatheskerdoxî zaf ê la vêşêrî kes goreyê partîya xo reaksîyon danê. Mîsalê bida çîyên do ecêb, şima zî rewş senîn o fahm bikerê. Ewro Strasbourg de, vernîya Parlementoya Neteweyê Yewbîyayeyan de çalakîya roniştene estbîye û kurdê ma ra 2 grûb bîy, grûba girde cayê de roniştbî qandê sihet û halê Ocalanî çalakîye kerdêne, grûba werdîye zî cayê do bîn de ronişte seba Kurdîstanê Başûrî çalakîye kerdêne. Çîyên do trajîkomîk bî, nêvanê şar o fekê ma dirneno la ma nêeşkenê di-hîre gamî bierzê bêrê pêhetek hêz û qewetê xo yew bikerê. Reyna zî zaf sûkan û cayan de şar werişt ser lingan.



Koln, yew sukên do rojawanê Almanya ke tede zaf kurdî ciwîyenê. Dêra Dom, Koln de Dêrên do namdar o. Vernîya ci de zî meydanêno hîra esto. Badê tirorîstê îranij û îraqijî kewtî Kerkûk şarê ma bi hezarana uca de kom bî mesajêno weş da dinya rê. No çend rojî yo ke çalakîye dest pêkerdê, 25ê menge de, Belçîka di vernîya Partementoyê Ewropa de, Awusturya de vernîya Parlementoyê Vîyana de, Fransa de vernîya Parlementoya Parîs de û Londra de çalakîyî virazîyay. 26ê menge de reyna Londra de kurdî teber û kuçan de bîy, heta Fînlandîya de zî 26ê de kurdî aya bîy. 27ê menge de zî bernameyêno weş fina amede kerd. 27ê di Hollanda de saete 11 de vernîya Parlementoyî de çalakî do bivirazîyo, paytextê Almanya Berlîn de zî vernîya Berê Brandenburgî de çalakî esta, ez û zaf embazî zî tewlê na çalakîye bibê. Tenya Berlîn de zî nê, eynî roje Stuttgart de zî çalakî do biba. Soyin û peynî zî Norveç de kurdî dûştê dagirkeran û îşgalkeran de vengê xo berz bikerê.

Winî aseno ke rojên çetinî kurdan pawenê. Kurdî heta nika dûştê -kaşo- dewletê Îslamî lej kerd. Tenya erdê xo nê heme dinya û şarî pawit û starey da. Ewropayijî zî naye baş zanê. Ma çi wext yew Almanî/a reyde qisey kenê ma ra vanê ez kurd a, dîrek vanê ma şima ra zaf hes kenê, şima zey di qehremanana dûştê "isis" de lej danê. La ewro dinya serê kurdan de qumar kay kena. Sifte Almanya perwerdeyê pêşmergeyan da vindarnayîş, dima veyna eger pêşmerge nêbo hêz û qewetên do zey di însanana çinî yo reyna dest pêkerd, nika perwerde devam keno. Hetkarîya eskerî çîyên do girîng o.

Ewro zî wezîra Pawitişê Almanya eşkera kerd ke pêşmergeyan rê sîleh û cebilxane dayene do devam bikero. Wezîrîye eşkera kerdêne di ser meseleya Daeş di zaf vindert û devam kerd bawereyê ma Hukumetê Kurdîstan rê esta. Ê zî zanê, ê bi xo zî muhtacê ma yê. Eger ê serê ma de qumar kay bikerê ma do zî zey dê înana cewab bidê. Dewleta Terorîste ya Îran çend ser bikewo sîlle teyna ma rê nê înan rê zî çebîyeno. Itîyad Îran, Ewropa û Amerîkay rê zî sîlleyên do weş çekeno. Ez bawer nêkena ke ney bin de bimanê. Tayn mendo bi destê kurdana sîlleyên weş do bi çebîyo Îran rê.

Ma şênê vajê Dewletê Ewropa hende nêwazenê hetê yewerî bi eşkera tepişê. Nînan ra yew zî Fransa ya, Fransa zî wextê xo de zaf derbe werde Daeşî ra. Erîşkerê Daeşî bi sayena hemwelatijanê Fransa kişt. No çarçewa de Fransa kurdan zey mutefîkêno muhîm vînena. No soyin di, ê zî ser lejê Îraq û Kurdîstan de paştî da Kurdistan. Raybereya Kurdistanî qandê muzakere kerdene çend madeyî hazir kerdbîy. Nê madeyî zey cêrî bî:

•Encamê referandumê bi hawayo pasîf vindarnayene

•Adirbes îlan kerdene û vindernayîşê lejê.

•Destpekerdena dîyalog û muzakereyan

La Bexdad nê waştenanê Hewlêrî qebul nêkerd. Ney ra dima Wezîreya Karanê Teberî ya Fransa beyanetêk vila kerd û vat: "Qandê destpêkerdişê dîyalog, gamê Hewlêrî gamên do weş ê. Lazim o Bexdad zî ney qebul bikero". La Bexdad qebul nêkerd, kerd nêkerd çend girîng o nêşena vajo laberî ney zana ke kurdî tîya de maqul û heqdar yenê vînayene.

Çalakîyê ke Ewropa de benê, înan de yew mesajo girîng dîyeno. Yew finî ma Koln de şî çalakîye. Kurdê ma bi tirkî û kurdkî pankartî hazir kerdbîy û reyna sloganê ma zî tirkî û kurdkî bîy. Çalakîye ra dima mi tayn çapemenî û medyaya Almanan de vîna hela Almanan se vato. Tayn nuştoxê henekê xo ma ya kerdê, vatê ke temam şima tîya de çalakîye virazenê hol o, şima wazenê ma rê çîyên zî vajê o zî weş o laberî ma tirkî zî nêzanê kurdî zî û şima bi hezar al, alem, nîşan û flamayan çalakîye kenê ma nêzanê şima kamî yê? Mi heq dabî înan. Na kor eza hewnena tayn raşt bîyê bi hezaran alem çinî yo, amblemê partîyan zî çinî yê, amblemê serokan zî çinî yê tenya alayê Kurdistanî hewadaye bîy. Sloganê seroka çinî bîy yew slogan erzîyayên "Kurdistan!". Pankarta zî bi îngilîzî yan Almankî nuşnîyaybî.

Tecrubeya çalakî kerdenê kurdanê ma yê Vakurî Ewropa de nêzdîyê 35 serrî yo. La Kurdê başûrî newe-newe dest pêkenê la karê xo weş virazenê. Hêdî-hêdî zî o do weş bo. Bêguman ferqê vakurijan û başûrijan çinî yo ez tîya de wazena fahmkerdişê sîyaset û çalakîye nîşanê şima bida.

Her çî cayê xo de vindero ez wazena soyin de çîyên vaja ma zaf rojên tengî dîy heme raverdî nê do zî ravêrê.

Bawer bikerê do hol bo...

Zîyara Mewkanî

ARÊKERDOX: ZAZANUS

Zîyara Mewkanî dewa Licê Comelaş de ya. Gêlîya (Bi tirkî: Vadî) ke peyê dewa Comelaşî de ya, sey Mewkanî yena namekerdiş. Mewkan dewa Licê Kela (Çeper) ra dest pêkeno, derg beno û şino reseno dewa Şela Pîl. (Yukarı Turalı) Zîyara Mewkanî zî tam sînorê Comelaş û Şela Pîl de ya. Çekuya "Mewkan"î, çekuyanê "mîyan koyan" ra virazîyaya. "Mîyan koyan" bedilîyayo bîyo "Mîyakuwan". Herçiqas merdimê vîyarteyî çekuya "Mîyakuwan"î bixebitnê zî nika zafêr no ca bi çekuya "Mewkan"î name beno.

Zîyara Mewkanî û Sadulkafa (Eshabê Kehf) Dêrqamî (dewa Licê ya.) hemverê yewbînan de yê. Sadulkaf verojê koyî ra ya, Zîyara Mewkanî zî hetê corî ser, digûreyê koyî ra ya. Sûreya Kehfî de ayeta 9. behsê Sadulkaf û Reqîmî kena. Seba Reqîmî fikrê cîya-cîyayî estê. Tayê vanê "Reqîm nameyê koyî yo", tayê vanê "nameyê dêrî yan zî yê dewe yo." Labelê winî aseno ke na ayete de cayo ke bi Reqîmî name beyo Zîyara Mewkanî ya.

Qaso ke yeno vatiş verê serranê 1990î de, wexto ke hema dewî nêameybî veşnayîş û hema dewijan koçê şaristanan nêkerdibi, mileta ke Zîyara Mewkanî zîyaret kerdêne û tewafê na zîyarete bîn zaf bî. Labelê nika serre de di-hîrê rey hetê şarê dewanê derûdorî ra yena zîyaretkerdiş.

Şarê ke şinê na zîyare ser, ê ke mi dî zafê înan cinîyî bîy. Camêrdan ra tekûtuk kalê vîyarteyî şinê Zîyara Mewkanî ser.

Hişê şarê ma de her zîyar yan zî quba wayîrê yew mîsyonî ya; zîyar esta delûyan benê ser, zîyar esta qurbanê ke wedîyayê ser o serê birnenê... Zîyara Mewkanî zî zafêr cinîyê ke wazenê bibê wayîrê tutan/domanan zîyaret kenê.

Zîyara Mewkanî yew şikeft a û senî bîya winî ya. Çîyê ke hetê şarî ra virazîyayê çin ê. Binê yew kereyê xişnî de şikeftêka xorîn a û hetê verê şikefte de zî çend darê kevnarî estê. Cinîyê ke şinê na zîyare ser gilanê daranê kevnaran ra girêşan/potan girê danê. Ê darê kevnarî nika dûrî ra sey parçeyê qumaşî asênê.

---

1)Efsaneya zîyara mewkanî reya verên a ke arê dîyena û nusîyena.

2)Mewkan nameyê gelîka dergûdilayî yo (Gelî bi tirkî: Vadî). Dewa Licê Kela ra (bi tirkî: Çeper) destpê kena şina resena şela Pîl (dewa Hêni ya, bi tirkî: Yukarı Turalı). Hem ko hem gelî bi Mewkanî name benê.

3)Efsaneya Zîyara Mewkanî Comelaşa Licê de vajîyena, na dewe de, zaf ra tay her kesî na efsane eşnawita.



Efsaneya Zîyara Mewkanî

Hîrê merdimî seba kar û gureyê xo koyê Mewkanî de benê. Varitêka pêt dest pêkena. Nê hîrê merdimî seba ke nêbê hît, xo rê gêrenê yew setarîye. Binê kerî de yew şikefte vînenê û şinê zereyê şikefte. Çiqas şino varite zêdîyena, dere û derxoleyî debenê, laserî werzenê, kere û kuçî herikîyenê. Yew zinarêko xişn leyr/gilover beno yeno keweno fekê berê şikefte û berê şikefte bi temamî gêrîyeno. Hîrê merdimê ke şikefte de yê, kenê nêkenê nêeşkenê qulêk bivînê û bivejîyê teber. Çareyêk nêvînenê û xo erzenê bextê Homayî.

Hîrê merdiman ra yew vano:

-Rojêk bayê mi nêweş kewtibi, mîyanê cayî/livînan de bi. Mi ra tasêk awe waşte. Ez şîya, mi tasêk awe arde. Heya ez ameya bayê mi rakewtbi. Ez qimîş nêbîya ey hewn ra werzinî. Tasa awe mi dest de, verê sereyê bayê xo de ez vinderta. Demêk ra pey bayê mi bi hemdê/zerrîya xo hewn ra warişt. Mi tasa awe da ey, bayê mi bi zerrîya xo awe şimite. Ya rebbîl alemîn! Eke to qebul kerdo, ti nê kereyî bidê kalek, rayîrêk ma rê akê.

Leq gineno kereyî ro biney abêno, labelê hema nêeşkenê bivejîyê teber.

Merdimo dîyin vano:

-Rojêk ez keye de bîya, ber gina piro, ez şîya mi akerd. Yew cinî verê berî de bîye, xo rê gêrayne pars/geşt. Şeytan kewt binê mi û mi cinî ra îştekê karê pîsî kerd. Mi va "eke ti sey mi bikê, ti çiqas geşt biwazê ez do bidî to." Cinî hêrs bîye, hesrî kerdî war, geşto ke kom kerdibi zî fekê berî de verda û remaye şîye. Ez qahrîyaya, mi xo ra fedî kerd. Ez warişta mi tewbe û estexfîrulaha xo ard. Zereyê keyeyî de çi esto, mi her çî ra tay zexîre ard yew ca. Mi barê herî dekerd û ez kewta a cinî dima. Mi barê zexîreyî berd verê berê cinî de rona. Mi aye ra qusurê xo waşt û ez agêraya ameya keye. Ya pîlê pîlan! Eke to qebul kerdo, ti ma rê çareyêk bivînê.

Reyna leq gineno kereyî ro, kere bineyna dîyêno kalek. La hema zî nêeşkenê şikefte ra bivejêyê teber.

Merdimo hîrêyin zî dest pêkeno vano:

-Ez axa bîya. Kerîyêk biz û mêşinê mi estbîy. Di şiwaneyî ancax eşkayne miqateyê dewarê mi bikê. Şiwananê mi ra yew zaf jêhat bi; karê xo bidîqet kerdêne. Şiwaneyo bîn sist bi; erey ameyêne û rew şîyêne, karê xo zî qasê şiwaneyê bînî bidîqet nêkerdêne. Rojê înan debîyayî, mi heqê înan seypê da. Şiwaneyê jêhatî va "ez rew yena erey şina û hîna zaf dewarî ser o vindena, gere heqê mi zêde bibîyêne." Û dest gure ra verda, heqê rojanê ke xebitîyabi zî nêgirewt û şi. Mi zî vera heqê xebata ey mîyanê mêşinanê xo ra ey rê yew mêşine cîya kerde. serre bi serre mêşinê ey zêdîyayî û qefleyêk resayî pê. Demî şî û dewranî ameyî, rojêk dême no şiwaneyê mi beno muhtac. Kemanîya ey virazîyena û muheqeq destê ey zî teng beno. Warişt ame keyeyê mi heqê xo yo ke mendbi mi ra waşt. Ez kewta mîyanê dewarî, mi qefleyê ey cîya kerd. Şiwaneyî, mi ra va "axayê mi, ez seba talankerdişê malê to nêameya, heqê mi çi yo ê bide mi ez şina". Mi va no talan nîyo, roja ke ti şîyî mi to rê yew mêşine cîya kerdbî. Mêşinê to zêdîyayî û no qefle resa pê... Bi no hawa mi şiwane îqna kerd û şiwaneyî mêşinê xo berdî. Ya rebbî! Eyan û melumê to yo. Eke to qebul kerdo ti ma ro bêrî rehm û ti nê kereyî bi qewet û îzetê xo bidê kalek.

Leq gineno kereyî ro, kere dîyêno kalek, berê şikefte abêno.

Nê hîrê merdimî, herçiqas kere wedarîyo û berê şikefte abîyo zî semedo ke bîyê şahidê qewet, îzet û pîlîya Homayî şikefte ra nêvejînê. Vanê "Homayî bi pîlîya xo ma peyê nê zinarî ra xelisna, ma zî na şikefte ra nêvejînê û Homayî rê şikir û zikir kenê", agêrenê zereyê şikefte û xeybênê benê vindî.

Uca ra nat na şikefte sey zîyare qebul bena û yena zîyaretkerdiş.

Gelo sunet ferz o?

ELÎDA ZERRÎ

Heredot vano ke; 'sunet dinya de emelîyeto tewr verên o' Wexto verên de îlaheyî (tanrıçayî) estbîy. Şarî nê îlaheyan rê bawer kerdêne. Îştar û Kîbele zî di îlahe bîy. Ê wextan şarî penîsê camêrdan birnayêne û pêşkêşê înan kerdêne.

O wext zafaneyê komelan maderşahî (anaerkil) bî. Şarî dima vato; 'ma ganî penîsê camerda êdî binê ra nê tîke bibirnê, eke ma pêro bin ra bibirnê zurîyetê ma dewam nêkeno û eslê ma beno vîndî.

Hz. Îbrahîm Îsayî ra ver (ÎV) seserra 2. de pêro yahudîyan rê sunet ferz kerdo. Vato; 'Homa mi rê wina emir da. Va "ganî ometê to sunet bibo." Coka nika zî gama ke yew domanê yahudîyan maya xo ra bî, heşt rojî dima ganî muheqeq bero sunet kerdene.

Ê wextan xora şaristanê Hîtît de zî edetê sunetkerdiş estbî. Ancî Îsayî ra ver (ÎV) seserra 3. de Misir de zî no edet estbî. Ma zanê ke tayê mumyayê sunetkerde estê. Tayê cigêrayoxan vanê ke tarîxe sunetî hetanî Luvîyan reseno.

Nika zî mîyanê yahudî, sabî, suryanî, musulman û xrîstîyan. Rasta xo amancê sunetî, hadimkerdişê camêrdan o. Sunet mîyanê Quran de çin o. Yanî nêno vatiş ke pêro camêrdê muslumanî sunet bibê, labelê mîyanê şartî de seke esto qebul beno.

Hz. Muhammed zî sunet nêbîyo. Vanê; xora Hz. Muhammed wexto ke maya xo ra bîyo sunetkerde bîyo. Coka sunet nêbîyo. Labelê na mesela rîvayet a.

Homa ayetê xo de vano; "Şima bequsûr ê. Bedenê şima de qet qusûr çin o, bedenê şima ra yew çîyo noksan yan zî zêde çin o." Madem wina yo yanî bedenê ma bêqusûr û bêxeta yo şima çira domananê xo sunet kenî? Şima bin o qayde Homayî rê şîrk nêkenî?

Hem îradeyê domananê şima çin o. Beno ke wexto ke bîy pîl şima ra vajê "şima çira ez sunet kerda, hem zî bêîradeyê mi?" Çimê mi de no suc o.

Raşta zî yew faydeyê sunet çin o, hetta zerar dano domanê/lajanê şima. Sunet pêro domanan ser o yew travma virazeno. Psîkolojîyê înan xerîpneno. Hetta nika taye doktorî vanê: "sunet zaf zerar dano sihetê domananê şima. Yanî xulasa ez vana ke domananê xo sunet mekere.'

Labelê mîyanê şaranê musluman de sunet zaf muhîm yew edet o. Vanê; sunet ferz o. Kes zî nêeşkeno ke vajo; ez domananê xo sunet nêkena, yan zî ez bêsunet a. Komel ê domanan û ê camerdî ca de afaroz keno. Kes nêaftereno vajo sunet zerar dano ma û sunet yew edet o, mîyanê îslamî cayê ey çin o.

Labelê ez bi xo vana. Kam mi afaroz keno wa bikero. Umrê mi de nîyo. Eke yew roje lajê mi bibo, ez lajê xo sunet nêkena. Ez ey rê na xirabîya nêkena. Wexto ke bî pîl, bî îradeyê xo se keno, wa biko.

Ganî şima biney biwanî û pers bikerî; no sunet ça ra/kotî ra vejîyo, feyda û zerarê ey çi yê?

Labelê zerarê ey umurê kesî de nîyo, edet û bawerî her çîyî ra muhîm ê, sihetê domananê înan ra muhîm ê. Şima bizanê ke sunet bîyayîş sihetê domananê şima rê zerar dano. Îhtîmal o ke domanê şima yew roje wexto ke bîy pîl şima ra hesab bipersê. Çunke înan bêke tesdîqê înan bigêrê sunet kenê. Coka mi va, sunet suc o.

Mîyanê xirîstîyanan de zî cayê edetê sunetî esto. Raşt o.Dewletê Yewbîyayeyî yê Amerîka (DYA) de tayê doktorî vanê ke; "eke yew camerd nêweş bo; mesela nêweşîya prostat ey de bivejîyo yan zî eke şehvetperest bo yanî zaf seks biwazo, ma o wext ê camêrdî sunet kenê." Çimkî sunet penîsê camerdan de zafê hucreyanê sînîrî keno puç. Coka hazê cinsî yê camêrdan hetanî %50-60 gineno war. DYA de no semed ra sunet cayê sunetî esto. Dinya de yew teşkîlatê/dezgeyê sihetî çin o ke vajo; sunet baş/hol/rind o, faydeyê ci esto.

Labelê DYA de sunet bîyo gureyo tîcarî. Eke doktor yew domanî sunet bikero, dewlete pere dana ey. Doktorî semedo ke ci ra pere qezenc kenê wazenê hîna zêde domanan sunet bikerê. Aye ra vanê "sunet hol/baş o, sihetê şima rê faydeyê ey esto, hîjyen o, felan bêvan."

Ê zurî kenê! Posteyo ke sunetî ra maneno, semedê şîrketanê kozmetîk û îlacî de zaf biqiymet o. Pisporê Teşkilatê Sihetê Dinya (WHO) vanê ke; "Dinya de %30ê nufûsê camerdan sunetkerde yo." Ecêb!

Sunet îcraatêko tebîî nîyo. Yew parçeyê/leteyê merdimî birnenê û erzenê, bîlasebeb! Ez reyna vana sunet hem îcab nêkeno hem zî ferz nîyo. Bawerîya ma de, îslam de cayê sunet çin o. Şima biney zehmet bikî, bipersî û biwanî. O wext şima zî vînenî ke sunet tik û teyna yew edet o, Quran de nêvîyareno.

Edetê sunetkerdişî îslamî ra ver zî estbî. Raşta xo yew tradîsyonê/edetê pagan o. Yanî no edet teyna komelanê îslamî de nêno tetbîqkerdiş, pêro komelan û bawerîyan de zî estbîyo û hema zî esto.

Heyf ke dinya de teyna camêrdan sunet nêkenê tayê cayan de cinîyan zî sunet kenê. Rojhîlatê Mîyanên û Afrîka de sunetê cinîyan zaf vila bîyo. UNÎCEF serra 2013î de vato ke; "Nika dinya ser o 125 mîlyonî ra zêdeyêr kênekê qijî sunetkerde yê."

Amancê sunetê camêrdan û yê cinîyan zeypê yo. Mîyanê komelî de temînkerdişê meşruiyet o û hazê cinsitîye kêmî kerdene yo.

Nijerya sunetê cinîyan qedexe kerd. No zaf muhîm yew qerar o. Homa biko sunetê camêrdan zî qedexe biko û teyna Nijerya de ney, Homa bikero her cayê dinya de Homa sunet binê ra bero qedexê kerdene. Dinya de pêro domanî na bela ra bixelisîyê.

Herkes ganî çimê xo akero. Mesela domanê ma yî, sihetê înan o. Heqê ma çin o ke psîkolojîya domanan ser o yew travma peyda bikerê. Travmayêka pîle.



Naxir se kene wa bikero ganî şima zî winî bikerî? No rast o yanî? Ney. Her tewir naxirî ra dûrî vinderî, meraq mekerê verg şima nêtepîşeno.

Seyîd Riza

SERDAR ROŞAN

wa Elîşêr û Zarîfa bêrê vîrê to meşo
bewnî tarîxî ra meşo
rom xayîn o gidî meşo

seyîdê mi werişt şefeqê sibayî
hêvîya ey bî, walîyê erzinganî
wa bêro, vatibi alpdoganî
seba seyîdî faqe ronaybî

seyîd ard, kerd zindan de
înan veng da ey meydan de
heme cayan de kerd halan
va, ma girewto bazê kalan
bizanê ma do tim vergê harî bê
şima zî do hergu hewe şamîya maran bê

saete duwesê şewe
seyîd berd dadgehe
qerar da înan a game
do îdam bikerê, a sehere

înan ard rasteyê sêdare seyîdê min
reşik huseyîn uca bi, lacê seyîdê min

reşik xortêko ciwan û çeleng o
porê ey bereqêno hewtreng o
reşik xortêko delal û ciwan o
temenê ey, yê hewtes serran o
pay de puncê dergê nexşînî
manenê nexşeyê kurdîstanî
înan reşik berd verê çimanê babî de
xeleka sêdare kerde milê ê lacî de
reşikî verê xo da bawoyî
va: bawo, wa miletê kurdan weş bo!

seyîd leze şi verê sêpike
sereyê xo kerd xeleke
darê binê lingan ro, paskilêke da
o wext ruhê xo verada
seyîdê min dorê xo geyra
awire ey ewnîyayne reşikî ra
çimê ey akerde mendîbî
ewnîyayne hetê Dêrsimî ra

romîyan va, halan û talan o
bigîrê, bikişê, biveşnê nê belayan
û eşt serê dew û banan
ne va kal, ne pîr, ne ciwan
dayî xo ver sey revdê vergan
kênayê xamayî, vêkê destbiheneyan
zinar û devîyan ra xo eşt înan
semedo ke nêkewê destê romîyan

awa Munzirî bibî sûre
hene nêbi, gonîya xortanê derûdore
dêrsimicî remayîbi koyan
da înan dima verganê haran
şikeftî pirr bî, bi doman û kal û pîran
romîyan ê girewtî sey êsîran
fekê şikeftan girewtî
zere de, ê bi adir sotî

zere ra ameyne vengê hawar û fîxanan
kal û pîrî, torinî veşayne sey dar û maxan
no bi medenîyetê romîyan
nê bî tedîb û tenkîlê înan
na bî komara vergan
na bî serre hezar û new sey û hîris û hewt
û heştan*

Swêd, hamnan 2005

_____

(*)Na şîîre seba vîrardişê Seyîd Rizayî û hevalanê ey ê kurdperweran nusîyaya ke dewleta tirkan roja 18 teşrîne 1937 de ê îdam kerdî.

A ke To rê Biveşo Maya To ya*

FÎRUZE DEMÎR

Rojê lajêndê pîrekê beno, ney zewijnena, cinîya ci vana: ya ez ya maya to, vana na ma rê bîya bela, naye se kenê bike, bere cayê wa çimê ma ci nêguno.

Mêrdek zî, bêşeref o, mara xo dekeno çuwalê mîyan û beno çekero ro. No beno çiwalî bino rayo şino, qay linga ci koyena sîyêna werdî ro/ çaxilê ro, çîyê ey nêbeno, hema maya ci çiwalî mîyan ra vana oxil se bî linga to? Bokarê lingeka to nêtewê, mi va qay zerrîya mi koyê sîyer a. Lajê ci vano nê dayê nê, teba nêbî, linga mi hende nêtewê, çîyê çin yo. Û ne sevcêr ne weraz beno roy mîyande veradano. Goştareya cinênîrda xo keno, marda xo ra beno.

zerrîya mayan bênamûsa, ewlad mar ra beno la may ewladî ra nêbena.

Na mesele babetna zî vajîyena:

Mara xo dekeno qufayê mîyan beno ke çekero ro, maya ci vana oxil a qufaya xo fina bere keye, ti hende bewnîyê to rê zî rojê lazim bo. Laj taye fikrîyeno vano; ez bîya xînt ez a qandê keyner da şarî mara xo çekena, mara xo fina keno qufa mîyan û gêno beno keye, cinêr da xo rê vano; to kena qurbanê marda xo qebul kena winayo, nêkena ray aya.

Eke wirdina pasajan kes muqayese bikero, her ewlad sey pêya nîyo, ewlad esto rind o, ewlad esto ke xirab o.

Goreyê pasajê sifteyênî eke kes bewnîyo; zerrîya maye senîn a ewladî rê, ê ewladî senîn a mar rê. Ewladî cinî dîya may sekeno! Verîna vajîyayo.

Qisayêna kurmanckî esta vanê; jinik li ser kolê, dayik li ser siloyê. Bi kirmancî: Cinî kolan ser o, dayike siloyî ser o. May sekero pey qay waştî mar vêrîya goreyê taynan.

Ney ra wa kes xo gore mehnena nêvejo, vatişê mi waştêra xo nêhesibnayiş nîyo tabî. Cayê waştêr cayo cayê mar cayo, nê vatişî ez merdimandê xiraban ser vana, la wa kes nêvajo ez qedra marda xo bizana waştêr vereda yan zî qedra waştêr bizana mara xo verada. Camêrd ke camêrd bo mîyabeynê mar û waştêr bi xo keno rinde. Gerek aîleyande pêzanayiş bibo ke edaletîn zî bibo. Pêzanayiş ke çinêbo edaletîn wertede nêmanena. Ya mar ra ya waştêr ra bîyayiş yeno meydan. Hizûrê ê keyî nêmaneno. Waştî waştîya may maya. Cinneto lingandê mar binedi la mayê xirabî zî estê, waştîyê xirabî zî estê.

---

1)Qufa/Sele: Qamîş ra zî azidûr ra yan zî vilayêr ra virazyena, însana verî zerzewatê xo qufayana kirişte, sapê xele û cewî ra zî sel û sepetî wiraştê.

**Na mesela hetê Çêrmûge û Sêwregi de vajîyena.*



Kurmê darê ne ji darê be dar hişk nabe



SEÎD VEROJ

Peyv û gotinên ku bi kin û kurtayî naveroka bûyerên 16ê cotmehê bîne ziman, belkî ev gotina pêşiyan e ku bûye sernivîsa van rêzikan. Di roja 16ê cotmehê de kûdetayeke nav rêxistinî û leşkerî ji aliyê komeke rêvebir û endamên YNKê ve hat pêkanîn. Ev kûdeta, berdewamiya planên hewldanên dagirkirina Kerkûkê û pûçkirina encamên gişt pirsiya serxwebûna Kurdistanê bû. Di encama vê de, li bereya Kerkûkê pêşmergeyên Kurdistanê şikestin û bi paş ve vekişiyan, Kerkûk ket destê hikûmeta Îraqê. Vekişîna ji Kerkûkê, lawaziyeke girîng di xeta parastina sînorên Kerkûkê û yekrêziya siyasî ya Kurdistanê de peyda kir, herwiha îhtimala şerekî navxweyî û parçebûna başûrê Kurdistanê jî derxist holê.

Ev rewşa hanê, bandoreke pirr girîng li ser serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê kir. Digel vê, gef û zextên dewletên herêmî û navneteweyî jî bûn sebeb ku pêşmergeyên Kurdistanê bi tevayî vegerin ser sînorên dema beriya êrîşên DAÎŞê yanî sala 2014an. Herwiha ev yek, wekî şertê destpêka diyaloga navbera Kurdistan û hikûmeta Îraqê jî hate nîşandan. Di encama vê de, ji bajarên wekî Xaneqîn, Duzxurmatû, Mexmûr û Şingalê jî pêşmerge vekişiyan û ev der bi piştgiriya hêzên leşkerî yên pasdarên Îranê, ji aliyê artêşa Îraqê û Heşda Şabî ve hat dagirkirin.

Piştî êrîşên hovane yên DAÎŞê ji nû ve dagirkirina gund û bajarên Kurdistanê ji layê Heşda Şabî ve, pêla zilm û zordestiyeke nû li ser miletê Kurdistanê da destpêkirin. Bi sedan xelkê sivîl û medenî yên bêtawan hatin kuştin, xaniyên wan hatin sotin û xerakirin, bi deh hezaran jî hatin koçberkirin ji bo bajarên Hewlêr, Silêmanî û Dihokê. Hîn travmaya DAÎŞê nehatibû jibîrkirin, yeke nû bi serê wan ve hat. Hezar mixabin ku vê carê jî destê hemnijadên Kurdan di vê kiryarê de hebûn, diz ji malê bû, kurm ji dara hewşê bû. Ku şûna berjewendiyên neteweyî jî kerb, kîn û nefreta takekesî, destkeftiyên grubî, şexsî û malbatî



Tişta ku di 16ê cotmehê de qewimî, îxaneteke siyasî bû, tiştên wisa tenê li Kuristanê çênebûne, di gelek welatên dinyayê de bûyerên wisa çêbûne. Îxaneta li Kurdistanê, îxaneta li hemberî daxwaza serxwebûn û dewletbûna miletê Kurdistanê ye.

bigire, lihevanîna îdeolojiya hevkariya bi dagirkeran re jî temam dibe. Tenê dimîne firseta tetbîqkirina wê.

Bi tevî hemû gef û astengan, pêkhatina referandûma serxwebûna Kurdistanê û rêjeya bilind a erêkirinê (93%), xewa dagirkerên Kurdistanê, hevalbend û hevkarên wan jî diheriman. Plangeriya wan a ku di pêvajoya pêkhatina referandûmê de dest pê kiribû, ceribandineke wê ya herî girîng, hewldana roja 24ê Îlonê bû ku bi ser meclîsa bajarê Kerkûkê ve girtin û xwestin Kerkûk li derveyê referandûmê bimîne. Lêbelê ev hewldan jî ji aliyê hikûmeta Kurdistanê ve hat pûçkirin.

Pûçkirina vê hewldanê, îxanetkar û gruha nava YNKê û hevkarên wan ên dagirker har kirin. Diviya ji wê gavê şûn ve tevdîr û hesabên planên nû yên dagirkeran bihata kirin. Kêmasî û hesabnekirina li ser plan û hewldanên xerabkariya hêzên hundir û derve, di bin mesuliyetiya serkirdayetiya siyasiya Kurdistanê û bi taybetî jî yê YNK û PDKê de ye. Divê muhasebeya vê yekê di demeke aram de bête kirin.

Tiştê ku di 16ê cotmehê de qewimî, îxaneteke siyasî bû, tiştên wisa tenê li Kuristanê çênebûne, di gelek welatên dinyayê de bûyerên wisa çêbûne. Îxaneta li Kurdistanê, îxaneta li hemberî daxwaza serxwebûn û dewletbûna miletê Kurdistanê ye. Bêguman sebeb û aktorên wê yên hundir û derveyî hene, divê em vê rewşê rast bixwînin û dersên pêdivî ji wê derxînin. Li gor dîtina min:

•Dagirkirina Kerkûkê, ne tenê ji ber encamên referandûmê û ne jî tenê planeke dewleta Îraqê û herêmî bû, ji ber girîngiya jeopolîtîk û petrola wê, encama lihevhatineke herêmî û navneteweyî bû.

•Di serî de berjewendiyên hêzên navneteweyî yên wekî DYA, Brîtanya, Çîn û herwiha dewletên herêmî yên wekî Îran, Tirkiye û Îraqê naxwazin di rewşa îro de dewleteke serbixwe ya Kurdistanê çêbibe.

•Digel vê rewşa siyasî ya herêmî û derveyî, li Kurdistanê siyaseteke neteweyî ne baladest e, yekrêziya siyasî û sazgêriya Kurdistanê lawaz e, ev yek rê vedike ji mudaxaleya derve re û cesaretê dide xerabkariya siyaseta kêmneteweyî ya îxanetkaran.

•Wekî hemû dinyayê di Kurdistanê de jî berê siyaseta kêmneteweyî ber bi paytexta dewletên dagirker ve ye. Wisa xuya ye ew Silêmaniyeya ku weke "paytextê rewşenbîriya Kurdistanê" tê nasîn, ew jî ketiye ber bayê vê siyasetê. Lewma li wê derê rêjeya erêkirina serxwebûna Kurdistanê pirr kêm bû û li hemberî kûdetaya nava YNKê jî bêdengiyeke mezin berdewam dike.

•Li hember erîşên Heşdê Şabî û hevkarên wê, serkeftina parastina pêşmergeyan; têkşikandina çekên Amerîkayî û şikestina pasdarên Îranê, nêrîn û helwesta raya giştî ya dinyayê bi aliyê Kurdistanê ve diguherîne.

•Di dawiyê de wisa xuya ye, rêjeya îradeya gelê Kurdistanê û bûyerên pêkhatî, diyar kir ku ji xeynî serxwebûnê tu çareseriyeke din nikare aramiyê bîne herêmê û bi hemû pêkhateyên xwe ve gelê Kurdistanê azad û bextewar bike.

•Lêbelê rêya serxwebûnê ne rêyeke rast û bê asteng e, di vê rê de gelek hevraz, nişûv, kendal û zîvir hene. Divê em bi sebr û bawer bin.

Dagirkirina Kerkûkê, ne tenê ji ber encamên referandûmê û ne jî tenê planeke dewleta Îraqê û herêmê bû, ji ber girîngiya jeopolîtîk û petrola wê, encama lihevhatineke herêmî û navneteweyî bû.

Kerî

FERAT KEVIR

Di dîrokê de hunermendên mîna Yılmaz Güney kêm in. Ji ber ku em karibin vê peyvê di derheqê wî de bejîn di destê me de pir nimune hene! Di dîroka sînemayê de derhênerek ku derfetên çekirina fîlman kêm ketiye destê wî de yek ji wan jî Yılmaz Güney e! Gelek fîlmên wî û senaroyên wî sansur bûne û hinek fîlm jî ne ji aliyê wî ve hatine kêşandin. Li hember evqas zext jî fîlmên Güney mohra xwe li dîroka sînemayê dane û bi van fîlmên xwe xelatên serkeftî standine!

Yilmaz Guney di destpêka salên 60 de li Tirkiye di nav sînemaya Tirkan de wek Kurdekî dest bi sînemayê kiriye! Kurdbûna wî û çepgiriya wî hercar wek diwarekî di pêşiya wî de sekiniye û Yılmaz Güney xwestiye ku her gav vî diwarî ji holê rake û hunera xwe bi gel re parve bike! Hinek fîlmên Güney ên serkeftî ne ji aliyên wî ve hatine çêkirin! Dema çêkirina van fîlman Güney ya di zindanê de bû an jî surgun bû! Lê bes bi vî halî jî qontrol di destê wî de bû û bandora xwe li ser fîlman dida hîs kirin!

Fîlma Kerî (Sürü) jî yek ji wan fîlmên Güney e ku senaryoya wê di zindanê de nivîsandiye û film ji aliye Zeki Ökten ve hatiye çêkirin. Filma Kerî di bingeha xwe de fîlmekî sînemaya Kurdan e!

Çepgirî û Kurdbûna Güney di fîlma Kerî de...

Di piraniya fîlmên Güney de navên qarekter, çîrok û paşxaneya fîlman Kurdewar in û Kurdî ne! Ev gotin di fîlma Kerî de jî piştrast dibe. Çepgirî û Kurdbûna Güney di fîlma Kerî de tişta ku herî zêde xwe dide pêş e! Li pêşiya kamerayê qarekter bi tirkî diaxivê lê di paşxaneya dîmenê de dengekî nizm tê guhê me ew deng jî bi Kurdî diaxive! Ji ber qedexeya zimanê Kurdî Güney li gor xwe çareseriyeke wisa dîtiye û li gor min heya salên 90î jî li Tirkiye sînemaya Kurdan di filmên Güney de di xwe di paşxaneyê de xwe hilandiye û xwe li benda sînemagerên Kurd hiştiye!

Fîlm li Çiyayên Berwarî li zozanên herêma Botan hatiye kêşandin. Navên ku di fîlm de hatine bikaranîn hemû Kurdî ne! Dever axa Kurdistanê ye çîrok, cil û berg ên Kurdan e! Lê qarekterên fîlm bi tirkî diaxivin û fîlm di nav sînemaya tirkan de tê pejirandin! Li gor şert û mercên dema çêkirina fîlm ev jî serkeftinek e! Güney bi hunera xwe çand û zimanê Kurdî li hember ewqas zextan di fîlmên xwe de bikar aniye! Di dîroka hunera Kurdan de mînakên wisa pir in; helbestvan, romannûs, stranbêj hwd. ev hêl bi serê xwe xwedî girîngiyekê ye û mijara nivîsên dirêj e! Niha em vegerin fîlm.

"Zozanên çiyayên Kurdistanê bilind in!"

Zozanên çiyayên Kurdistanê bilind in! Keriyên pez li zozanan diçêrin û jin diçin bêriyê. Koçer di bin konên xwe de amadekariya zivistanê dikin. Jiyan zor e zehmet e lê koçerî şêweya jiyana bav û kalan e! Tiştekî din jî ji bav û kalan maye ku qet li çanda Kurdan nayê! Ew jî doza xwîndariyê ye! Li Zozanên Berwarî di navbera du eşîrên Kurd de xwîn rijiyaye! Li gor qanunên civakê sekinandina xwînê jî bi keçdayinê pêk tê. Bêrîvana eşîra Xelîlan û Şivanê eşîra Weysikan ji ber xwîna di navbera du eşîran de bisekine û aştî pêk were bi hev re hatine zewicandin. Lê bavê Şivan serokê eşîra Weysikan Hamo aştiyê xera dike û Bêrîvanê qebul nake û wê weke kesek bi lanet dibîne! Bêrîvan û Şivan wek mirov bûne du amûrên aştiya navbera du eşîran! Li ser hest û jiyana du mirovan du eşîr li hev hatine lê fîlm dide xuya kirin ku çareserî ne ev e!

Hişkbûna çiyayên Kurdistanê li dil û mêjiye Hamo daye! Ji bilî Şivan û Bêrîvanê herkes ji vê bazarê poşman e lê veger nin e! Birayên Bêrîvanê hewl didin xeletiya xwe serast bikin lê Bêrîvan xwe dike pişt Şivan! Êdî spargeha Bêrîvanê Şivan e!

"Herdû evîndar di navbera du eşîran de asê mane"

Di serê fîlm de Bêrîvan du heb kewan di qefesê de xwedî dike! Ew kewên di qafesê de jî tîmsala Bêrîvan û Şivan in!



Fîlm li Çiyayên Berwarî li zozanên herêma Botan hatiye kêşandin. Navên ku di fîlm de hatine bikaranîn hemû Kurdî ne! Dever axa Kurdistanê ye, çîrok, cil û berg ên Kurdan e! Güney bi hunera xwe çand û zimanê Kurdî li hember ewqas zextan di fîlmên xwe de bikaraniye!

Ev herdu evîndar di navbera du eşîran de ase mane. Konê wan ji wan re bûye qefes hewl didin derkevin lê Hamo weke nêçirvanekî xefk vedaye! Bêrîvanê li ber kona xwe darek danaye. Ev dar mîna Bêrîvanê zêif û bê hêz e. Diyar e wê ew dar hişk bibe wê ew kon di serê Şivan û Bêrîvanê de xira bibe!

Bêrîvan piştî ku zaroka wê ya sisêyan jî dimire êdî hêviya xwe ji jiyanê qut dike û wek protest jî bertekê disa bi beden û giyana xwe dide! Wendakirina sê zarokan ji Bêrîvanê re zêde tê ji ber wê jî lal dibe! Bêrîvan dikeve rojiya dengbirînê! Şivan çiqas hewl dide ku wê bide axavtin lê çare nake! Li gor Bêrîvanê axaftin bê wate ye û çareserî ne di axaftinê de ye! Ya rastî ew jî nizane çareserî di çi de ye! Sekna Bêrîvanê ya bêdeng roj bi roj laşê wê dihelîne!

Hişmendiya Hamo û Enqere di deverê de dibe yek


Dema trên dikeve peytexta tirkan Enqerê Şîvan dibêje ku Enqere mezin e û em ê dermanê te li Enqereyê bibînin! Tê vê êşê ji ser xwe bavêjî hindik ma lê di wê navberê de zilamekî çepgir tê gulebarandin û di nav xwînê de dimîne! Di derba diyalogê de qewimandina bûyera diyalogê bi me berovajî dide xwendin ku heya îro Enqere ji tu derdî re nebûye derman!

Hişmendiya Hamo û Enqere di deverê de dibe yek û êdî cihê Hamo Enqere digire, tenê şêweya zilmê tê guhartin û dîsa xwe li ser Şivan wek Enqere dide berdewam kirin. Şivan lawaz bû lawaz ket! Tişta ku bi Hamo kiriba bi yekî din kir û têk çû! Mirina Bêrîvanê jî li wî warê tevlîhev û bêwate dibe! Tişta trajîk jî xijikandina termê Bêrîvanê ye! Ruyê Enqereyê ewqas sar e ku di hişmendiya ku ava kiriye de rêz ji miriyan re jî nine! Ma gelo niha heye?



Di piraniya fîlmên Güney de navên qarekter, çîrok û paşxaneya fîlman Kurdewar in û Kurdî ne! Ev gotin di fîlma Kerî de jî piştrast dibe. Çepgirî û Kurdbûna Güney di fîlma Kerî de tişta ku herî zêde xwe dide pêş e!

Keda 30 Salan bû Pirtûk





Berhevkar Murat Akkuş di 30 salan de, 6 hezar 650 biwêj û pêşgotinên Kurdî bi taybet li Îdir û herêma Serhedê berhev kirin û ew bi navê 'Gotin û Biwêjên Kurdan' wek pirtûk çap kir.

GÖNÜL GÜN

Ji ber rewşa ku Kurd û Kurdî tê de ye hin Kurdên dilsoz û xîretkêş bi salan hewl dane û li pey şopa kelepora xwe ketine. Yek ji van Murat Akkuş e ku li qadê 30 sal e 6 hezar 650 biwêj û pêşgotinên Kurdî berhev kirine. Akkuş ev biwêj û pêşgotin bi taybetî li bajarê Îdir û derdora herêma Serhedê berhev kirine û ji van biwêj û pêşgotinan pirtûkek pêk aniye. Berhevkar û rojnameger Murat Akkuş ji Heftenameya Basê re di derbarê xebata xwe ya 30 salan a li ser kelepora Kurdî de axivî.

Di 17 saliya xwe de dest bi berhevkirinê kiriye

Murat Akkuş eslê xwe ji Îdirê ye û rojnamegeriyê dike. Akkuş ji 17 saliya xwe û heta niha li qadê biwêj, pêşgotin, çîrok û stranên gelêrî berhev kirine. Akkuş li ser vê yekê dibêje, " Ez li dibistanê hînî zimanê Tirkî bûm. Berî ku ez vê biryarê bigirim min qet pirtûkên Kurdî nedîtibûn. Lêbelê kalikê min û bavê min behsa nameyên Mele Mistefe Barzanî yên ku şandiye serokên herêmê dikirin. Min di 17 saliya xwe de bi nivîsandina gotinên stranan dest pê kir û di heman salê de jî biryar da ku biwêj û gotinên pêşiyan berhev bikim. Tu kes ne rê nîşanê min da ne jî min ji kesekî/ê îlham wergirt. Dema ku min pirtûkên Tirkî dît xwe bi xwe got çima Kurdiya van pirtûkan jî tune ye û wisa dest bi nivîsandinê kir."

"Li ser mijarên jin, mêr, ajal, xweza, evîn..."

Murat Akkuş axaftina xwe wiha didomîne, "Min serdana gelek kesî ji jinan bigire heta mêr, ciwan û kesên kal û pîran kir û dest bi berhevkariyê kir. Pênc heb, deh heb nivîsand. An li dawetekê an li ciyê şînê, an li dikanekê an jî di sohbetekê de bi kurtî bibêjim her li ku derê di nav gotinên merivan de biwêj û pêşgotinek derbas dibû min hema li cem xwe dinivîsî wexta ku diçûm malê min ew derbasî lênûska xwe dikirin. Min lênûsk jî ji tomerî-firoşê ku xurek danî dikana gund kirîbû û lênûsk hê jî heye. Li gorî salan şiklê nivîsa min guhêriye. Ji 17 saliya xwe û heta 2016an biwêj û pêşgotinên ku min berhev kiribû di 2017an de çap kir. Di vê pirtûkê de, hûn dikarin bibînin ku Kurd li ser mijarên jin, mêr, ajal, xweza, evîn, sex, şer, aştî, hezkirin, êş, cîhan, zarok, egîdî, xiyanet, huner, hunermend, komedî, lîstik, ol, bawerî welhasil çi fikirîne û çi gotine dikarin bibînin. Bi kurtî ji bo vê pirtûkê dikarin bibêjin ku " ji her aliyê ve Kurd." Ez vê pirtûkê wek hemû kurteya tecrûbeya jiyana miletê Kurd dibînim. Hûnê di vê pirtûkê de, biwêj û pêşgotinên ku heta niha nehatine nivîsandin û heta niha nehatine bihîstin bibînin."

Berhevkirina 6 hezar 650 biwêj û pêşgotinên Kurdî

Berhevkarê Kurd destnîşan dike ku 6 hezar 650 heb biwêj û gotinên pêşiyan bi taybet ji bajarê Îdir û herêma Serhedê bi giştî li hemû erdnîgariya Kurdan berhev kiriye û Akkuş wiha axaftina xwe berdewam dike,"her çiqas hindik be jî min cî da gotinên Kurdên navdar jî. Her wisa min gotinên miletê Kurd ên ku li ser navdarê xwe gotine jî nivîsi. Li ser meselê, min cî da li herêma Serhed û Erîwanê gotina ku bo Mele Mistefa Barzanî, "Mela Mistafa Barzanî tu serokê me hemû Kurdan î, Mela Mistefa Barzanî tu serokê me Kurdê nezan î" Wek tê zanîn sefera Rûsyayê ya Barzaniyê rehmetî li Serhedê bi awayekî eleqedar hatibû şopandin. Ji aliyê din min biwêj û pêşgotin li gor rêza alfabayê rêz kirin."

Wek tê zanîn di biwêj û pêşgotinan de meriv li ser gelek mijaran tecrûbe û dîtinên pêşiyan dibîne û Akkuş wiha behsa taybetmendiyên biwêj û pêşgotinên Kurdî ku berhev kirine dike, "Ez di vê xebata xwe de hîn bûm ku zimanê gel objektîf e. Di zimanê gel de ciyê sansûr û eybê tune ye. Gotin û biwêjên ku hatine jiyîn ên li ser sex, hezkirin, evîn û li ser mijarên din bala min kişand. Ev xebat bû sedem ku milet û dîroka miletê xwe baş nas bikim. Wekî din, balkêş e ku ji bilî gotinên ku nirxekî zêde dide jinê, ez rastî gotinên ku jinê zêde piçûk dixe jî hatim lê belê min ev nexistin pirtûka xwe. Bi rastî, hin gotin û biwêjên bibandor ku li ser mijarên din hene rê nîşanî serdema me ya niha dike."

Pirtûkên gotinên stran û çîrokan bo çapê amade ne

Akkuş wiha behsa zehmetiyên dema ku li qadê berhevkariyê dikir, dike "Wexta ku min bo berhevkariyê serdana hin kesan dikir û digot 'biwêj û pêşgotinên Kurdî berhev dikim' wê demê wan kesan nedixwestin biaxivin. Her çiqas min sond dixwar û digot 'ezê navê we nenivîsim' dîsa jî nedixwestin biaxivin. Min lênûska ku biwêj û pêşgotinên Kurdî nivîsîbû her veşart. Çimkî wê demê li Tirkiyeyê nivîsandina Kurdî qedexe bû. Heta nav lêkirina Kurdî jî qedexe bû. Dîsa di saziyên fermî de axaftina Kurdî jî qedexe bû. Ji ber vê dema ku jenderme dihatin gund min diçû bi awayê lez lênûska xwe vedişart. Bi salan ji bo ku pirtûka xwe çap bikim derfetên madî geriyam lê min alîkariyek bi dest nexist. Her weha niha di vê rewşa ohalê de wextek dirêj li hêviya destûrê mam. Bi derfetên xwe yên kêm min pirtûka xwe çap kir."

Akkuş dibêje, "Hûn dikarin bibînin ku Kurd li ser mijarên jin, mêr, ajal, xweza, evîn, sex, şer, aştî, hezkirin, êş, cîhan, zarok, egîdî, xiyanet, huner, hunermend, komedî, lîstik, ol, bawerî welhasil çi fikirîne û çi gotine."

"Xebatên min ên li ser ziman wê her berdewam bikin"

Berhevkar Akkuş heta niha bi Tirkî pirtûka helbestan a bi navê ' Güzel Gözlüm' nivîsiye. Di sala 2017an de 6 hezar 650 biwêj û pêşgotin bi navê 'Gotin û Bîwêjên Kurdan' wek pirtûk çap kir. Akkuş wiha behsa derxistina planên pirtûkên din û xebatên xwe dike, " Min li qadê gotinên stran, çîrok, meselokan berhev kirin. Niha gotinên stran û çîrokên Kurdî ji bo çapê amade ne. Her wiha, pirtûka meselok û romanê jî ji bo ku çap bikim niha berdestê min in û amade dikim. Çawa ku min derfetên madî bi dest xist ezê wan jî çap bikim. Xebatên min ên li ser ziman û edebiyata Kurdî dê heta dawiya emrê min berdewam bibe."

"Hewl didim ku pirtûk bo zimanên biyanî bê wergerandin"

Akkuş di derbarê eleqeya bo pirtûkê jî dibêje, " Bi rastî pirtûka min a ku ji biwêj û pêşgotinên Kurdan pêk tê wê balê bikişîne. Daxwaza bo pirtûkê heye lêbelê me hêj bi awayekî tomerî pirtûk nefirotiye. Min ji ataşeyên çandî yên konsolosên hin welatan re nivîsî. Hewl didim ku wergera pirtûka min ên bi zimanên din jî pêk were. Him dê çanda me di welat û zimanên din de bê naskirin û dê hebûna xwe xurt bike him jî ez ê derfet bibînim ku dê pirtûkên xwe yên din jî çap bikim." Rojnameger û berhevkarê Kurd Murat Akkuş di dawiya axaftina xwe de van daxwazan ji Kurdan dike: "Ji kerema xwe bi Kurdî bixwînin, bi Kurdî biaxivin, bi Kurdî binivîsin, bi Kurdî bifikirin, bi Kurdî xeyalan bikin û stranên bi Kurdî bibêjin ku xewnên Kurdî bibînin. Kurdî yek ji zimanê cîhanê yê herî dewlemend e. Zimanê me hebûna me ye."

Nivîskarê Kurd Elî Eşref Derwîşiyan koça dawî kir

DARA DIRBÊSÎ

Nivîskarê Kurd ê navdar Elî Eşref Derwîşiyan 27ê Cotmehê koça dawî kir. Derwîşiyan nivîskarê Kurd û berhemdêr bû. Derwîşiyan di jiyana xwe de 6 roman, 45 çîrok û herwiha çend lêkolîn, ferhenga Kurdî-Farsî û çîrokên Kurdî, bawerî û merasimên herêma Kirmanşanê, peyvnasiya şêwezara Kirmanşanî bi zimanê Farsî belav kirine.


Heyamekê di zîndanê de ma

Eşref Derwîşiyan di sala 1941an de li Kirmanşanê ji dayik bûye û mastera xwe di warê derûnnasiyê de kiriye. Heyamekê mamostetî jî kiriye. Di sala 1971an de ji kar hat dûrxistin, di navbera salên 1971an ta 1979an de ji ber sedemên siyasî di zîndanê de hat girtin. Elî Eşref Derwîşiyan berî niha bi deh salan tûşî nexweşiya fişara xwînê û qutbûna damar di mejî de bûbû.

Xwedî zêdetirî 53 berheman bû

Eşref Elî Derwîşiyan di sala 2006an de xelata Helmen Hemt wergirt. Di jiyana Derwîşiyan de 53 berhemên wî belav bûn ku hemû bi Farisî bûn. Derwîşiyan lêkolîn li ser çand û zimanê Kurdî jî dikir.

(Hêlmen Hêmt xelateke newdewletî ye û ji aliyê rêxistina çavdêriya mafê mirovan ve bi wan nivîskaran tê dayîn ku ji aliyê hikûmetan ve sansûr dikeve ser berhemên wan).



Eşref Elî Derwîşiyan di sala 2006an de xelata Helmen Hemt wergirt. Di jiyana Derwîşiyan de 53 berhemên wî belav bûn ku hemû bi Farisî bûn. Derwîşiyan lêkolîn li ser çand û zimanê Kurdî jî dikir.



CIWANMERD KULEK

Bişkok

Cara dawî çend roj berê, gava li taxeke kevn a Stenbolê di palekî re bi helkehelk hildikişiyam, min ew bihîst. Di baxçeyê bê dîwar ê mizgefteke piçûk a yek-minare û di binê wê de dikan, çayxane û çêstxane (xwaringeh) hebûn re derbas dibûm, gava lê qelipîm. Çend zilaman kursiyên xwe danîbûn ber berojkê dikana piçûk a binê mizgeftê û li wir rûniştibûn. Dema ez di ber wan re bihurîm li ber guhê min ket. Hebe, ji devê yekî ji wan derketibû. Lê dîsa jî ne bêguman bûm, gelo wan gotibû? Min di xwe re nedît yan jî newêrî serê xwe bizîvirînim û ewqas ji nêzîk ve li wan binêrim. Heye ku çaxa min berê xwe bidaya wan, min ê berî wan gotina ku ji devê yekî ji wan derketibû û bûbû mirovekî berra û qerase, bi goşt û gewde, bi dest û pê, û belkî bi du seriyan, li hember xwe bidîta. Lê belkî dara kinik a li hewşa mizgeftê ew tişt gotibû, yan jî sedra li bin siya wê darê. Heye ku ji devê kevoka ku ji minareya zirav berjêr daket û baskên wê li ber tava 'esir çilwilîn jî derketibû, yan jî ji devê stiya bejnzirav a çenteyê wê yê milan bi keşxeyî bi pişt zendika wê ya çepê ve dadileqiya û bi destê xwe yê rastê gazî texsiyeke zerik dikir. Wê rojê, hebû ku her kesî ew kelîme gotibû û hebû ku kesî negotibû lê hema bi min wiha hatibû. Xwene min gotibû? Ev gotineke bêqidoş bû: Zêdebûna nexweşiyan jî ji ber wê bû, deynên me yên ku me nikaribû bidana jî. Sebeba ku em êdî aşiq nedibûn jî, sebeba ku me çareyek ji cixarekêşiyê re nedidît jî ew bû. Ewqas şer jî, ewqas aştî û bêdengî jî ji ber wê bû. Firtoneya ku çend roj berê rabû jî, vê germa ku îro em helandin jî. Hikûmet biguheriya jî ji wê bû, neguheriya jî ji wê bû. Li fetloneka jora mizgeftê rawestiyam û min li dora xwe temaşe kir. Ên ku çayxane û pastexane dagirtibûn, ên ku ji kûçeyê dadiketin, firoşkarê bilêtên yanesîbê ê ku di ber min re çû, topa lastîk a bi kujê dikanekê ve daleqandî bû û hêdîka dihejiya, wesayîtên leza xwe kêm dikirin û di fetlonekê re dizîvirîn, pîrejineke erebokeke piçûk a danûstandinê di pey xwe re dixirikand… Kesî bi her tiştî nizanibû, lê her kesî bi tiştekî zanibû. Gotina ku min qasek berê bihîstibû hemdem ji devê gişan derket: "Amerîka pê li bişkokê kir!"

Bi zarotî min navê Amerîka li ser du maneyan ji mezinên xwe dibihîst. Jinan ew ji bo tarîfkirina dûrbûnê bi kar tanî, mêran jî ji bo hêz û mezinahiyê. Min pirr dibihîst ku dikandarekî ku wê rojê kar nekiribû yan lawikekî ji bavê xwe kutan xwaribû ji bo ku kerba xwe derxe, weku mirovek be, xeber ji vî welatî re digotin. Çiqas bi nav salan re çûm bêhtir tûşî suhbet û şiroveyan hatim ku di wan de akam û netîceya bûyerekê çi bûya çawa bûya bila bibûya, sebeb "bişkok"eke li vî welatî bû, û di her hal û mercî de ê li karê, xwedî destkeftî, ev welat bi xwe bû. Qiyametek nezeriye û fereziyeyên, dîtin û angaşt û ramanên ji erd heta ezman ji hev cuda, tiştê ku mirov dibîne, li ser hebûn û fonksiyona vê "bişkok"ê hemfikir û hemqerar in. Tiştekî ku bibe palpişt û binemaya ewqas nêrînên ciyawaz, eger hebe, ji Alepha Borges ecêbtir e. Dibe ku geşedan û rûdanên li seranserê cîhanê bi hebûna tiştekî ku tarîf û sêwirandina wê ewqas sade ye, ango "bişkok", werin şirovekirin û dibe ku ev pirr bi me xweş jî were. Çi mîtolojî, çi efsane, çi sosret û gosirmet bi vê bizava şirovekirin û xeyalkirinê di seranserê dîrokê de hatine pê, hew xwedê dizane. Di van meseleyên wiha tevlihev û giriftîdar de teoriyeke Tolstoy tê bîra min. Di dawiya romana xwe ya mezin, Şer û Aştî, de Tolstoy bi qasî pêncî rûpelî behsa girîngî, hêz û tesîra şexsiyetan dike di geşedana bûyerên tarîxî de û Napolyon û eskerekî sade ê di artêşa wî de dide ber hev. Û vê hizrê derpêş dike ku azadî, hêz û bandora eskerê piçûk î sade, binemr, ê di qedera cengekê de dibe ku ji a emirdarê wî ne kêmtir be, hetta zêdetir be. Emma, zehmet e em îro bihizirin ku qeweta me û tesîra me hemûyan, her yek takî, ji a wê bişkokê pirrtir e û her tişt bela me ye.

Lê dîsa jî nabe mirov bide mandelan (înkar bike), bişkokek heye. Û rast e, ew bişkok li Amerîkayê ye. Û di dinyayê de bişkoka herî bihêz û xeternak e. Di navbera pêlêkirina wê û şixulandina wê de maweya çar deqeyan heye. Ango, piştî ku serokê Amerîkayê pê lê kir, divê çar deqe şûn de têkeve dewrê. Ev bişkoka mezintirîn çekên dinyayê, çekên nukleerî, ye. Di hilbijartinên dawî ên serokatiyê ên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de, berendama Demokratan Hillary Clinton bi waswaseke ku bi gelek kesan re hebû di guftûgoyên dema pêşbaziya hilbijartinê de radigihand ku deh kesên pilebilind ên ku berpirsiyar bûn emrê wê bişkokê di çar deqeyan de bînin cî, bi saxlemî û diristiya berendamê Komarparêzan, Donald Trump, ne ewle bûn. Di dawiyê de D. Trump bû serokê Amerîkayê û ew bişkok maye li ser bext û qerara wî. Girjî û rageşiya li Koreya Bakur careke dî gotina ku ji devê her kesî derdiket bi gelekan da gotin, lê vê carê bi awayekî berevajî: "Ya Rebî, Amerîka pê li bişkokê neke!"

Piştî ku ew bişkok ket dewrê dê çi bibe? Dibe ku karesateke ku sînorê guman û bendewariyên her kesî derbas bike were holê. Di raboriyeke ne pirr dûr de em hatibûn wê qonaxê ya rastî, lê wê carê bi çend deqeyan rizgar bûbûn. Wê hingê çi bûbû? 26ê Îlona 1983yan li Navenda Tesbîtkirina Êrîşên Nukleerî a Sovyetan tiştekî pirr ecêb qewimî û dinya anî radeya herî nêzîkî cenga nukleerî. Nîvê şevê alarmek bi vê navendê ket: Kompîteran tiştinî ku saetê 24.000 km'yan difiriyan û bi alî Rûsyayê de dihatin kişif kiribûn. Stanislav Petrovê 44 salî, mîralayê berpirsiyarê navendê, ji fermanberên xwe xwest ku vê yekê piştrast bikin. Lê kirin nekirin kompîteran dupat dikir ku ew xetere bi wir de tê, tevî ku peykan (satelaytan) ew nedidît. Petrov wiha bawer dikir ku hebû ku makîneyan û algorîtmayên wan şaş bûbin. Biryar da ku hinekî dî jî li hêviyê bisekinin, bes di pênc deqeyan de çar alarmên dî jî hatin. Di her mûşekeke (fûzeyeke) wan de du qatê hemû bombeyên Cenga Cîhanê a Duyemîn teqemenî hebû. Eger Petrov li gor zagonê biçûya û agahî bidaya mezinên ser xwe hebû ku bi pêlêkirina bişkokekê bi sedan mûşekên wiha berev Amerîkayê bi hewa ketanan. Petrov biryar da li bendê bisekinin, ji ber ku bawer dikir ku xeletiyek di kompîteran de hebû, ji ber ku bawer nedikir ku Amerîka –eger bişanda – tenê pênc mûşekan bişandana ser wan. Piştî bendemaneke bi 'ezab û stres radaran peyitand ku ti delîlên êrîşê li ser wan nînin. Dudilî û bendemana çarîkekê Aştî bi ser Şerî xist.

Bajarê bi çil derî

Bajarê antîk; Anî

MEHMET ALİ AYDIN

Bajarê Anî di benda Kafkasya û Anatoliyayê de ye. Li ser Rêya Hevrişimê hatiye ava kirin û 3 aliyê wê bi kanyonan hatiye dorpêçkirin. Di navbera çiyayên Alagoz û Dumanli dikeve û devera herî dûr a Mezopotamyayê ye.

Berê Anî li Ermenistanê ye û pişta xwe daye gundê hejar ê Ocakçi. Bajarê di dema xwe de xwedî îhtîşameke mezin, piştî guhertina rêyên bazirganiyê, zelzeleyên mezin û bi şerên mezin ji mirovan re dev ji stargehê berdaye lê hê jî bi hemû îhtîşama xwe li hember mirinê li ber xwe dide.

Ev bajarê ku hevalê Efesa antîk bi çendîn caran jê mezintir e û B.Z di sala 5 hezarî de ji mirovan re bûye perestgeh. Bi dirêjahiya 600 salî jî li ser Rêya Hevrişmî bûye navenda bazirganiyê. 22 şaristaniyan li vî bajarî şaristaniya xwe spartine keviran. Dergeha deriyê platoya Anatoliyayê, bajarê herî dewlemend, herî bi bandor ê serdema xwe bi navê din bajarê bi 1001 mabedî niha di lîsteya mîraswerên cîhanê de ye.

Li gor lêkolînên li vî bajarî hatine kirin bajar di serdema Urartuyan de di sedsala 900 de B. Z. hatiye ava kirin. Wisa tê texmîn kirin ku navê xwe jî ji Xwedaya binê erdê ya Urartuyan Anî wergirtiye.

Di dema xwe de bi navên 'Bajarê bi çil derî' ango 'Bajarê bi 1001 dêrî' dihate pênasîn di dema me de bi navê 'Bajarê Mabedan' tê pênasekirin. Sedema vê yekê jî li bajêr Dêr, Sînagog, Katedral û Mizgeft hene.

Bajarê antîk Anî 42 km ji navenda bajarê Qersê dûr e û li hinava gundê Ocakli dikeve. Bajar li Rojhelat digihîje Arpaçayê ku milekî çemê Arasê ye. Piştî Arpaçay jî Ermenistan e... Li Bakurê Rojava jî bi çemê Bostanlar hatiye dorpêşkirin. Li Başûr û Rojavayê Başûr jî bi bircan dihat parastin ku îro çend stûnê wê hatine xwarê.

Ev bajarê ku di demekê de xwedî 100.000 şênî bû ev 300 sal e kes lê najî. Dîsa jî ew şaristaniyên ku ava kirine hê jî li ser piyan e. Ew tişta Anî derdixîne derveyî zindîweran jî ev taybetmendiya wê ye ku pêkvejiyan tim li wî bajarî hebûye. Dema mirov lê dinêre tu dibê qey mirov li pirtûkeke dîrokî ya bi wêne dinêre.

Sûrên bi Xaçên Gama

Bajar bi sûrên ku li girava Arpaçayê di sedsalên 10 – 13an de hatine ava kirin û dirêjahiya wan heta 5 km heye dihat parastin. Piraniya wan sûran niha xira bibin jî nêzîkî 100 – 150 metre ne hatine rûxandin û ji nû ve hatine restorekirin da ku geştiyar bikaribin biçin ziyaretê. Di navbera sûrên li derve û yên li hundir de nêzîkî 5- 6 metre cudahî heye. Bilindahiya sûran jî 7 – 8 metre ye. Cîrantiya bajêr ya Arpaçay ku digihîje 100 km yî weke bi sûreke xwezayî hatiye spartin. Wisa tê texmîn kirin ku bendava çem weke devera xwezayî dîtine û nexwestine xwezayê xera bikin û li wî alî sûran ava nekirine. Herwiha ev çem niha jî di navbera Tirkiye û Ermenistanê de weke sînorekî xwezayî ye.

Di sûran de çendîn motîf hene û bi taybetî jî Xaça bi Gama jî li deverên sûran û li girîzgehên sûran hatiye xemilandin. Divê em bidin zanîn ku ev Xeçên bi Gama li gor ên Hîtler di wateyeke pir cuda de ne.

Ev xaç di dîroka mirovahiyê de yek ji pîroztirîn fîgur e ku jê re dibêjin Swastika û bi giştî di çanda Hîntiyan de heye. Swastika her wiha yek ji pîrozwera Mezopotamyayê ye jî. Ji aliyê gelek şaristaniyan ve weke sembola şexsê baş û başiyê weke tilsimê hatiye bikaranîn. Swastika,(Xaça bi Gama) bi Sanskirîtî ji peyva Svastika derketiye holê ku tê wateya 'Bextê baş' an jî 'Başî'yê. Yekem car li Avrasyaya Neolîtîk hatiye dîtin, tê texmîn kirin ku tevgera rojê ya li esman temsil dike. Li şaristaniyên Rojhelatî jî Swastika sembola Buda ye. Bi giştî li ser peykerên mezin an jî biçûk ên Budayan tevan jî heye. Li gor baweriyê ev sembol aîdê Budayan e û xwedî wateyeke kûr û pîrozwer e. Di dema dirêj de weke sembola başî û bextê baş dihat zanîn. Naziyan xwest ku hêz û xwerûbûna sembolê bi doktrînên 'Irqê Saf' ve girêbidin. Fikra amblembûna vê sembolê ji bo Partiya Nazî jî ji aliyê bijîşkê diranan dr. Friedrich Krohn ve hatiye pêşniyar kirin. Krohn Swastika 45 derece vegerand û danî ser zemîna sor û xiste nav daîreyeke sor. Hîtler di kongreya partiyê de di 7ê Tebaxa 1920an de li Salzbûrgê ev sembol kir amblema partiyê. Piştî wê rojê vir de jî ev sembola ku temsîliyeta başî û paqijiyê dike di mejiyê me de bû sembola wahşet û qetlîaman.

Navenda Şaristaniyan: Anî

Bajarê ji aliyê 24 qewman ve hatiye bikaranîn ku Hûrrî, Urartu, Kimmerî, Îskîtî û hwd jî di nav wan de ne, gelek caran ji bo stratejiyên leşkerî hatiye bikaranîn. Her qewmek hatiye û ji nû ve bajêr ava kiriye. Heta sala 1604an di destên Ermeniyan de bû ku girêdayî Bîzansiyan bû. Piştî Ermeniyan bi rêzê ketiye destê Selçûkiyan, Gurciyan, Moxolan û Osmaniyan. Ev bajar heta sedsala 16. jî dewlemendiya xwe parastiye. Him bi keşfa Umit Burnu, him jî êdî girîngiya Rêya Hevrişmî ku winda bû û di sala 1575an de bi destê Osmaniyan li Qersê keleheke mezin hat avakirin û weke navend hat qebûlkirin û vir ve Anî hat terk kirin. Di dawiya sedsala 16. de jî bi zelzeleyeke mezin bajar bi piranî hat hilweşandin.

Bajarê bi 1001 dêrî

Ligel taybetmendiya xwe ya bazirganiyê bi taybetmendiya olî jî navdar e, Anî. Di destanan de weke 'Bajarê 1001 Dêrî' tê nasîn. Mazûvanê gelek Dêran e. Qedra Anî ya Menewî ji Dayîka Meryem re û Katedrala wê ya mezin re hatiye dayîn. Herwiha ji bo çar nivîskarên Mizgînê Matta, Markos, Luka û Yuhanna bi figûrên şêr, qertal, xweza û mirov li ser dîwarên Dêran hatine xêz kirin.

Ne tenê ji bo Kirîstiyanan ji bo Misilmanan jî devereke girîng e, Anî. Sermeselê, bermayiyên yekem mizgefta Kurd li vê derê tê dîtin.

Tişta herî balkêş jî ew e ku yekem perestgeha Agirgeh a Zerdûştiyan a Anatoliyayê li vî bajarî ye.

Di bin girê ku bajar li ser hatiye avakirin de şikeftên ku dîroka wan digihîje B. Z. 4.500 salî hene û ev şikeft bi mebesta xaniyan û goran hatine bikaranîn.

Çend taybetmendiyên bajarê Anî yê Antîk ev in:

Dêra Azîz Krikor Tigran Honents, Katedrala Anî, Mizgefta Ebu el Manucehr, Keleha Qîzê ya Anî, Sûrên Dubend, Dêra Halaskar, Keleha Navîn a Anî, Manastira Qîzantiyê ya Hrispimian, Mozoleya Prensên Zarok, Perestgeha Agirgeh a Zerdûştiyan.

Ji pênûsa seyyahên yekem; Anî

"...dema tu li vê devera wehşî,wêran, tenê, li vir û wira wê, li kêm xirabeyên wê digerî, dibînî ku ev axa bi bereket demekê xwedî nifûseke mezin bûye û şaristaniyeke pir pêşketî lê jiyaye û dixwaze vê yekê bîne bîra te." John Ussher.

Di destpêka sedsala 19. de piraniya Ermenistanê li herêmeke ku nayê zanîn, nehatiye nexşkirin bû. Ji bo gerê qet ne baş bûye. Ji ber ku jiyan li wan deveran tune ye, tije heydût e, herêmeke bêrê bûye. Ji ber vê yekê di rojên pêş de hejmara seyyahên Ewropayî ku çûne deverê gelekî zêde bûye.

Piraniya van geştan an di dawiya Payîza dereng de an jî di demsala zivistanê de pêk hatine. Sedema vê yekê jî ji me re Seyyah Richard Wilbraham wiha dibêje: "Ji bo rêwîtiya li deverên Kurd lê dijîn di demsala zivistanê de ji ya havînê bi ewlehîtir e. Ji ber ku di zivistanê de deşt ji bo çêrandina ajalên wan ne misaîd e, ew vedigerin gundên xwe û hînbûnên xwe yên wekî koçeriyê, talaniyê û bê nîzamiyê terk dikin."

Xirabeyên Anî di nivîsên van seyyahan de bi hûrbûnî hatine gotûbêjkirin: Sir Robert Ker Porter (Di sala 1817an de ziyaret kiriye).

William Hamilton (Di sala 1836an de ziyaret kiriye).

Kaptan Richard Wilbraham (Di sala 1837an de ziyaret kiriye).

Charles Gordon (Di sala 1857an de ziyaret kiriye).


John Ussher (Di sala 1860î de ziyaret kiriye).

Kovarên weke Journal of the Royal Geographic Society jî di seyahatên ku çûne Ermenistanê de qala Anî dikin. Di hejmara JRGS 1842an de "Notes of a Tour in Armenia" (volume XII), K. E. Abbot'ın 1837'an de qala ziyareta xwe ya Anî dike.

Sargis Dgaleantz di sala 1842an de, di pirtûka bi navê 'Rêwîtiya Ermenistana Mezin' de û L. Alişan jî di sala 1855an de, di pirtûka xwe ya bi navê 'Danasîna Ermenistana Mezin' de ku bi Ermenkî hatine nivîsandin qala xirabeyên Anî dike. Dibêjin Xirabeyên Anî cesaretê dide Ermeniyên ku li derveyî Ermenistana mezin dijîn.

Di sala 1839an de Charler Texier ê Fransî jî ziyareta Xirabeyên Anî kiriye û di sala 1842an de, di pirtûka bi navê 'Descption de l'Armenie' de ku bala Rojavayiyan dikişîne deh gravûrên mezin weşandiye. Dîsa pirtûka Marie- Felicite Brosset ku di sala 1860an de li St. Petersburgê bi navê 'Les Ruiner d'Ani' weşandiye ji wêneyên seyyahên berê sûd girtiye û gelek giravûrên Anî nexş kirine.





Bajarê Antîk ê Anî di Lîsteya Gencîneyên Cîhanê de ye

Xirabeyên Anî li cîhanê weke bajarê antîk gelek girîng tê hesibandin. Bajar di sala 2012an de ji aliyê UNESCO ve ket lîsteya Gencîneyên Derbasdar ên Cîhanê û piştî çar salên din di sala 2016an de ket Lîsteya Gencîneyên Cîhanê. Di serî de wek mala malbata Ermenî Gamsaragan hatibe bikaranîn jî piştî wê ji aliyê Hurriyan, Urartuyan, Kimmeriyan, Îskîtan, Karsakan û hwd. hatiye bikaranîn. Ev cihê taybet ji gelek şaristaniyan re bûye war û wargeh.

Bajêr bi sûrên ku li girava Arpaçayê di sedsalên 10 – 13an de hatine ava kirin û dirêjahiya wan heta 5 km heye dihat parastin. Beşek ji xirabeyan hatibe rûxandin jî niha 8 Dêr, Mizgeftek û gelek berhem li ser piyan e.

Herêm ji berê ta serdema me gelek zelzele derbas kirine û gihîştiye roja me. Gelek şûnwarên bajêr ev bobelat derbas nekirine û hatine rûxandin. Di dema de di ocaqên keviran ên Ermenistanê de jî dema dînamît tên teqandin vî bajarê dîrokî tehdît dikin.

Xirabeyên Anî di sala 2016an de ketiye Lîsteya Gencîneyên Cîhanê.

Agirgeha yekem a Anatoliyayê

Avahiya herî kevin a Anî ye. Kîtabeya wê tune ye lê wisa tê texmîn kirin ku di sedsala 4. de hatiye avakirin. Di navbera Dêra Arak'elots û Dêra Gurciyan de dimîne. Avahiya ku baniyê wê xira bûye, bi şêweya silindir, li ser çar stûnên ku weke şemayê ye hatiye danîn. Di vekolandina Nikoli Marr a di sala 1909an de hatiye dîtin. Piştî vê vekolînê Ateşgedeh(1) hatiye îhmalkirin û di nexşe û pênaseyên Anî de cih nedane wê. Wisa tê texmîn kirin ku Agirgeh Perestgeha Zerdûştiyan e ku di sala B.Z a yekem û Çaremîn de hatiye avakirin.

1.Ateşgedeh: Avahî ji bo ew kesên ku baweriya wan bi Zerdûşt heye ji bo agir vêxistinê ya Agirperestan e. Di Tassawûfê de di wateya ku ji bo eşqa heq tim î daîm pêketiye tê bikaranîn. Agirperestgeh, beriya Îslamê li Îranê ku agirê pîroz tê de pêketî bûye. Taybetmendî an jî zarûriyeta wê ya devereke girtî tune ye, her wiha dibe ku li devereke vekirî, an jî li ser bîreke neftê be jî. Taybetmendiya agirgehan ku hatine avakirin ew e, bi çar piyaye, di serê wê de kubbe heye. Ev agirgeh di serdema Îslamiyetê de tesîr li çêkirin û bikaranîna kubbeyan jî kiriye û heta roja me jî.



Berê Anî li Ermenistanê ye û pişta xwe daye gundê hejar ê Ocakçi. Bajarê di dema xwe de xwedî îhtîşameke mezin, piştî guhertina rêyên bazirganiyê, zelzeleyên mezin û bi şerên mezin ji mirovan re dev ji stargehê berdaye lê hê jî bi hemû îhtîşama xwe li hember mirinê li ber xwe dide.

Li gor lêkolînên li vî bajarî hatine kirin bajar di serdema Urartuyan de di sedsala 900 de B. Z. hatiye ava kirin. Wisa tê texmîn kirin ku navê xwe jî ji Xwedaya binê erdê ya Urartuyan Anî wergirtiye.